
# SIWARÊN ÊŞÊ

*Fawaz Husên*



# SIWARÊN ÊŞÊ

**NOVEL**

*Fawaz Husên*

**WEŞANÊN WELAT**

**1994**

Weşan: 11
**SIWARÊN ÊŞÊ**
Çapa yekem

©Fawaz Husên
Pergala berg û rûpelan: WW
Wêneya berga pêşîn: Edvard Munch
Çap: Li derveyî welêt
ISBN: 91-97 21 97 - 0-3

# SIWARÊN ÊŞÊ

*Fawaz Husên*

***

**Fawaz Husên** di 1953an de li Kurdo, nêzîkî Amûdê çêbûye. Ji sala 1978an heta 1992an li Parîsê maye. Li xwendegeha Sorbonnê xwendina xwe ya bilind kiriye û di sala 1988an de li ser ziman û ferhenga fransî doktora xwe girtiye. Û ji sala 1993an û vir de li Swêdê dimîne. *Siwarên Êşê* pirtûka wî ya pêşîn e.

## NAVEROK

SIWARÊN ÊŞÊ.......................................................................7
BAŞOKE.........................................................................................25
QESRA XEWNAN.............................................................35
ROJEK WEK ROJÊN DIN...................................................48
DERIYÊ VEKIRÎ...............................................................60
HAVÎNA SEYDO...............................................................74
TEVGEREKE BÊRÛMET...................................................85
ÇEND WÊNE JI JIYANEKE PÎS.........................................93
SERÊ KU HERDEM JI BÎR DIKIR....................................104

# SIWARÊN ÊŞÊ

Avahiya îstegehê ji Behzad û hevalê wî Seydo ve bi sî çil gavî dûr bû lê mijê hema xwe lê dipêçand û ew dûrtir dixist. Behzad û hevalê xwe ji devê metroya herî nêzîkî îstegeha Gare de Lyonê derketin û divatin, ta bigihaştana ber devê dergeha mezin, meydana di wê navberê de derbas bikirana. Ew ê li tirêneke bi taybetî, tirêneke ne wek hemû tirênan siwar bibûna. Wan ê di danê wê rojê de qonaxên dûrbûnê li paş xwe bihiştana, demên sergûnê ji bîr bikirana. Bi çend gotinên sade, Behzad ê piştî salên xerîbiyê, jiyana sehitiyê biçûya malê, vegerya gundê xwe di navbera Qamişlo û Amûdê de.

Dema wî û Seydo meydana fireh birrîn û nêzîktir bûn, perdeya mijê hinekî tenik bû. Behzad serê xwe bilind kir li îstegehê nêrî wek ku wî ji wê û ji hemû bajêr dixwest xatir

bixwesta. Çavên wî li ser qelşên dîwaran, li ser rêzên pencereyên camşikestî gerriyan. Wî li hawîrdora xwe mêze kir û nêrînên wî bi avahiyê helkişiyan, li ser birca saetê rawestiyan. Di her çar rûyên bircê de saetek mezin hebû û mîlên wan dixuyan ji demek dirêj ve ji dana wextê westiyabûn. Behzad li Seydo nêrî wek ku wî dixwest bersiva wan ecêban li ser eniya wî bi tîpine stûr hatibûna nivîsîn. Ji herdu rêwiyan tu gotin derneketin û wan berê xwe dan dergeha mezin, buhurîn hundirê îstegehê. Reyên hesinî, li aliyê din, bêguman di nava mija destê sibehê û derên dûr de winda dibûn.

Kevirên reş û spî ên çarniçik li ser rûyê erdê ji paqijiyê dibiriqîn. Ronahiya xurt ji lempeyên banê nizim dihat xwarê û di eywana fireh de belav dibû. Behzad jî, Xwedê giravî, kar û barên xwe ji bo vegerê kiribû, lê eger Seydo bi zorê di bin çente û kîsên naylonî de diliviya, ew, bixwe, tenê bi çenteyekî biçûk vedigeriya malê. Solên herdu rêwiyan li ser keviran kirin qurpequrp û di bêdengiya destê sibehê de belav bûn.

Hundirê îstegehê pir fireh bû. Li ser dîwarên pehn, sûretine mezin pesnê gelek tiştan didan. Li ser çendinan ji wan xwarinê berêçêkirî hebûn û xort û keçên bikêf, xweşik ew dixwarin û kêf û xweşikbûna wan pirtir û mezintir dibûn. Hin sûretên din pesnê bêhnên fransî ên giranbuha, ava piştî rîkurkirinê, merhemên dijî-qermîçokan, dijî-pîrbûyînê didan. Keçine ciwan, tazî, xwe li ser textên razanê dirêj dikirin, bi rêwiyan re dibişirîn, bang wan dikirin, germiya hembêz û maçan berdidan canê wan, bi bîra wan dianîn.

Behzad di ber sûretan re buhurî, ew sûretên ku bigiştî ji ber çavên wî winda bibûna. Hevalê wî li dîwaran nedinerî û di îstegeha Gare de Lyonê de, bi tersî Behzad, bikêf dixuya.

Erê, kêfa wî li wî bû çûn ku piştî salên xerîbiyê, dûrbûyînê, ew ê li tirêna xwe siwar bibûya, ji êşê tev biba. Di şûna wan sûretan de, wî sûretên ê û bavê xwe, xuşk û birayên xwe, dost û hogirên xwe di serê xwe de çêdikirin. Wî perçeyên jibîrbûyî bi evîniyek mezin didane hev. Wî gelek tişt di wan salên dirêj de ji bîr kiribûn, lê hevdîtina nêzîk wêneya şadiyê di danê wê rojê de di serê wî de dikir mîna desmalek hebirmêşî û li ba dikir.

Behzad nikarîbû awirên xwe ji wan posterên dîwarî bibirrandana. Sûretan didan dû wî, payên wî li ser kevirên çarniçik giran dikirin. Wan bi dawa wî digirtin, xwe li ber çavên wî mîna fîlîmekî sînemayê radixistin, pehn dikirin. Jinên nazik, narîn û dilrevîn di guhên wî de tiştine xweş digotin û peymanên şadiyan di serê wî de diristin. Hayê hevalê wî ji tiştekî nebû dema Behzad destê xwe li milê wî da û got:

- Seydo, here ciyê me peyda bike. Hêna bêtirî sê çarîkan li ber me maye. Ez ê çend tiştan ji bo vê reya dirêj bikirim û ez ê xwe bigihînim te.

Seydo negot ne erê ne na û tenê di nav diranên xwe de keniya. Ew bîst sî gavên din li ser ınalikên şitrencê, lîstika qederê, meşiya û ji ber çavan ket.

Behzad bi tenha serê xwe di wê eywana vala de ma, ji xwe re got ku bi rastî nêzîkî saetekê hêna li ber wî mabû. Keçeke xwînşîrîn li ber dergeha li bajêr dinêrî bala wî kişandibû û wî xwest lê vegeriya. Wî yek nekir didu û bi lez di nav ronahiya xurt re berê xwe da wê.

Keça ciwan li ser qûma giravekê xwe ramidandibû. Roka havînek xweş, şaxên darek xurma û ava deryayek geh kesk geh şîn di bin asmanekî sayî de gihaştibûn hev, ketibûn go-

venda xweşikbûn û şadiyê. Bêguman keça bedew nû ji deryayê derketibû û dilopên avê bi hezaran li ser laşê spehî mîna mîrwaran dibiriqandin. Wê bi nazikî, bi dilovanî şûşa Coca Cola nêzîkî lêvên xwe dikir û dixwest di wê buhuştê de hemû xweşiyên jiyanê bikirana du sê qurt. Ronahiyek germ, xweş, zêrînî, bi tersî ronahiya spî û xurt ya zikê îstegehê, xwe li wê dipêçand, di ser laşê lîsî şayik re dişemitî. Ew li ser simtên paşiyê û li ser serê memikan dîn dibû, ji kêfxweşiyê hema dilerziya.

Li ber wê periyê Behzad rawestiya û hema lê temaşa kir. Wî hêna tiştek ji bo reya dirêj nekirîbû û li ber rûyê biken, laşê lihevhatî, wî xwe di nava deriya daxwaziyan de kir, canê xwe avêt nav pêlên bextewariyê. Hayê wî ji wextê nemabû dema ji aliyê dergeha mezin, dengên payine hatin. Ew di ciyê xwe de veciniqî, liviya û kir wek ku ew ji xwe re li hundirê îstegehê digeriya, li sûretan, li hemû sûretan temaşa dikir. Di wê gavê de çar mirovên bi cilên reş buhurîn hundirê eywanê û berê xwe bi lez dan ciyê tirênan. Wan tabûtek gelekî dirêj avêtibûn ser milên xwe. Berrek kesk bi ser darbendê dakirî bû û li ser wê, bi tîpên erebî, çend ayetên Quranê hebûn. Behzad ayet ji hev dernexist, lê wî zanîbû ew ayeta "La îlaha îllal Allah, Muhemmed resûlul Allah" bû. Ew her çar mirov di ber wî re buhrîn û li ser kevirên reş û spî berê xwe dan reyên hesinî. Eywana îstegeha Gare de Lyonê, di wê navberê de ji Behzad re mîna xewnekê xuya kir. Ew bû reya ku ji bajarê Amûdê ber bi herdu goristanan diçû. Wî destê xwe ber bi rûyê xwe ve kir û destpê kir "Fatîhe" xwend. Ayetên pêşî xweş hatin bîra wî, lê tevî wî Quran xitim kiribû, bi salan çûbû ber melê, wî kir û nekir ew sûretê hanê wê rojê bigiştî nehat bîra

wî. Wî mejiyê xwe guvaşt, zor li xwe kir, lê dua wî ji bo yê mirî di devê wî de nîvco ma û wî herdu destên xwe di ser rûyê xwe re birin.

Eywana bi sûretên dîwarî, bi îlanên mezin bixwe ya bilêtfiroşan bû. Nêzîkî bîst sî koşikên camkirî milên xwe dabûn hev lê kesek li pişt camên wan nedixuya. Di nav wan dîwarên pehn de, ne dengê bargir û rojnamefiroşan dihat, ne pêjna rêwiyan xuya dikir. Behzad ji xwe nepirsî çima hundirê îstegehê wilo bêdeng bû, lê bixwesta nexwesta, wî dizanîbû ku ew derbasî nava jiyanek bi taybetî bûbû. Erê jiyanek bi taybetî ji ber ku vegera wî jî bixwe bûyereke bi serê xwe bû, tiştekî pir mezin bû. Wî ji xwe re got ku bêguman ji ber vê yekê tişt tevlihev dibûn, diketin qalikê xewnên şevan û îstegeh dibû wargeha ecêban.

Piştî wan kesan û tabûta ser milên wan, Behzad nema dikarîbû li wî laşê li ser xîza nerm ramidandî bineriya. Wî jî berê xwe da tirênan û reyên hesinî. Li derve, mijê, wek dema ew ji metroyê derket, xwe li îstegehê pêçandibû. Mij stûr bû û tirên di nav de nedixuyan. Lê belê Behzad îstegeha Gare de Lyonê nas dikir, dizanîbû ku li ser sînga wê herdem tirên li kêleka hev diketin rêzê mîna lawirên girêdayî hema dikirin pufepuf. Tirên li wê derê bûn û wê sibehê Behzad ê li yekê ji wan siwar bibûya û bi reya xwe ve biçûya.

Wî çend gav ber bi reyên hesinî ve avêtin lê piştî mijê sermak xurt pêrgî wî hat. Wî bişkokên paltoyê xwe girtin, dest pê kir di zikê avahiyê de li textereşên hatûçûya tirênan gerriya.

Textereşê ji bo çûyînê di zikê siryaqê de bû lê tu agahî li ser nexuyabûn. Mija xwe bi ser hemû bajêr de wek cawekî

dakiribû di nava îstegehê de xwe li her tiştî dipêçand. Behzad çavên xwe girtin û guhdarî kir. Dengek mîna dengê zîpika li ser banên dikanên ji teneke li ber guhên wî peyda bû. Tîpên navan herdem bi dengekî bilind li ser textereşê hatûçûyê di bin banê îstegehê de didan dû hev. Hin bi hin welatan dan dû hev, navên wan ketin şûna hev. Navê bajaran di serê Behzad de xuya bûn: Wan û gola xweşik, Diyarbekir, keleha wê, şoreşên wê ên tevnedibûn, Qamişlo û bazara genim, Amûd, çemê miçiqî, herdu goristanên hema firehtir, mezintir dibûn. Reya di navbera Qamişlo û Amûdê de, giuên bi kevirên goran, xaçerêka ber bi gund ve diçû jî, di nava mija danê sibehê de, di nava serma Parîsê de xuya bûn.

Gerek bû Behzad numeroya tirênê peyda bikira. Wî li saeta bazinê destê xwe mêze kir, ji xwe re got ku hêna wext li ber wî pir bû. Baweriya wî bi Seydo dihat, dizanîbû ku wî ciyekî baş li kêleka camê peyda kiribû. Rê pir dirêj bû û ciyekî baş li ber pencerê giring bû. Tirênê ê di nava welatan de, mîna marekî hesinî, xwe xwaro maro bikira, bikira fîşîn, dûrî axa serma û tenhayiyê bibûya, ew ê derbasî nava bîranînên xweş û nexweş, nava qiriktaliyê jî bibûya.

Û hat bîra Behzad ku wî hêna tiştek nekirîbû. Wî ê çi bikirîya, çi nekirîya? Dilê wî diçû her tiştî, diçû bêhnên fransî ên giranbuha, xwarinên xweş, kincên bedew, şerab û sûlava mîna xwînê, mîna ramûsanên lêvên qirmizî. Lê wî dizanîbû ku wî nikarîbû barê xwe giuan bikira û bi ser de jî pir pere bi wî re nebûn. Wî çixareyek pêxist û bi hilma pêşî re hat bîra wî ku wî dixwest çend kiroz pakêt bikirîna. Wî pir ji çixarên amerîkayî ên qûnpembo hez dikir û gerek bû wî hesabê malê û mêvanan jî bikira. Erê, piştî wan salên pir li warê dûrbûnê

hevalên kevn ê bihatana, pirsa gelek tiştan bikirana. Wan ê bêhna Ewropa rengîn ji wî bikirana, bi çayê re çixare bikişandana. Wilo jî wî dest pê kir çavên xwe gerandin. Di her îstegehê de li bajarê Parîsê koşikên pakêtfiroşan û meyxane hebûn û wî ji xwe re got ku ew ê di wê îstegehê de jî hebûna. Ew ket nava gelek dalan û dehlîzan. Wî nizanîbû ku îstegeh wiqasî fireh bû. Ew dûrî ciyê tirênan ket, lê car dî netirsiya ji hevalê xwe an ji tirêna vegerê bimaya. Wî li saeta xwe nenerî û bawer kir ku herdem wext li ber wî pir bû. Bêhntengiyê ji destpêkê, ji dema ku wî rahiştibû çentê xwe û ji oda xwe derket, dabû tengala wî. Dema wî dukana pakêtan peyda nekir, bêhntegiyê reya xwe dît û xwe avêt nava wî. Behzad nikarî bû deh deqan xwe bê tûtin ragirta. Wî ji xwe re got ku bêguman du sê pakêt di binê çentê wî de mabûn lê du sê pakêtan têra çi dikirin? Wî xwe nas dikir û dizanîbû ku di wê reya dirêj de, wê bêtir çixare bikişandana. Dema wî bernameyine tevlihev dida ber rûyê xwe, wî çixare li ser çixarê dikişand û çûyîna welêt, vegera bigiştî, tiştekî pir tevlihev bû, di pirtûka jiyana wî de rûpeleke nû bi hevok û risteyên zehmet bû. Ew di nava îstegehê de geriya, ji derekê çû dereke din, ji dalanekê ket dalaneke din, hat hêviya xwe bibirriya, dema ji nişkê ve, di derek hinekî tarî de, ew rastî mekîna xwekar ya pakêtan hat.

Behzad, wek hemû çixarekêşan, ew mekîne xweş nas dikirin. Di serê kuçeyan de, li kêlekên sînemeyan, di tarên bajêr de, wan mekînan piştî girtina dikanan baş kar dikirin. Gelek caran piştî nîvê şevê Behzad xwe li wan digirt û pakêta xwe ji wan derdixist. Di wê îstgehê de kêfa Behzad helbet pir hat û cizdanê xwe vekir, hemû perên hûr amede kirin. Wî xwest bi kêmanî panzdeh bîst pakêt bikirîna. Wî deh firingên fransî ên

zer radan qelşa mekînê, hinekî xwe ragirt. Paşê, wî tûtina xwe helbijart, destikê hesinî ber bi xwe ve kişand û pakêt rada devê çentê xwe. Wî deh firingên din amede kirin lê piştî derketina pakêtê, ew deh firingên wî ketin ber wî. Wî nas kir ku mekîne xerabe bû û wê yekê kêfa wî anî. Wî rahişt deh firingên xwe, careke din ew radan nava mekînê, pakêtek din derxist. Cara duyem nêzîkî deh duwanzdeh deh firingên zer û pênc firingên spî li ber nigên wî kom bûn. Behzad bi tirsek diyar li hawîrdora xwe nihêrî. Îstegeh herdem vikîvala bû.

Piramiya caran Behzad bawer dikir ku ew bextreş û bêoxir bû. Wî wek gelek Kurdan digot ku eger ew tî biçûya ser deriyayê, deriya ê bimiçiqiya. Roja wî bixwe bi awayekî tevlihev dest pê kiribû. Lê kê bîra wê mekîna han û wan perên pir dibir? Behzad erê ji jiyana xwe li Fransayê ne xweş bû, lê qîma xwe pê dianî. Ew bi wê jiyanê razî bû ji ber ku tu jiyanine din, xweştir, birûmetir, li ber rûyê wî diyar nedibûn. Lê dema mekîna pakêtan bû ya siûd û bexteweriyê û dest pê kir ew dewlemend kir, wî ji xwe re got ku ew di kolanên Parîsê de ne wiqasî bêçare û bê şans bû. Wî bajarî erê xwîna wî dimişt, hemû karên pîs û zehmet didan ber wî, deriyên jiyanek hêsan di rûyê wî de digirtin lê belê wê rojê, wî nedixwest ku ew destvala mîna parsekekî vegeriya malê, mîna leşkerê artêşek şikestî bizîviriya welatê birînê. Wî serbajarî ji wî re xwe nîşan da mîna mirovekî xwedî nan û xwê. Di wê îstegeha vala de, wî pere hema bi ser wî de barandin, mala wî ji nû ve ava kir, jiyanek nû li ber nigên wî mîna berrek xweşik raxist.

Behzad nema li pakêtan geriya. Wî perên pir berdan bêrîkên xwe, xistin paxîlên xwe. Wî çenteyê xwe vala kir, tiştên tê de derxistin û bi çengan deh firingên zer û pênc firingên spî

berdan hundirê wî. Dema çente tije bû, mekîne jî ji ber xwe ve rawestiya. Behzad rahişt çente, dîsa bi tirs li dora xwe nerî û zû ji wê derê dûr ket. Ew bi kêf bû lê nediwêrîbû kêf û bexteweriya xwe diyar bikira. Ew tirsiya ku pêrgî rêwiyekî zimandirêj, an karkerekî îstegehê bibûya û ew pere ji wî bihatana standin û bi ser de jî, ew bihata girtin, dawî emir di girtîxanan de biriziya.

Hundirê îstegehê bêpîvan mezin bû û Behzad reya xwe şaşo maşo kir. Dalanan xwe li hev dipêçandin, ji hev derdiketin, ji hev dizan û serî li mirovan gêj dikirin. Behzad nexwestibû di destpêkê de barê xwe giran bikira lê li ser selên çarqorzî ên îstegehê, erê tenê çenteyek bi wî re bû, lê ew çente anuha pir sengîn bû û Behzad bi zehmetî di bin giraniya wî de diliviya. Wî gelek caran çente danî, bi destmala xwe xwêdana xwe zuha kir, bêhna xwe berda.

Ew di nava îstegeha herdem bêdeng de digeriya, lê wî reya xwe peyda nedikir. Di hundirê îstegehê de wî wextê xwe bi gelek tiştan belav kir. Di nav dalanên pir de, li ser reya vegerê, wî xwe gelekî winda kir. Wilo jî dema ew dawî bi ser eywana fireh ve bû û buhurî ciyên tirênan, şev ketibû. Şev ketibû û mijê ji ser rûyê îstegehê bar kiribû û cî ji perdeya tariyê re vala kiribû.

Li derveyî eywanê bayekî sar li rûyê wî xist wek ku wî bayî xwest ew ji bend û pencên xewnek ne xweş hişyar bikira. Tirên xuya bû ji mêj ve ji ser sînga îstegehê rabûbûn, xwe gihandibûn derên dûr û hêna bêguman dûrtir diçûn. Piştî çûyîna tirênan reyên hesinî di bin lempeyên îstegehê de mîna şûrên tazî di laşê şevê de radibûn û xwînek reş, tîr, bi ser bajarê bêdeng de dirijandin. Tirêna ku bê wî berê xwe dabû şar û gun-

dên welêt anuha ji wî dûr bû, pir dûr bû.

Tenê di nava şeva îstegehê de Behzad li kêleka reyên hesinî geriya, nizanîbû çi bikira çi nekira. Mal hat bîra wî û wilo jî di wê navê de bavê wî li ber çavên wî di nava germa havînek pir bi tîn de xuya bû. Tiştan li ber çavên Behzad mîna fîlîmekî sînemayê an mîna lîstikek şanoyê dan dû hev. Bavê wî peya ji gund dabû ser rê û gihaştibû îstegeha bajarê Qamişloyê, hatibû pêşiya wî. Li ser sînga îstegeha biçûk, ew tevî kalbûna xwe diçû û dihat, çavên xwe ji ber ronahiya roka xurt hema diqurmiçandin. Germê û toza spî xwe li bajar û li îstegeha biçûk wek ewrekî mezin pêçandibûn. Karkerê îstegehê, baweşînek di dest de ji oda xwe derdiket û bi lez berê xwe dida mirovê kal. Wî destê xwe datanî ser milê kalo û bi dengekî bilind di guhên giran de digot:

- Apo tu bi derewan li vir î. Tu tirênên din îro nema tên. Vegere malê, rok mejiyê mirovan dileqîne.

Bavê Behzad li rûyê karmendê îstegehê dinêrî û dipirsî:

- Te got îro tu tirênên din nema tên ?

- Apo min sed carî ji te re gotiyê ku di rojê de tenê tirênek tê û tirênek dire!

Bavê kal serê xwe dihejand, bi dengekekî nizim di ber xwe de digot:

- Behzadê min heye tuneye dîsa ji tirêna xwe maye. Kar û barên Behzadê min pir in.

Paşê bi dengekî hinekî bilintir wî berdomand:

- Lê ew ê vegere. Tê bi çavên serê xwe bibînî, ew ê di tirênek din de bê.

Yê karmend dilê mirovê kal tu carî nedihişt û digot:

- Rast e Apo, rast e! Helbet ew ê vegere. Ma ew ê li wan

derên dûr çi bike? Ma morîkên diya wî li wan deran qetiyane ta ew li wan welatan bimîne?

Bavo di nav qermîçokên salan de dikeniya. Kenê wî herdem bi vê gotina karker dihat. Paşê çavên wî ji kêfa dibiriqîn. Wî bi destê karmendê îsteteghê digirt û diguvaşt:

- Bi Xwedê lawê min tu rast dibêjî. Ma ew ê li wan welatan çi bike?

Paşê wî xwe di nava bîranîn û fikran de xwe ji bîr dikir û wek ku bi tenha xwe bûya digot:

- Behzadê min wê di tirêna sibehê de bê. Ez ê bêm pêşiya wî.

Behzad da dû bavê xwe, xwest xwe bavêta destê wî û bigota "Bibuhure, bavo, bibuhure!" lê ji ber giranbûna çente zû bi zû xwe nêzîk nekir û bavo ji ber çavên wî ket û di nav germa spî de winda bû.

Li ser rûyê îstegeha vala Behzad çû û hat, destikê çentê xwe di nav tiliyên xwe de guvaşt. Wî ji xwe re got ku dikarîbû tev wan peran vegeriya oda xwe, li hêviya tirêna roja din bimaya. Bilêta wî şewitî bû lê wî bi wan perên pir dikarî hezar bilêtên din bikirîya, ew yek ji binî ve ji wî re ne derdekî mezin bû. Wî karê xwe û vegerê kir dema ji nişkê ve tirênek li ber çavên wî xuya bû. Ew bi gavine sist ber bi wê ve çû û tirêna dûrî sînga îstegehê ji nav tariya şevê derket. Ew pir kevn bû, lê dîsa jî tirên bû û dikarîbû biçûya her deverê, belkî jî ta bajarê Qamişlokê diçû. Piştî Qamişloyê, rê hêsan dibû û eger bi peyatî bûya, an bi trumbêlekê bûya, wî ê xwe bigihanda malê.

Behzad li kêleka tirênê rawestiya û li dora xwe nêrî. Mirovek ji aliyê serê wê dihat û Behzad destê xwe rada paxîla xwe, li paseport û bilêta xwe geriya. Bi wê yekê terpîmî ji nava wî

hat û nas kir ku wî ew paseport û ew bilêt tev çend tiştên din li kêleka mekîna pakêtan ji bîr kiribû. Wî xwest xwe bida alî, xwe veşarta, lê nedibû, mirov çav li wî ketibû. Sedema tirsa wî bixwe ew çentê mişt pere bû û giring bû wî gumanên napak ji xwe dûr bixistana. Ji ber vê yekê jî, wî berê xwe da wî mirovî, çû pêrgî wî. Wî nizanîbû gelo ew rêwiyek wek wî bû an karkerek ji karkerên îstegehê bû, lê belkî jî şufêrê tirênê bixwe bû. Helbet wî xwest ku ew mirov kî bûya bila bibûya lê ne polîsek an berpirsiyarek wan mekînên pakêtan bûya. Wî ê çend pirs li ser tevgera wê tirênê jê bikira û erê an na, ew ê bi reya xwe ve biçûya. Mirov berî deh duwanzdeh gavan rawestiya û bi dengekî bilind pirsî:

- Ha xorto, xuya ye tu jî ji tirêna xwe mayî?

Behzad hîs kir ku wî mirovî bi wê pirsê hinekî qerf û tinazên xwe bi wî dikirin û wilo jî ew di ciyê xwe de sar ma. Pirs bi wî ne xweş hat, lê wî divat bersiva wê bida:

-Erê bi Xwedê ez ji tirêna xwe mam. Min û hevalekî me karê xwe ji bo vegerê kiribû, lê mixabin, min xwe di îstegehê de şaş kir.

- Rast e, yê din vegerand, di dalanên vê îstegehê de gelek xwe şaş dikin û ji tirênên xwe dimînin.

Van gotinan hiştin ku Behzad bawer bikira ku wî mirovî xweş ew der nas dikir. Wilo jî wî destê xwe ber bi tirênê ve kir û pirsî:

- Ma ez dikarim li vê tirênê siwar bim û biçim ta bajarê Qamişlokê?

Wî mirovî destê xwe ber bi tirênê ve kir:

-Tu li ser vê tirêna han dipeyivî?

Di îstegehê de bixwe ji bilî wê tirênê tu tirênên din nebûn.

Tu ronahî ji hundirê wê nedihat der û hemû derî û pencereyên wê girtî bûn. Serê wê jî nedixuya, di nava şevê û dûrbûnê de winda dibû. Behzad bawer kir ku wî mirovî ew ji bîr kiribû û pirsa xwe bi awayekî din dubare kir:

- Ma gelo ev tirên ber bi Rojhilata Navîn ve nare?

Wî ji xwe re got ku eger tirên rast neçûya Qamişlokê, wî dikarîbû bi kêmanî bi saya wê hinekî xwe nêzîk bikira. Mirovê li îstegehê awirên xwe ji tirêna reş birrîn, bi dirêjayî li Behzad nêrî û di bêdengiya deverê de pirseke din kir:

- Tu ji min re nabêjî, xorto, çi di çentê te de ye û çima bêrîkên te wilo dagirtî ne?

Tişt bi vê pirsê tev li hev bûn û Behzad xwe yek carî winda kir. Ew mirovê hanê ne ji bo xêra wî di pêşiya wî re derketibû û bi wê pirsê ew bû mîna xewneke pîs, mîna kabûsekî û xwe li ser sînga wî dirêj kir. Behzad xwest xwe ji ber wê pirsê û ji ber wî mirovî bida alî, dûr biketa. Wî xwest erd biqelişiya û wê ew daqurtanda, lê wî bêtir xwest ber bi jor ve biçûya, bibûya başoke, helo, şahî, baz û bikira qîjîn û ber bi perrê asmanan biçûya. Wî xwe mîna firendeyekî dît û di şûna destên wî de du bask jê re şîn hatin. Wî baskên xwe di nav bayê giran de li hev xistin, xwest ber bi asmanekî şîn, asmanekî sayî, asmanekî bê tirs bifiriya. Wî destên xwe bi hiner û bêhntengî li hev xistin, lê gewdê giran ji ser ferşên îstegehê ranebû. Çentê mişt pere her baskê rastê pûç kiribû û baskê çepê bê çare bilind dibû û dadiket. Baskên Behzad di wê rewşa dijwar de bi kêrî tu tiştî nehatin. Nigên wî jî li ser kevirên îstegehê pûç bûn, hêviya tu tiştî ji wan nehat kirin. Behzad dizanîbû çawa xwe di bajarê fireh û tevlihev de veşarta, lê tirsê xwe li canê wî mîna perdeyeke ji qeşê pêçandibû, resasa hilandî berdabû

ranên wî, wê reya revê birrî bû. Wilo jî wî nema di ber xwe de da, di ciyê xwe de li bendî biryara celadê xwe ma.

Lê ew mirov ne celad bû û kuştina tu kesî nedixwest. Wî tenê bi bûyîna xwe li wê derê dihişt ku Behzad di çavên xwe de biçûk biba. Wî helbet dizanîbû ku rêwiyê ji tirêna xwe mabû ketibû nav lepên wî, ji ber wî nikarîbû bireviya, lê dema Behzad deng nekir, bersiv neda, wî ew deh duwanzdeh gavên di wê nevberê de rakirin, destê xwe dirêjî çente kir.

Behzad serê xwe xistibû ber xwe û li solên xwe dinêrî. Wî nizanîbû yê din bi rastî çi ji Xwedayê wî dixwest, çima îşê xwe ji kar û barên wî dianî. Wî di nava xwe de got ku ne ji bo xêra wî bû wê rojê wê mekînê ew perên hanê li ber wî raxistin, xewna jiyanek din li ber çavên wî xweş kirin. Qederê ji mêj ve henekê xwe bi wî dikir, ji rewşeke pîs ew dixist yek pîstir. Li ser selên reş û spî ên mîna textê şetrencê, qederê bi wî dilîst, xwe kiribû dijminê wî, fîl û kelehên wî, siwar û peyayên wî li dû hev dixwarin û mala wî wêran dikir. Wê ji qazî ve kêfa wî bi wan peran anî ta paşê bêtir ew pîs bikira.

Ronahiya li ser serê Behzad qels bû û wî mirovî rahişt çente, çend gavan dûr ket û di bin lempeyekê de rawestiya. Wî çokên xwe dan erdê, çente danî ber xwe, vekir û bi dirêjayî li hundirê wî temaşa kir. Wî awirên xwe du sê caran di navbera çente û rûyê zerbûyî yê Behzad de birin û anîn. Wî nema zanîbû ne dilê xwe bi Behzad ve bişewitanda, ne bi wî bikeniya. Dema Behzad dît ku deng ji wî mirovî dernediket, wî bi tirs serê xwe bilind kir û mîna girtiyê li ber dadgeheke ji dînan hatibûya danîn, wî xwest zû biryar di derheqa wî de bihata birrîn ta ji wê rewşa pir dijwar xelas biba. Mirov di ber xwe de serê xwe hejand. Paşê rabû ser xwe, rahişt çente, danî ser

milê xwe, devê wî ber bi jêr ve kir. Terpînî ji nava Behzad hat û kir bikira qîrîn, ber bi wî mirovî biçûya, destê xwe bavêta çente, lê ew ji ciyê xwe neliviya. Ji nava çente qûmek hûr rijiya, mîna avê hat xwarê, li ber nigên wî kom bû. Wî mirovî çavên xwe ji rûyê Behzad dernexist û got:

- Kî bîra qûmê dibê? Te ev çente tije qûm kiribû, barê xwe bi derewa giran kiribû.

Behzad bawer nekir lê tiştê ji çentê wî dirijiya ne baranek ji deh firingên zer û pênc firingên spî bû. Ew xîzek nerm bû û wê xîzê li ber bayê ku li îstegehê dilîst mîna marekî xwe xwar dikir û li ser kevirên çarniçik belav dibû. Behzad li hêviyê bû ku perên hesinî li ser kevirên îstegehê bikirana çerqeçerq, lê dengê ku gihaşt guhên wî wek dengê bayê havînê di nav genimên zerbûyî de bû. Ta dilê wî biketa cî û ji çavên xwe bawer bikira, wî destê xwe bi dizî rada bêrîka çakêtê xwe. Tiliyên wî di nava xîzek hênik de çikiyan. Wê gavê wî bêtirs bêrîkên xwe vala kirin û qûma hûr ji wan jî rijiya. Bi derketina qûmê ji çente û ji bêrîkan tirsê xwe ji nava wî kişand. Wî li tirênê careke din nêrî û di serê xwe de xatir jê xwest. Wî çend gav ber bi dalanên îstegehê kolanên bajêr avêtin, dema dengê wî mirovî dîsa ew girêda:

- Mal avayo, ma te li vî welatî ji bilî qûmê tiştekî din nedît?

Paşê, hat bîra wî ku wî bersiva pirsên Behzad nedabû. Wî destê xwe dirêjî paxila xwe kir, defterek mezin derxist û ew jî da ber ronahiya zer ya lempa qels. Wek ku ew li navekî, li navê Behzad bixwe bigeriya, wî bi bêhnek fireh tiliya xwe di ser çend rûpelan re bir. Wî serê xwe paşê bi neyî hejand:

- Na, xorto, îro tu nikarî li vê tirênê siwar bibî.

Paşê wî xwest xweş dilê xwe bixista cî û careke din nêrînên

xwe di ser rûpelên defterê re birin, ew pelên han yek bi yek qulipandin. Wî bê ku serê xwe ji rûpelan derxista got:

- Na Behzad, îro tu nikarî li tirênê siwar bibî. Lê rojekê ji rojan, mîna her kesî, tu ê bêyî paseport û beyî bilêt lê siwar bibî. Ev jî heqê her kesî ye.

Di avahiyên bajarê Parîsê de lempe pêketibûn, di nava perda şevê de diçirisandin. Nehat bîra Behzad ji wî mirovî bipirsiya çawa wî navê wî dizanîbû û wî xwest hema zû ji wê derê dûr biketa. Wî rahişt çentê xwe yê vala û ew du sê gavan ji tirênê dûr ket dema dengê yê din xweş gihaşt guhên wî:

- Biner Behzad ne ez naxwazim ku tu li vê tirênê îro siwar bî. Ciyên vala hêna pir in, lê ev yek ne di destê min de ye. Ev tirên bixwe tirêna mirinê ye û li gor navên di deftera mezin de roja mirina te hêna nehatiye.

Behzad pir westiya bû lê wan gotinan reya revê, bazdanê, vê carê li ber wî vekirin. Wî berê xwe bi lez da dergeha mezin dema dengê yê din bêdengiya îstegehê dirrand, da dû wî.

- Rojekê ji rojan, mîna her kesî tu ê jî li vê tirênê siwar bibî.

Behzad xwe dîsa li ser kevirên reş û spî ên eywana fireh, eywana koşikên girtî û sûretên dîwarî, dît. Wî serê xwe xist ber xwe û berê xwe da kolanên Parîsê. Dengê zingilekî gihaşt guhê wî. Wî ji xwe re got ku tirêna reş dest pê kiribû ji ser zikê îstegehê radibû, li ser reya hesinî xwe bi vî alî, bi wî alî dikir, berê xwe dida dunya nebedîbûyînê, tuxûbên nevegerê.

Dengê zingil dirêj kir û li ser wî dengê ne xweş Behzad ji nav textê razanê rabû ser xwe. Wî destê xwe dirêjî saeta ber serê xwe kir, dengê zingilê ji bo ji xew hişyarkirinê birrî. Wî careke din xwe di nav ciyan de dirêj kir. Saet şeşê destê sibe-

hê bû û ew ê biçûya ser karê xwe. Ew di oda xwe de di nav xwêdanek demûşî de bû û bêhna wî xweş dernediket. Wî li garajekê li dervî Parîsê bixwe herdem bi şevan kar dikir, lê wê hefteyê, wî ê bi roj kar bikira. Serê wî wek meşkeke pufdayî bû û dihat ji êşan belav biba. Ew ber bi pencerê ve çû û tevî ku li derve sar bû wî ew vekir û li asmanê reşî tarî nêrî. Bayê sar mîna pisîkekê li pişt pencerê bû, qeramûşkên xwe li camê didan, dixwest ji ber hovîtiya derve bibuhiriya hundir. Wî bayî bi vekirina pencerê laşê Behzad hejand, berda xewê, da dû terîşên xewna ne xweş.

Ode li Parîsa şanzdehan nêzîkî metroya Rue de la Pompe bû. Ji pencereya wê banên bajarê fireh û tevlihev bi lûleyên argûn û dûkêşan, bi antênên televîziyonê di rojên sayî de dixuyan. Şevê hêna mîna lawirekî di rengê ariyê de xwe li ser sînga bajêr dirêj kiribû. Wê rojê, çavên Behzad di pencerê re tenê pêrgî tariyê û asmanê girtî hatin.

Li derve, li çayxana li serê kuçê Behzad li ser darên nigan qehwa xwe vexwar û berê xwe bi lez da îstegeha metroyê. Du saet rê li ber wî hebûn ta xwe bigihanda karê xwe. Di hundirê îstegehê de pir kes nebûn. Li ser dîwaran sûretên mezin pesnê jiyanek hêsan, jiyanek xweş didan. Di destê wê sibeha zû de, di wê sermayê de, keç û xortên lihevhatî û bejinzirav dikeniyan, siya jiyaneke tije kêf û xweşî didan ber rûyê karkerên li hêviya tirênê.

Metroya şîn hat. Wê rahişt Behzad û xwe berda nava tunelan, di binê erdê de mîna marekî stûr xwe li hev pêçand. Di zikê bajêr de, çerxên hesinî kirin guregirr. Behzad li dengê bilind, li çerqeçerqa hesinan guhdarî dikir, lê dengê mirovê ku li îstegehê pêrgî wî hatibû ji ber guhên wî nediçû. Wî den-

gî hema digot: " Rojekê ji rojan, tu ê jî mîna her kesî li vê tirênê siwar bibî".

# BAŞOKE

Saet nêzîkî duduyê piştî nîvro bû û germê te gêj kiribû, te ji hal xistibû. Di oda te de tenê pencereyek hebû. Te ew vekiribû lê surra bayê hênik di wê rojê de ji bo dermanan jî peyda nedibû. Car caran hinek bayê nîv germ nîv sar dixwest bibuhirya hundir, lê wî reya xwe di ciyê pir teng de nedidît, û li ber devê pencereyê radiwestiya. Piraniya mirovên bajêr di wê rojê de bêguman di bin sêwanên rengareng de li kêleka deryayê xwe ramidandibûn. Hin ji wan bi balafiran an jî bi gemiyên mezin dûrtir çûbûn, xwe gihandibûn peravên giravên fransî ên li başûr. Her kesî ji ber wexmê, ji ber bîna benzîna trumbêl û navgînan xwe dabû alî.

Li Parîsê, Siyamend, di oda xwe de, tu girtiyê bajarê tevlihev û zindamiyê xwe û jiyanê bûyî. Te karekî pîsik peyda kiri-

bû û hemû roj û şevên te wek hev derbas dibûn. Te bi şevê kar dikir bi rojê radizayî û vê yekê rê nedida te ku tu bibûyayî wek însanan, wek her kesî bijiyayî. Wilo jî dema tu ji malê derdiketî û diçûyî ser karê xwe, her kes ji kar vedigeriya. Di destê sibehê de te berê xwe dida oda xwe û di metroyê de, di otobûsên bajêr de te didît ku hîna şûna xewê li ser rû û dêmên şûştî, kurkirî, derman kirî xuya bû.

Gelek caran, dema te kar nedikir, tu derengî şevê ji malê derdiketî. Xew di şevan de bi çavên te nedibû. Tu lê kerr û gêj dibûyî, li kêleka ava çemê Seinê lê digeryayî. Reng û ronahiyên bajêr mîna lawirên tî berê xwe didan çem, xwe di nav ava ku diherikî de dikirin, dilerziyan. Li kêleka avê te xwe winda dikir, dûr diçûyî û carinan jî tu dibûyî başoke.

Erê, tu dibûyî başoke, helo, şahî, û tu bi baskên xwe dûrî jiyana Parîsê, dûrî serdemên tenhayiyê, dûrî derd û kulên sirgûnê diçûyî. Piştî ku tu digihaştî ber perê asmanê bilind, te xwe berdida jêr, tu mîna birûskê diketî. Axa welêt, çemê bajarê te bi lez dihatin pêşiya te, xwe dikirin xelatek û xwe bi giştî didane te. Te xwe pir nêzîkî ava çemê bajêr dikir û mîna rûyê destekî te serê perîkên xwe di ser rûyê çem re bi evînî dibir, te ew mist dida, tevzînokên şahiyê berdida hinava wî. Çemê bajarê te li hemberî çemê Seinê şiravek, cihokek av bû, lê te pir jê hez dikir, şev û rojan te bêriya wî dikir. Av ji dilê çiyayên bilind derdiket û tevî sîmoran, tevî pirbûna birînan, ew di nava gund û bajaran re bi giranî ber bi deryayên dûr diçû. Erê, li Parîsê, li kêleka Seinê, tu dibûyî başoke, te bi bask û perîkên xwe bayê dûrbûnê, demên êşê diqelaşt. Ava Seinê bi destê te digirt, pencereyên xewn û daxwaziyan li ber te vedikir, te dispart bajarê te, demên berî kuştin û şewatan, berî

Koça Mezin.

Wê roja havînê tu di oda xwe de bûyî. Pencere vekirî bû, dilê te teng bû, ji kul û derdan mişt û dagirtî bû. Tu li mal bûyî dema bû çireçira telefona li ser masa ber te. Te nizanîbû di wê germa ku bi ser rûyê bajarê Parîse de dibariya gelo tu di xew de an şiyar bûyî û te zû bi zû ranehişt telefonê:

- Siyamend? Tu yî?

Dengekî bi zimanê zikmakî pirsî. Dengekî bi tirs lê dengekî xweş, wek ava ji çavkaniyê bipijiqe, hênik. Bi wî dengî re bayekî hebirmêşî derbasî hundirê oda te bû. Te vegerand:

- Erê bira ez im. Ma tu kî yî?"

Û dema hevalê te yê biçûkaniyê navê xwe hilda, dilê te ji kêfa hat ji sînga te derketa. Ew bû mîna firendeyekî ku bi salan girtiyê qefesê mabûya û ji nişkê ve asmanekî şîn, asmanekî bê aso li ber baskên wî vebûya. Dema Cengî ji te re got ku ew li Parîsê, li îstegeha Gare du Nordê li hêviya te bû, te ji kêfa bawer nekir. Te germa havînê, kesên ku çûbûn ber lêvên derî û giravan ji bîr kir. Di wê oda teng de wek dînan li te hat. Tu rabûyî ser xwe û bi dengekî bilind, te ji hevalê xwe re got:

- Cengî, ji ciyê xwe melive! Ez ê wek gullê bêm.

Û bi rastî, mîna gulla ji lûla tufengê derkeve, tu jî wilo ji malê derketî, bi pelikan ve hatî xwarê. Te berê xwe da tirêna binê erdê, îstegeha La Muettê, metroya herî nêzîk. Te bawer kir ku tu pir li hêviya tirênê mayî û te xwe negirt. Te xwest bibî başoke, heloyê bilindiyê, firendeyê asmanên bêsînor. Te xwest baskên xwe li hev xistana, perda tenhayiyê, demên poşmaniyê bi navperûşkên xwe bidirranda, tîştîşî bikira.

Li Parîsê, jiyana te tu bêjî nebêjî jiyanek tevlihev bû. Şev û rojên te ên windabûnê, perîşaniyê, sehitiyê bûn. Te xwe mîna

qurmê dareke mirî didît, neynikek şikestî, qirşikekî, dûmana çixarekê li ber bayekî dîn û har. Hêna salek nebuhirîbû di ser gihaştina te re ku hemû xewnên te berbat bûbûn. Di wan salan de pir tişt li dora te hatin guhertin. Jiyana te Siyamend bi rastî jî mîna goristanekê bû û bayê malwêraniyê hema lê dikir guveguv. Qesrên xewnan û koşikên hêviyan xwe li ber rewşa kambax negirtin. Di nava te de, xweliyê şûna avahiyên daxwaziyan girt û mirinê perdeya xwe li ser sînga te raxist, konê şîniyê vegirt.

Di nav deh salên dawîn de, te tu deng ji hevalê xwe nebihîstibû. Te nizanîbû çi bi serê wî hatibû. Gelek caran te ji xwe dipirsî: " Ma ew sax e, mirî ye? Eger sax e, gelo ew jî mîna min winda ye? " Cariman jî te digot bêguman ew li bajarekî, di kampekê ji kampên penaberan de bû. Metroya diçû Mairie de Montreuilê hat û rê û rêwanî têde tunebû. Tu, siwarê êşê, tu siwar bûyî û te bi hezaran ji wan pirsên ku serê te ji ber wan dilıat belav bibûya, te ji xwe kirin. Kesên li dora te hêdî hêdî ji ber çavên te ketin.

Gelek caran te xwe di metroyê de ji bîr dikir û li îstegehine dûr tu bi ser hişê xwe ve dihatî. Tu vediciniqî dema dengê şufêrê tirênê di megrefonê de bi hişkî bang dikir : "Îstegeha dawî, îstegeha dawî. Her kes divê peya bibe ". Ji ber vê yekê wê rojê tu li ser darên nigan şipya mayî. Te îstegehên berî Gare du Nordê dihejmartin. Hin bi hin, tu nêzîkî hevalê xwe dibûyî, hin bi hin nêzîkî jiyanek dim dibûyî.

Helbet ne bi dilê te bû ku bi metroyê, bi tenha serê xwe, tu diçûyî pêrgî Cengî. Te bi kêmanî dixwest bi trumbêlekê, bi jin û zarokên xwe re biçûyayî. Lê leyse! Daxwazî tiştek bûn û dijwariya jiyanê tiştekî din bû. Li Parîsa bi nav û deng, di nav

deh milyon kesî de, ne te guh li kesî dikir, ne kesî guh li te dikir. Tu rêwiyekî li ser reya poşmaniyê bûyî, tu herdem siwarê êşê bûyî. Wê roja tu çûyî pergî hevalê xwe, tu ne bi tenha xwe bûyî, di gurregurra metroyê de, di tarîkiya tunêlan de karwana derd û êşan dabû pêşiya te, dû te, ketibû xwîna te, dev ji te bernedida.

Dema hûn li welêt bûn gelek caran tu û Cengî, hûn ji bajarê biçûk derdiketin, çem û çem dimeşiyan, nêzîkî avê rûdiniştin. Hûn kêmbîr bûn û hayê wê hingê ji dem û dewranên çerxa felekê tunebû. Hûn li jiyanek hêsan, bê serêş digeriyan. Mîna hemû xortên nûgihaştî bala we pir diçû ser keçan, ser bihuşta xweşiyan. Jinine destspî, lêvhunguvînî, porhebirmêşî, ber bi we dihatin, bi zimanine ewropayî di guhên we de dikirin pistepist, tevzînokên sar û germ berdidan canê we. We ji xwe re xweş dikir û digot: " Eger em xwe bigihînin Ewropayê, li wê derê keçên pir xweşik ê li ser me dîn bibin ". We bawer dikir ku keçên porzer xwe ji bo xortên wek we porreş û xwîngerm xwe dikirin erd, xwe li ser wan didan kuştin. Lê Siyamend, baweriyên we pir dûrî rastiyê bûn. Berî her tiştî, keçên li ser porreşan dîn dibûn li ser her deh tiliyên destan dihatin hejmartin. Paşê, ji binî ve we bîra xortên ewropayî nedibir, we nizanîbû ku ew hebûn, ku wan dikarîbûn wek we û belkî ji we çêtir, kêfa jinan ji xwe re bianîna. Ew bi kêmanî ne mecbûr bûn dev ji welatê xwe berdin, ji bo parastina canê xwe an ji bo jiyaneke çêtir bidin ser reyên dûr. Wan serdemên tirs û birçîtiyê li paş xwe ji mêj ve hiştibûn û dikarîbûn çavên jinan dagirin, têrbikin, daxwaziyên wan ên biçûk û mezin piraniya caran bi gewde bikin.

Lê pir gazin ji te û ji xortên wek te nedihatin kirin, çûnki

hûn hêna zaro bûn û bi ser de jî kesekî rastiya tiştan nedida ber çavên we. Bi kurtî, te rastiya tiştan nas kir piştî ku tu ketî nav wan, piştî ku te serma şehrên sergûnê û demên tenhayiyê nas kirin. Jiyana te, li Ewropayê bi çend gotinên kurt û sade mîna kirasekî pînekirî bû hema tazîtiya te dida ber çavan.

Tu di hundirê metroyê de diramiyayî. Serê te ji barê salan giran bû. Te dizanîbû ku hevalê te mîna te tenê bû, wek çêlîkekî çûkan bû, ji hêlîna xwe ketibû. Wî xwe li te girtibû, bêguman hêvî dikir hinekî derdên xwe ji bîr bikirana, bi te re ji nû ve vegeriya rojên zaroktiyê, demên berî Koça Mezin.

Li Parîsê herdem hişê te dûr diçû, hema xwe di nava bîranînan de vediziland. Rojên xweş, bi rastî xweş, di jiyana te de pir hindik bûn, lê dîsa tu vedigeriyayî, diçûyî nava bûyerên berî Koçê. Tu ber bi îstegeha Gare du Nordê ve diçûyî û rojek bi çend rojan berî Koça Mezin hat bîra te.

Wê rojê, te û Cengî we berê xwe da çiyayên bilind, reya hesinî, tixûb. Gotinên we wek axê pir bûn, dilê we ji tiştên negotî mişt bûn, lê wê rojê, hûn bêdeng man. Baran ketibû û bêhna axa têrav û gihayê şil xurt bû, bêvila we dax dida, digihaşt mejiyê we. Ava çem jî bêdeng bû. We bajarê biçûk li paş xwe hişt û hûn pir nêzîkî çiyayên bilind bûn. Hûn li ser xweşiyên jiyanê neaxiftin, we tenê dixwest çawa eanê xwe ji mirinek ku roj bi roj nêzîk dibû biparêzin. Tirsa ewrên xerdelê, gaza mirinê di nava we gişa de cî girtibû. Gerek bû we xwe bidaya alî çûnki deriyê jiyanê di wî navçeyî de di rûyê we de hatibû girtin. Du sê milyonan, bi xemgîniyeke mezin, xwe ji bo Koça Mezin amede dikirin. Nêrînên we di ser hesinê tirênê re wek başokan firiyan û wan, ango nêrînên we û başokan, sînor û stiriyên têlên hesinî û birînên di canê welêt de ji bîr

kirin. Leşkerên bi tufengên amerîkanî û soviyetî ji ber çavên we ketin. Erê, wê rojê jî tu bûyî başoke, şahî, helo û te baskên xwe di bin asmanê wê roja buharê de li hev xistin, tu di ser serên wan çiyayên berz re firiyayî. Te sînga xwe ber bi bayê hênik kir û ji nişkê ve te xwe berda xwarê. Tu pir nêzîkî sînor bûyî, tixûb hilkişiya û ber bi te ve hat. Serbazekî ji aliyekî ji aliyan berê lûla tufenga otomatîk ber bi te ve kir. Neh deh gulleyan perdeya aramiyê di gelek deran de dirrandin. We xwe bi ser zik de avêt, başoke kir qîjîn, ji ber çavan ket, di nava tirêjên rojê de winda bû. Hûn ketin newalekê û çem û çem hûn ji çiyan û ji warê daxwaziyan dûr ketin. Piştî wê rojê bi çend rojan, destvala, birçî û xwas we bi du sê milyonan re berê xwe dan sînorên dunyayê, wê bi destine westiyayî hema li deriyên Ewropayê xistin û xistin.

Dema metro rawestiya tu bi pelikan çûyî jorê û bêhna te hinekî hat ber te. Metroya Parîsê mîna maran, mîna şahdamarên xwînê di laşê bajêr de xwe li hev dipêçand, belav dibû. Bêhna te herdem teng dibû dema tu dadiketî zikê bajarê tevlihev. Her carê, te ji xwe re digot: " Ma ez ê çawa rûyê dunyayê carek din bi çavên serê xwe bibînim? " Li ser rûyê dunyayê, di nav tarên pir de jiyana te ne çêtir bû ji wê jiyana di hundirê metroyê de, lê di tariya tunelan de tu herdem ditirsiyayî. Ev tiştê hanê helbet bi biserhatiyên te û bi sirgûnê ve girêdayî bû. Li welêt, dema te xwe berdida hinava şikeftan, te xwe li ser axa hênik vediziland, an xwe dida hev. Di şevreşa şikeftan de tirsê xwe ji nava te dikişand. Te çokên xwe car caran dixistin zikê xwe û dibûyî mîna cenîn, tu vedigeriyayî zikmakê. Li welatê dûr, di tenhaiyê de, zikê Parîsê tirsa mirinê berdida canê te. Metroya Parîsê te ditirsand, li ber çavên te

dibû labîrenta windabûyînê, warê dînbûyînê.

Li îstegeha Gare du Nordê tirên bi rêzê rawestiyabûn, laşên xwe ên hesinî dabûn ber germa rojê. Tirênin dihatin û tirênin diçûn. Bayê hundirê îstegehê giran bû, bîna mirovan diçikand. Pêxwas û bêwaran, meyxur û heşîşkêşan, teryaqfiroşan, hemûyan ciyê xwe di wê de çê kiribûn, bi şev û bi roj lê bûn. Tu li hevalê xwe geriyayî û dilê te di sînga te de lêdida, dihat ji kêfê û ji xemgîniyê belav biba. Te berdida hêsiran, lêva xwe gez dikir. Lê dema tu çav li Cengî ketî, du hêsirên mîna du nokên stewyayî ji çavên te pijiqîn, li ser rûyê te gindirîn û hatine xwarê. Cengî çenteyekî biçûk xistibû nav nigên xwe û hema li hawîrdora xwe dinêrî, li te digeriya.

Wê rojê, Cengî bû mîna xencerekê û destine dijmin ew di laşê te de gerrandin, hiştin ku birîn fireh bibûya, ji laş jî mezintir bibûya. Li Swêdê, destekî Cengî ketibû ber diranên mekîna kar û hatibû birrîn. Mekîneyê destê jêkirî pêşî rada zikê xwe yê hesinî, hûrhûrî kir û paşê ew avêt nava gemarê. Mekîna ku nan dida Cengî ew mecbûr kiribû ji bo silavê destê çepê direjî destê mirovan bikira. Te Cengî hembêz kir, li ser sînga xwe guvaşt. Hêsiran çavên te şewitandin û hatine der. Li îstegeha fireh we nema fedî kir û we kir kûrekûr. We ji bîr kir ku mirovên gihaştî tu carî li pêşiya nas û nenasan nagirîn, lê hevdîtinê hûn kirin du zarokên deh-duwanzdeh salî, bi destên we girt, we vegerand demên biçûkaniyê.

Û hat bîra te dema tu û Cengî di newalên çem de hûn li kêleka avê li kevirên pehn û sivik digeriyan. We bi bêhna fireh ew heldibijartin. Paşê, bi zanebûn, we ew di ser rûyê ava golan re davêtin. Kevirên ku ji destên we derdiketin dibûn hechecîkên dûvmeqesî û bi firê nikilên xwe li avê dixistin û

bilind dibûn. Pênc, heyşt, deh caran kevir bilind dibûn, berî ku giraniya wan ew ber bi jêr ve bikişandana. Bi dîlana wan keviran re, dilê we jî bi serê govendê digirt û bayê welêt kenê we, bexteweriya we li ser kendalên çem digerand. Ev yek hate ber çavên te ji ber ku Cengî bi hemû lîstikan pir dizanîbû û bi taybetî bi avêtina keviran di ser rûyê ava çem û golan re.

Li îstegeha Parîsî, Cengî çakêtê xwe avêtibû ser milê xwe yê rastê, nedixwest te li milê bê dest bineriya. Lê te çavên xwe ji şûna birînê dernexistin. Cengî di ber dilê te de da û got ku ew hîn bûbû bi destê çepê, bi destê mayî her tişt bikira. Ta te jê bawer bikira, wî destê xwe avêt ser milê te, te ber bi sînga xwe ve kişand, car din rûyê te maç kir. Lê baweriya te bi gotinên vala nehatin û mîna zarokan te jê pirsî:

- Ma tê karibî hîna keviran di ser rûyê ava çem re bavêjî?

Cengî li bendî pirseke wilo nebû û wî bi xemgînî li te nêrî, serê xwe hejand. Ew têgihişt ku tu vegeriyabûyî kêleka çem, rojên zaroktiyê. Paşê ew hinekî keniya û wî car din milê te guvaşt:

- Malavayo Siyamend! Em nema zarok in. Ma di temenê me de, mirov keviran di ser ava çem û golan re davêjin?

Wê rojê, di wê îstegehê de, te dizanîbû ku hevalê te birîndar bû û kula dilê wî dijwar bû. Te dizanîbû ku hundirê wî mîna hundirê te ji camê bû û ew cam hatibû şikestin, hûrhûrî bûbû.

Hûn wê rojê di îstegeha Gare du Nordê li bajarê Parîsê pir nepeyivîn. Te rahişt çentê Cengî û hûn daketin nava metroyê. Tirên hat û hûn ketin zikê wê. Mîna bi hezaran kesên din hûn hatin daqurtandin.

Siyamend, tu bêtirî pêncî metrî di binê erdê de bûyî.

Çiyayên bilind hatin bîra te. Di asmanekî pir şin de, başokan, heloyan, şahiyan baskên xwe li hev xistin û kirin qîjîn.

# QESRA XEWNAN

Ferzendê Meşkînî nikarîbû bigota çawa wî xwe li wê derê dît, bi taybetî li kêleka qesrê, li ser wê qûma nerm ya ku di bin lingên wî de diçû xwarê û derbasî hundirê solên wî dibû. Wî dizanîbû ku ew dûrî tixûbên nebedîbûnê ketibû. Wî xwe gihandibû Ewropa Rojava, warê jînê, paytextê evînê. Wî nizanîbû gelo li Italyayê bû, li Fransayê, an jî li welatekî ji Ewropa Jorîn bû; lê ev tişt bê qîmet bû û wî meşa xwe berdomand. Roka ku diçû ava xwe bi ser deryayek pir mezin de berdida. Dem, di bin wî asmanê nizim de bêguman payîz bû û rokek bê tîn di dawiya wê rojê de xwe bi ser milê asoyê pehn de xwar dikir, dixwest piştî wextek ne pir dirêj xwe di nav ava deryayê de winda bikira.

Ferzend ber bi qesra dilbir diçû û hema ji xwe re xweş di-

kir, digot ku hevalê wî Paul li wê derê bû, bêguman li ber dergehek ji dergehên qesrê li hêviya wî bû. Bi riya xwe ya zer û dirêj, bi berçavokên xwe ên girover û bi bejna xwe ya dirêj î zirav, Paul mîna leylanê, çend kêlîkan li ber çavên wî geh xuya bû, geh winda bû.

Di bin asımanê giran de çend firendeyên deryayî hatin li ser serê Ferzend kirin qîjeqîj û paşê dûr ketin. Li ser xîza hûr Ferzend ji bilî şopa solên xwe tu şopên din nedîtin. Guhikên şeytên di bin lingên wî de wek berfê dikirin kirtekirt û diçûn xwarê. Bi xemgîniyeke diyar Ferzend li şopa xwe mêze kir û wek ku hezar kesî di guhên wî de ji wî re bigotana, wî dizanîbû ku pêlên ji dûr ve dihatin di demek kurt de ê ew ji ber çavan bixistana, ew dera han rast û şayik bikirana.

Wî û Paul ji mêj ve hevdu nas dikirin, ew li Kurdistanê pêrgî hev hatibûn. Paul hatibû Cizîra Botan û dixwest ji bo xwendina xwe li xwendegehê pirtûkek binivîsanda, lêkolînek li ser destana Memê Alan çêbikira. Wek ku wî biçûkaniya xwe li perçeyekî ji perçeyên Kurdistanê derbas kiribûya, wî wilo biserhatiya Memê belengaz û Zîna diltenik xweş nas dikir. Bi saya Ferzend, wî gelek stran û çîrok ji devê dengbêj û çîrokbêjan dane hev. Paul xwe wek parêzgerê miletên bindest dida nîşan û di baweriya wî de hemû dîroka Kurdan di evîna Mem û Zînê de bi gewde û eşkerê bû. Zikreşiya Bekoyê Ewan û kêmhişiya mîrê mezin mîna jehrê bûn û di canê gelê kurd de digeriyan. Ji ber finasên neyarên mîna Beko û nezanebûna berpirsiyarên mîna birayê mezin, qiriktalî, perîşanî, malwêranî dibûn para mêr û jina kurd, dibûn nanê rojane, jana gel.

Ferzend westiyabû ji ber ku ew ji dûr ve, ji gundekî ji gun-

dên Cizîra Botan hatibû, lê belê kêfa wî li cî bû. Wî dilê xwe bi biserhatiyek nû xweş dikir. Di demeke pir kin de ew ê derbasî nava qesrê, hundirê avahiya xewnên şîrîn û dilrevîn bibûya. Piştî çend kêlîkan wî ê xwe berdaya hinava xweşiyên bêser û bêbinî. Hemû daxwaziyên wî ê bi cî bibûna û hemû serêşên wî ê bibûna bûyereke kevn...

Li welêt û nemaze di şevên havînan de, di wan şevên ku tev nedibûn, xewê ji dêvila ku bihata bar dikir, xwe di nava navçeyê de winda dikir, wê reya xwe şaş dikir. Ferzend xwe li ser banê xênî di bin asmanê mişt stêrikên stûr û biçûk de radimidand, serê xwe datanî ser herdu destên xwe, riya karwanê peyda dikir û xwe di nava hejmara stêrikên bêhejmar de winda dikir. Ji ber germê û kelmêşên baxçeyên pembû, mirovan li derve, di bin asmanê sayî de di bin hîzarê xewnên şîrîn de xwe dirêj dikirin. Ferzend li ser banê xênî dixwest nêzîkî warê xeyalan bûya. Siwarê tenhayîyê li ser mehîna boz ya miradan siwar dibû, dûrî navçeya xwîn û şewatan diket. Mehînê bi hêsanî hefsar ji destê wî distand û mîna stêrika ku birije, wê xwe bi ser milê asmanê fireh de xwar dikir û dûr diçû. Ferzend û mehînê goristanên bêhejmar li dû xwe dihiştin, serdemên malwêraniyan ji bîr dikirin, bi hev re diçûn warê jînê, roj û şevên evînê. Ferzend kavil û demên xwînxwaran û bêlma mirinê li paş xwe dihişt. Di wan şevên dirêj de, wî qesr di serê xwe de xweştir dikir, rengareng dikir, wek bûkekê dixemiland, bi destê wê digirt, dibir bal xwe û ew li kêleka xwe, li ser ciyan dirêj dikir. Ew dibû Ferhadê evîndar, ji Şîrîna xwe re qesrek berz ji daxwaziyan saz dikir, ew dibû Mem û bi agirê nava xwe şevên hovîtiyê dikirin rojên hêviyê û govendên rindiyê. Paşê, wî xwe berdida hundirê wê û xwe di dalan û ey-

wanên pir de bi kêfxweşiya mest û aşiqan winda dikir.

Di danê wê êvarê de, Ferzend ne li ser banê xanî bû, ew dûrî Cizîrê ketibû. Ew bi lez ber bi qesrê vê diçû û roka qels jî xwe bi ser milê aso de xwar dikir. Ferzend bala xwe dayê ku qesr nêzîk nedibû, li paş perdeya mijê, te digot, diliviya û mîna gemiyeke mezin li ser deryayê xwe ji ber wî dida alî. Tişt di dawiya rojê de li ber çavên wî, wek di xewnên şevan de, geh diketin hundirê hev, geh ji nav hev derdiketin.

Wî helbet dixwest bêtir bilezanda, lê qûma hûr, mixabin, di bin lingên wî de diçû xwarê, rê nedida wî. Devê wî li kêleka ava boş, li kêleka deryayê zuha bû. Wî zimanê xwe di ser lêvên xwe re birin û ew ziman wek ku ne zimanê wî bûya jê re xuya bû. Ew ziman di korta devê wî de wek texteki zivir û pûç bû. Tama qûmê di zengeloka wî de asê bû û tevî wî xwe du sê caran kuxand tam hema wilo ma. Dunya li kêleka wê deryayê ne germ bû, lê ji ber ku wî dilezand xwêdanek mezeloqî dest pê kir ji eniya wî hat xwarê û tev tozê bû.

Wî li roka ku diçû ava û li saeta bazinê destê xwe nêrî wek ku soza wî bi Paul re hebûya û ew dereng gihaştibûya wê derê. Mîlên saetê, her sê, li ser hev siwar bûbûn û nedigeriyan. Ferzend di ber xwe de got ku bêguman sûc sûcê bayê têrxwê bû. Wî saeta xwe bi bêhntengiyek diyar bi hêrs hejand û paşê ew nêzîkî guhê xwe kir. Wî xwest tiketika mîl û çerxikên hûrik bibihîsta. Dema wî wilo guhdarî kir, çend deng gihaştin guhên wî. Ji wî werê pêşî ew dera hanê bêdeng û aram bû, lê dema wî guhdarî kir, dengê pêlên ku ji dûr ve dihatin gihaşt wî. Firendeyên spî ên li kêleka avê dijîn sînga xwe ber bi bê û roka ku diçû ava ve dikirin, hema dikirin qajeqaj. Du sê carên din wî saeta xwe hejand. Mîlên saetê neliviyan û Ferzend

li paş xwe zîvirî, pişta xwe da qesrê û ta ji wî hat wî dûr avêt. Saetê di asmanê nizim de kevanek çêkir û dûrî sî çel gavî di xîzê de çû xwarê. Ferzend lê poşman nebû û meşa xwe berdomand.

Dema Ferzend gihaşt ber avahiyê, wî dît ku ew ne weke ku Paul pesnê wê dabû û ne wek ku wî di serê xwe de, di şevên Cizîra Botan de bawer dikir, bû. Qesra bi nav û deng, qesra berz, birca belek, di dawiya wê roja payizê de, di rengê qûmê de bû. Tu kes jî li dora wê nebû. Dergevanan ji ciyê xwe bar kiribûn û qesra bedew ji bayê têrxwê û têrxîz re hiştibûn, wan ew sipartibûn reşkên bêxwedîbûnê, demên nebedîbûnê. Mîna qesrên ku zarokên bajariyan di havînan de li ser kêlekên deryan ji xwe re ji xîza nerm çêdikin û bi paniyên xwe ji hev dixin dema dilê wan ji lîstikan sar dibe, qesra Ferzend, qesra dilbir anuha wilo bû.

Dergeh hemû girtî bûn, bêguman ji demek dirêj ve û pîrê konê xwe li ser wan çêkiribû. Ferzend li ber dergeha di sînga avahiyê de rawestiya û mêze kir. Di tevnê pîrê de çend mêşên bêçare dixwestin xwe azad bikirana, xwe ji dafên mirinê derxistana. Ferzend baş li wan mêşan nêrî û bixwesta nexwesta wî xwe wek wan dît, xwe girtiyê rewşek tevlihev dît. Di wê navberê de, fikira vegerê hat serê wî. Lê ew ê vegeriya kuderê, di nav kîjan mirinê de wî ê reyek jînê li ber xwe bidîta? Wî bi zorê xwe gihandibû wê derê, bi zorê xwe ji nav qîlên mirinê xelas kiribû û ew ê çawa bizîviriya? Li ber dergehê, wî rojên çûyî anîn bîra xwe. Ji bilî mirin û kuştin û şewatê tiştekî din nehat ber çavên wî. Di nameyekê de wî ji Paul re nivîsandibû:

*"Dostê delal. Min gelek name ji te re şandin lê tu deng ji te derneket. Ez hêvîdar im te pirtûka xwe ya li ser destana Mem û*

*Zînê weşandiye. Dema em bi hev re li gund û bajaran digeriyan, rojekê te got ku li welatê te Mem û Zîn bi hêsanî bi hev şad dibin û kesên wek Beko dibin dergevanên qehpexanan, mirovan ji bo peran berdidin ser jin û namûsa xwe. Li Cizîrê, hevalê hêja, ne tenê Mem û Zîn perîşan dibin, lê her kes li ber lehiya mirinê diçe. Agir ji her alî bi ser rûyê dunya me de dibare. Di destpêka rojê de şewat, di nav rojê de şewat, di danê êvarê de şewat, di nîvê şevan de şewat, şewat, şewat.*

*Dostê hêja Paul, di hemû nameyên min de, tu dibînî ez herdem ji te dipirsim, dixwazim nas bikim çima çerxa gerdûnê, bayê felekê, ji destpêka dunyayê hema li dora serê me digere, çima mirin dide pêşiya me, paşiya me, tengala me, dev ji me bernade."*

Paul bersiva nameyan nedida û bi ser de jî, wê rojê, li welatê xwe, ew ne li gorî soza xwe derket, ne li gorî soza mêrê çê. Wî Ferzend tenê di nava gerrînekên tiştên ne diketin seriyan li ber dergeha qesrê hişt, ew bi gaziya hewarê nehat.

Di nameyekê de Ferzend nivîsandibû:

*"Welat ji me re nemaye. Eşkere ye em çêdibin tenê ji bo goristnan mişt laşê miriyan bikin. Memê Alan û Zîna xwînşêrîn dibin bermaliyên Beko, dibin êzing ji bo xurtkirina agirê çavnebariyê. Dostê delal, li Cizîra Botan, li warê işq û evînê, tenê şewat e, şewat."*

Ferzend nikarîbû li bendî hevalê xwe bimaya, nikarîbû biziviriya û destê xwe dirêj kir, tevnê pîrê xera kir. Derî bi hêsaniyek mezin vebû. Ferzend hinekî li ber rawestiya û li dora xwe nêrî. Paul ne li wan deran bû û wî ji xwe re got: "Hebe nebe, ew ê li hêviya min di hundirê qesrê de be".

Hundirê qesrê pir sar bû. Ferzend bi çekên havînên welêt

hatibû û serma xurt mîna hîzarek ji qeşê xwe li canê wî pê-çand, xwîn di damarên wî de hişk kir. Wî ji binî ve karê xwe û wê sermayê nekiribû û di wan şevên li ser banê xanî, di bin stêrikên bêhejmar de, wî bawer dikir ku nava qesrê herdem hênik bû, mîna buhiştê ne germ ne sar bû. Ew poşman bû çima ji bo wê reya dûr wî baş karê xwe nekiribû, lê wî ê çawa baş karê xwe bikira dema mirin ji her derê dipijiqî? Ga dema dikeve kêr li ser stûyê wî pir dibin û mirov dema dikeve nav lehiya mirinê ew destê xwe davêje her tiştî, ta qirşikên ser rûyê avê. Xwişka wî Şîrînê hînî çêkirina vezelên hirî bûbû û wê ji bo wî vezelekî pir hêja, germ ji bo zivistanê çêkiribû, lê di tevliheviya bûyeran de, di firtoneyê de wî bi zorê canê xwe ji mirinê xelas kiribû. Wî ê çawa bîra wî vezeleyî bibira?

Her du sê gavan wêneyek an berrek pir dilbir hebû û di nav hev re wan jiyana gelê wî welatî mîna fîlmekî sînemayê li ber çavên wî raxistin. Hemû dîroka wî gelî di bin ronahiyeke qels de li ber çavên wî wek rûpelên pirtûkek rengîn pehn bû. Ronahî ji zikê ban dihat û ji ber ku ji binî ve di qesrê de rojîn û pencere nebûn, Ferzend bawer kir ku ew ronahiya hanê ya lempeyên elektrîkî bû. Wî serê xwe bilind kir û li zikê xênî nêrî. Siryaqê avahiyê tijê derz û qelş bûn û di wan re tîşên rojê dibuhirîn hundir û di nava dalan û eywanan de belav dibûn. Qelşên mîna maran di zikê avahiyê de xwe li hev dipêçandin û li hemû dîwaran belav dibûn.

Ma Paul li kuderê bû ta bihata gaziya wî, ew ji wê rewşa dijwar derxista, deriyê hêviya rohnî di rûyê wî de vekira? Di gelek nameyên xwe de, Ferzend dikir gazî. Carekê wî nivîsandibû:

*"Dostê dostan, ezîzê ezîzan, warê Mem û Zînê herdem bi pêt*

*û bizot e. Her roj bi hezaran kesên mîna Mem, mîna Zînê dişewitin, berbat dibin. Tu dibînî dema ez dinivîsînim gotinên mîna "agir", mîna "şewat" herdem ciyekî mezin di nameyên min de digirin. Tu bixwe dizanî ku Cizîra Botan warê hêşînkahiyê ye. Di zivistanan de berf dikeve, reyên di navbera gund û bajaran de têne girtin. Lê dostê hêja, eger mirin di serê her kesî de bi sermayê girêdayî ye, di serê me de, ew jî şewat e, agir e."*

Ferzend tirs û sermaya hundirê qesrê ji bîr kir û bi hinek kêfxweşî li tabloyan, li berran, li pûtên ji kevirê mermer û ji bronzê nêrî. Wêneyên li ser dîwaran erê jiyanek rengareng li ber çavên wî radixistin lê ew ji wê jiyanê dûr dima. Wêne pir bilind bûn û di ronahiya roka ku diçû ava de, Ferzend xweş ew ji hev dernedixistin. Wî tenê ji rojên welêt dizanîbû ku ew pir xweşik bûn. Ew ji eywanekê buhurî eywanekê û di nava wê jiyanê de wî xwe hinekî kêfxweş dît.

Berrên bi ser rûyên dîwaran dakirî berrên welêt anîn bîra wî. Wan rojên zaroktiyê, xweşiya demên kurt anîn ber çavên wî. Ferzend zaro bû û carina jî xweha wî Şîrînê bi destê wî digirt û ew bixwe re dibir Navenda Tevn û Berran. Wê li wê derê bi keçên di temenê xwe de kar dikir. Di nav dîwarên Navendê de tiliyên keçên şahreze li ser rûyê berran cîhaneke rengareng li ber çavên Ferzend vedikirin. Tiliyên nerm û zirav firende bi asmanan dixistin, xwîn û hêrs di canê şêr û pilingan de digerandin. Wan tiliyan destanên kevn jî bi gewde dikirin û li ser rûyê wan berran, Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Ferhad û Şîrîn digihaştin miradên xwe. Qehremanên mîna Rustemê Zal û Kawayê hesinger dilê Ferzendê zar mişt hezkirin dikirin. Di dawiya rojê de, Şîrînê bi destê birayê xwe digirt û xweh û bira, peya vedigeriyan malê. Dema şev diket,

Ferzend di nav ciyên xwe de ji kirasê pehlewanekî diket yekî din, ew geh dibû Rustemê Zal, geh dibû Kawayê hesinger, dibû siwarê hespê bayî, hespê deryayî, ew dibû siwarê hespê daxwaziyên bêdawî. Di salên paşîn de, dema wî hezkirin nas kir, ew cariman jî dibû Mem, Siyamend an jî Ferhad.

Di hundirê qesrê de gera wî dirêj kir. Di navenda eywanekê de ew çav li tabûtek ji kevirê reş ket û di ciyê xwe de lerziya. Wê tabûtê car din mirin da ber rûyê wî, ew mirina ku ew ji ber direviya, mirina ku ji ser sînga Cizîrê ranedibû. Wê ew vegerand demên şewatan û navçeya goristanên bêser û bêbinî. Bi dîtina wê tabûtê Ferzend fikir kir ku dîwar û dîwar biçûya, bibuhuriya eywaneke din. Wek ku wî tenhayî, serma û tarîtiya ku xwe li qesrê pêçandibûn di ser guhên xwe re avêt, wî dikarîbû ew tabût jî ji bîr bikira. Lê di wê navberê de wî xwest navê xwediyê tabûtê nas bikira û wilo jî nêzîkî wê bû.

Ferşê kevir ne li ciyê xwe bû û di şûnê de tu tiştî devê tabûtê nedigirt. Di nava kefenê rizyayî de, kiloxê miriyekî û herdu kortên çavên wî xuya dikirin. Li ser qehfê serî tacek ji zêrê zer û ji mîrware û gewherên giranbuha hebû. Li ser parsûyên sîngê, şûrekî dirêj û pehn hebû. Yê mirî destikê şûrê xwe di bêdengiya qesrê de di nav hestiyên tiliyên xwe de diguvaşt.

Bi dîtina wan hestiyan sawa mirinê mîna marekî reş xwe berda hinava Ferzend, hişt ku ew navê yê mirî ji bîr bike, bi payine sist dûrî tabûtê bikeve. Nêzîkî deh panzdeh gavan, lingên wî di tiştekî de asê bûn û ew lukumî û bi ser dev de çû xwarê. Wî destê xwe di ser ser û laşê xwe re bir. Sermayê wek derziyek bencê di laşê wî de çikiya bû û her derên wî pûç kiribû. Ferzend dît ku tu derê wî nedêşiya. Ji lêvên wî avek tîr û

germ dihat. Wî nas kir ku ew xwîn bû, lê dema destê xwe nêzîkî rûyê xwe kir, da ber ronahiya tîştîşî, wî tiştek nedît. Ew rabû ser xwe û destên xwe wek koran pelikand. Wî nas kir ku tiştê ketibû nav lingên wî mexmel bû, stûr û germ bû. Wî ji xwe re got ku di wê rewşa dijwar de, di serma bê hedan de, ew tiştê xwîn ji devê wî anîbû dana asmanan bû. wî nizanîbû wî cawî li wê derê çi dikir, lê wî bawer kir ku hinan ew winda kiribûn. Wî dikarîbû ji Paul bipirsiya dema pêrgî hev bihatana.

Caw hinekî giran bû lê wî serma hundirê qesrê şikenand. Tabloyên bi ser dîwaran dakirî û berrên xweşik dîsa bang Ferzend kirin, dîsa siya jiyaneke xweş li ber ruyê wî raxistin.

Ferzend tenha xwe geriya û di eywanekê de çav li berrek pir dilbir ket. Di berrê de keçek şazdeh hivdeh salî li ber çavkaniyekê rawestiya bû, kûzê avê avêtibû ser milê xwe. Keça dih evîn devê kûzê xwe piştî ku dagirtibû ber bi jêr ve kiribû û avek mîna rûn jê dirijiya. Avê bi ser canê wê di nava herdu memikên biçûk re mîna marekî xwe li hev badida û ber bi jêr ve diçû xwarê. Ava hênik ji bejna zirav hez dikir, di nav herdu hêtên girover de dadiket. Li ber nigên ciwana lawend, marê avî dibû mîna sehekî, xwe dida hev, serê xwe dixist nav dûvê xwe û di xewek şêrîn de diçû.

Gelo Ferzend çiqasî li ber wê keçê ma? Ew bêguman demeke dirêj ma û dikarîbû jiyana xwe giş hema li ber nigên wê periyê derbas bikira. Wî ji xwe re got ku wî bi hezarên caran ew rûyê hanê dîtibû, lê temaşa kiribû, jê hez jî kiribû. Ew rûyê hanê, camkirî, perwazkirî, li ser dîwarên piraniya malên Cizîrê bû. Ew dêm û lêvên lihevhatî, nazik, girover, bixwe dêm û lêvên Zînê, dilbera Memê Alan bûn.

Rû bê şik rûyê Zînê bû. Lê belê ew laşê nîvtazî, di destana evînê de tiştekî din bû, bûyerek nû bû. Zînê li wî welatê dûr, li kêleka wê deryayê cilên kurdî, kirasê perîşaniyê ji xwe kiribû, bi awayekî nû li hêviya Memê xwe dima, bi rengekî din ji wî hez dikir û di ber dilê wî de dida. Zînê di çarçefa wê wêneyê de nema guh li dek û dolabên Bekoyê Ewan dikir û birayê wê jî dev ji mîrîtiya xwe berdida, dev ji payetîya xwe, keretiya xwe diqeriya, karekî din ji xwe re peyda dikir.

Ji nişkê ve qurpequrpa lingine bi lez li ser kevirên qesrê gihaştin guhê Ferzend û ew ji nava pêlên xweşiyê kişandin. Ferzend awirên xwe ji berra dilrevîn birrîn. Di nava ronahiyek pir qels de, Paul li ber çavên wî mîna reşkê şevê xuya bû, nêzîk bû, lê wî çend gavên mezin di wê navberê de hiştin. Wî silav nekir, negot "tu bi xêr hatî yî ". Wî destê xwe jî dirêjî destê dirêjkirî nekir û bi dengekî bilind bi ser Ferzend de qîriya:

- Ma tu dîn bûyî Ferzend? Ev çi kefen e te li xwe pêçaye?

Ferzend tênegihişt û di ciyê xwe de sar bû. Wî hêviya çi dikir û anuha Paul çawa dihate pêşiya wî, çawa bi wî re dipeyivî. Wî got:

- Kefenê çi malava?

Paşê, wî nas kir ku pirs pirsa caw bû û wî berdomand:

- Eger tu li ser vî cawî dipeyivî, bi Xwedê min sar bû û min ew li ser rûyê erdê dît. Min ji xwe re got heye tuneye ew ji mirovekî ketiyê û...

Paul ji bêhntengiya hinava xwe rê neda û car din qîriya:

- Mirovê çi halê çi! Ew cawê te bi ser milê xwe dakiriye bixwe perçekî ji kefenê xwediyê qesrê ye. Bêje, ma ne te ew di eywana tabûtê de dîtiye?

Ferzend xwe ji mêj ve ji bo hevdîtineke geş amade dikir. Ew ji dûr ve dihat û dixwest qiriktalî û perîşanî ji bîr bikirana. Erê, wî li der û dora wê avahiyê dixwest ji bîr bikira çima hema mirin bi ser rûyê Cizîrê dibariya. Wî divat bersiva gelek tiştan bizanîbûya û gelek tişt jî ji bîr bikirana. Wî helbet dizanîbû ku Paul ne Xwedê bû ta bi gotmekê hemû jiyana wî biguherta, lê ew hêvîdar bû ku bi saya wî wî hinekî aşitî piştî wan salên şewatan li wê derê peyda bikira.

Wî cawê ser milê xwe bi heyecan avêt, li hevalê xwe mêze kir û tevî ku dilê wî mişt bû, tu gotin ji devê wî derneket. Dengê Paul gihaşt guhê wî:

- Bibuhire, ez nikarim bêtir bi kar û barê te dakevim, bi te re li vê derê bimînim. Tembîya min li te tu zû xwe bigihînî dergehekê berî ku tu av û av herî.

Paul negot çawa Ferzend ê di nava wê qesrê de li kêleka wê deryaya av û av biçûya. Wî rahişt cawê ser rûyê erdê û ew li hev pêçand. Wî xwest bêguman ew dîsa bi ser tabûtê dakira, an jî, hema ew li eywanê wek ku Ferzend ew dîtibû bavêta. Wî xweş hundirê qesrê nas dikir û mîna reşkê şevê ew ji ber çavan ket.

Ferzend di nava qesrê de ma û wî tembîyên Paul di dawiya wê rojê de di ser guhên xwe re avêt. Ew ber bi tu dergehan neçû. Wî dizanîbû ku dûrketina wî ji Cizîra Botan çewtiyek bû û hatina wî ya wê derê rengek ji rengên revê bû, şikestinek bû, lê jiyana wî bi giştiya xwe çi bû? Ma ew ne şikestin li dû şikestinê, çewtî li dû çewtiyê, mirin li dû mirinê bû? Wî dizanîbû ku di serma wê qesrê de wî ê herdem Cizîr bi germa xwe, bi dijwariya evîna xwe, bi zehmetiya jîna xwe bi bîra xwe bianiya, lê wî berê xwe neda tu dergehan. Dema sermayê dîsa

xwe li canê wî gerand, wî berê xwe da eywana fireh ya tabûtê û bêtirs li wî cawî geriya.

Li derve, roka ku çûbû ava çend perçeyên sor li ser milê aso hiştibû. Guhikên şeytên û kevjalên mirî xîza li kêleka qesrê rast kiribûn. Di dawiya wê rojê de, tu şopên solan li qiraxa avê li ser wê qûma di bin nigan de diçû xwarê nedixuyan.

## ROJEK WEK ROJÊN DIN

Eger berî deh duwanzdeh salan ji Darayê Dihokî bihataya pirsîn: "Gelo çi tişt hew di bin stûna asmên de jê ne xweştir heye?", wî ê di cî de bigota: "Ew jiyana di kampên penaberan de ye, ew ji niştiman û welêt dûrketin e". Lê ji wan deh duwanzdeh salan û vir de, eger hem ew pirsa han ji wî bihataya kirin, wî ê bêguman bersiva xwe bi awayekî din bidaya.

Wê rojê, bayekî xurt li Parîsê dikir vîzevîz û mîna melkesek pehn ku ne dihat dîtin, wî kêlekên cadên herdem tijê vala kiribû. Dara di odeya qatê heftan de nekir debar û derket. Ew li îstegeha Porte d'Auteuilê li metroyê siwar bû û berê xwe da Tara latînî di navenda bajêr de. Piştî ku wî carekê li Trocadéroyê metro guherand, ew li îstegeha Mabillonê, li tara Saint Germain des Prés peya bû. Di gel ku ew tar herdem

bi tevgereke mezin bû Dara wê rojê pêrgî pir kêm kesan hat. Wî di nav wan reyên teng de dirêj nekir û berê xwe da çayxana xwe. Roj ji binî ve ne roja derketinê bû; ew rojek bû ku mirov li malên xwe, bi jin û zarokên xwe re rûdiniştin. Lê Dara ne xwedî jin û zarok bû û ne dostika wî hebû. Wî ê li malê bi tenha serê xwe çi bikira?

Hundirê çayxanê weke cadeyên bajêr vala bû. Garsonan anişkên xwe danîbûn ser kêleka bara ji misê û ji xwe re henek dikirin. Dara di wê çayxanê de ji çend ciyan hez dikir û wilo jî wî berê xwe da qatê jorîn. Berî ku bi pelikan ve hilkişiya, wî wek her carê li Lîza nêrî. Lîza keça fransî, keça dilrevîn herdem dev bi ken bû û diranên wê ên spî di nav lêvên wê ên sor û dagirtî de mîna mîrwaran diçirisandin. Ji ber ku wê rojê çayxane bêj hema vikîvala bû, Dara dikarîbû bêtir ji xwe re li wê bineriya. Wî nizanîbû bi rastî navê wê çi bû lê wî ji navê Lîza hez dikir û wî ew nav lê kiribû. Ew ji xweşikbûna rû û laşê wê tu carî têr nedibû, dikarîbû bi salan li ber wan bima. Lîza jî dizanîbû çawa xwe nazenîn bikira û xwe li ber dilê xortan şîrîn bikira. Wê hema ji ciyê xwe dev ji kenê xwe bernedida, xwe li ber dilê kirîdaran xwe naz dikir. Wê ne digot ne erê ne na û hema şûşa Coka Cola nêzîkî devê xwe dikir, ji kaniya xweşiyê vedixwar û dikeniya. Li ser sûretê dîwarî, Lîza herdem bi derpiyekî pir biçûk bû û sînga xwe ya dagirtî dida ber roka havînek germ. Wê xwe li ser qûmek nerm ramidandibû, û hayê wê ji bayê felekê tunebû. Wê tenê dixwest vexurên Coka Cola pirtir bikirana, dixwest ku mirovan tenê ji ava lêvên wê û ji şûşa di destê wê de vexwarana û tucarî tîhna wan neşikesta.

Dara nikarîbû pir li wir bima, kenê garsonên çayxanê bix-

we bianiya. Li qatê jorîn tu kes nebû û wî ciyekî nêzîkî pencera mezin helbijart. Ji wî ciyî wî herdû cadên bajêr ên mezin didîtin, rêzên dukanan, darên bexçeyê Cluny û otobusên kesk ên bajêr. Wek her car, wî pirtûk û nivîsên xwe danîn ber xwe, pirtûkek ku ji mêj ve dixwest bixwenda vekir. Wî hinekî zor li xwe kir ji ber ku ji binî ve dilê wî nediçû ne xwendinê ne nivîsandinê. Serê wî ji derd û kulan giran bû û tîp û rêzan li ber çavên wî dîlan kirin, bûn wek mûrçeyên hûr, wek gêrgerîkên reş û li ser rûpelan geriyan. Dara pirtûk girt û bi xemgînî nêrînên xwe li ser şaxên darên rût gerandin. Bayê xurt şaxên bê pel bi hêrs li hev dixistin û tevî ku pencerên çayxanê girtî bûn, nalenala daran û carecara bayî gihaştin guhên wî. Ewrine avis di bin zikê asmanê nizim de dabûn dû hev.

Dara deftera xwe ya navnîşan û hejmarên telefona vekir, pelên wê li hev xistin. Du sê kes hebûn wî dikarîbû ji wan re telefon bikira. Lê wî deftera xwe car din xist çentê xwe. Wî nexwest tu kesî di serma wê rojê de eciz bikira. Paşê wî di dilê xwe de dizanîbû ku wan du sê kesan ê ji xwe re li behaneyan bigeriyana: "Bubuhure, Dara can, piştî du rojan îmtihanên min hene", "Bi serê te Dara hevala min ji Lyonê ji bo min hatiye, anuha li bal min e û nabe ez wê bi tenê bihêlim", "Sibe ez kar dikim û gerek ez hinekî xwe amede bikim, tu dizanî kar çawa wextê mirovan dibe", "Bi serê te Dara tayê min girtî ye û di nav ciyan de xwêdanek min digire yek min berdide". Wan hemwelatiyan dikarîbûn bi hezaran tiştên wiha bigotana û digotin jî. Bayê xurt di bexçeyê li hember çayxanê bi çiqilên bêçare ji xwe re dilîst û bi bêzariya wan dikeniya.

Gersonek bi payine sivik bi pelikan hilkişiya û ji pelika dawîn ji dûranî got: " Wek her car qehwak û qedehek av ne wi-

lo?" Dara got: "Ere, ji kerema te" û dîsa serê xwe xist cama pencerê. Otobusa 96 an ku diçû Porte de Lilas derbas bû û ji bilî şufêr û du rêwiyan tu kesên din tê de tunebûn.

Dara qehwa xwe kir du sê qurt bêyî ku bizanîbûya ew giran an sivik bû, bi şekir an bê şekir bû. Wî her car qehwe dixwest ji ber ku erzan bû, paşê wî ji qehwê hez dikir ne ku hez nedikir. Demek dirêj di wê navberê de nebuhurîbû dema wî bawer kir ku dengên payine sivik ji jêr ve hatin. Li ber guhên wî gav biçûk bûn û wî ji xwe re got ku hebûya nebûya jinekê berê xwe dabû aramiya qatê jorîn. Wilo jî nêrînên wî bi pelikan ve girêdayî man ta ku keçek ji wî re di valahiya deverê de xuya bû. Keçê çavên xwe gerandin, wek ku li avdestxanê an jî li ciyê telefonan bigeriya, lê wê ciyekî ji bo rûniştinê dixwest. Ew li kêleka pencera mezin bi du masan dûrtir rûnişt.

Keçê ji çenteyê xwe yê destan pirtûkek derxist û piştî ku du sê caran li rûyê Dara nêrî serê xwe xist nava rûpelan û Xwedê giravî dest bi xwendinê kir.

Nalenala daran û guveguva bayê har hatin birrîn û nema gihaştin hundirê çayxanê. Dara jî nema xwe bi tehna serê xwe dît. Wî dîsa jî rahişt pirtûka ber xwe û wek ku tiştek jê re nemabû wî ew giş bixwenda, wî pelên dawîn jê xwendin. Nêrînên wî di ser gotin û rêzên ristan re çûn bê ku wî tiştek bidîta û ji xwe re got: "Baş e, pir baş e. Wê dikarîbû li hezar ciyên din bimaya, dikarîbû li paş stûnekî rûnişta, ma stûn ji vê çayxanê kêm in? Wê dikarîbû li qatê jêrîn jî bimaya. Lê maseya kêleka min helbijart. Ma ji vê yekê baştir?"

Piştî demekê, wî dest pê kir di ber xwe de, di bin çavan re li keçê nêrî, paşê wî hinekî nêrînên xwe eşkere kirin. Wî divat di serma wê rojê de ji mehîna êşê pêya bibûya. Jineke wek ya

li hember wî dermanê dilan bû, xewnek pir kevn bû û anuha belkî ber bi gewdebûyînê diçû. Wî ji xwe re got ku keçê ji qazî ve serê xwe xistibû ber xwe û wê bêguman tiştek ji naveroka pirtûka xwe fehm nedikir. Wî di serê xwe de berdomand: "Eger dilê wê nexwestiba, ew ê li mala xwe jî bimaya. Ma kî ji mala xwe di rojek wek vê rojê de derdikeve!"

Tiştekî ji destpêkê de bala wî kişandibû, hiştibû ku wî nema bizanîbûya gelo ew heşyar bû an hêna di oda xwe de di nav ciyan de bû. Ew tişt ew bû ku ew keça ciwan pir bi ser Lîza ve diçû. Por, pêşanî, ebrûh, mijank, çav, lêv, çen, rûhinarik, hemû yên lîza bûn. Lê eger Lîza sûretê dîwarî mîv tazî bû li ser xîza perava giravên başûr bû, keça li hember wî rûniştibû kincên zivistanê bi ser bejna xwe de kiribû.

Di wan salên dawîn de, erê Dara bi welêt difikirî, car caran li tirêna xewnan siwar dibû û vedigeriya cî û warê zaroktiyê, lê ew bi gelek tiştên din jî xêrîk dibû û dadiket. Yek ji wan tiştan ew bû ku wî dixwest li Parîsê jiyanek bi rûmet bidîta. Wî pêşî dixwest karekî baş ji xwe re peyda bikira, xaniyê xwe xweş bikira, ciyekî fireh ji bo keçek wek ew keça li hember wî rûniştî çêbikira. Wî gerek pişta xwe bida sitûna aramî, dîwarê hêminiyê. Piştî jinek hêja, zencîra tenhayiyê ê ji hev biketa. Wî bawer dikir ku eger çareyek ji bo jiyana wî ya tar û mar peyda bibûya, ew ê bi saya karekî baş, jineke baş û dostine baş peyda bibûya.

Wî ji xwe re got ku ew ne cara yekem bû ku ew û wê keçê wilo pêrgî hev dihatin û nêzîkî hev rûdiniştin. Tenê du sê gav di navbera wî û wê de hebûn, lê ew gavên hanê mîna tuxûban jê re xuya kirin, mîna sînorên dijwar li ber rûyê wî man. Wî ew dîtibû, lê li kuderê? Kengî? Çawa? Wî nikarîbû bersivên

wan pirsan bida. Di wê navê de ji dêvla dest pê bikira bi wê re biaxiviya û perdeya bêdengiyê bidiranda, wî biserhatiya xortekî Kurd anî bîra xwe.

Di şevekê de li Parîsê ew pergî Kavo hat. Ew ne ji mêj ve gihaştibû serbajarê Fransayê û Kavo ji ber gelek tiştan bala wî kişand û piştî wê şevê gelek caran jî hat bîra wî. Kavo pirça serê xwe bi rûnê ji bo mûyan xwaro maro kiribû, soline reş pir mezin xistibû lingên xwe, tîtik û mîtik bi xwe ve kiribûn û mîna meymûnekî di nav hevalan de diçû û dihat. Wê rojê jî li derve guvîna bayekî xurt bû. Kurdan xwe gihandibûn hev û her yekî dixwest aloziyên jiyana li sergûnê ji bîr bikira û rojên geş bi bîra xwe bianiya. Wilo jî, eger di nêrînên jin û mêran de xemgînî nedihat veşartin, kêfa Kavo bixwe li cî bû û her ku ew diliviya ew kêfxweşî, ew hezkirina ji xweşiyên jiyanê, ji wî diweşiyan, wek baranekê ji wî dibariyan. Keçeke hûrik xwe xistibû bin çengê wî û hema destê xwe dixist bin çermê çakêtê wî wek ku qefalî bi ser de hatibû. Kavo wek masiyekî di nav avê de bû, wek firendeyekî di nav asınanê bextîyariyê de bû. Nêzîkî dawiya şevê, wî bîstikekê xwe ji nav lep û navperûşkên hevala xwe derxist û ber bi Dara ve hat. Wî destê xwe danî ser milê wî û bi nermî ew ber bi masên xwarin û vexwarinê kişand. Ji bo şevê, jinên Kurd nanê welêt û hemû çeşîtên xwarinên kurdî çêkiribûn. Wan sênî û tebsîk li ser masak dirêj rêz kiribûn. Kavo kûfteyek rada devê xwe û destê xwe dirêjî şûşeyek bîra kir û ew bi ser gewriya xwe dakir. Li ber masa xwarinê wî got: " Heval tu bêguman ne ji zû de ji welat derketiyî. Ev yek di nêrînên te ên gundiyan de eşkere ye ".

Dara got ku rast bû ew ne ji demeke dirêj ve gihaştibû Fransayê. Ew bi nêzîkî deh panzdeh malan re, bi saya rêxisti-

nekê ji rêxistinên parastina mafên mirovî ji kempek penaberan hatibû. Ji ber ku debara wî li bajarê biçûk nedibû, wî berê xwe dabû Parîsê, bajarê ferheng û hunermendiyê. Dara ê dirêjtir bikira û belkî li ser gelek tiştên jiyana xwe ya kesane jî bipeyiviya lê Kavo ew yek nedixwest û di nav lêvên xwe de keniya û got:

- Baş e! Ev yek li ser ser û çavên min. Ez ji binî ve ne li dijî çand û kulturê me. Lê malavayo, tu wilo li min û hevala min mêze dikî tu dibêjî qey te kes bi çavên serê xwe tucarî nedîtine.

Dara bi van gotinan sor bû. Rast bû wî li wan herduyan nêrîbû ji ber ku ew cara yekemîn bû wî tiştekî wilo bi çavên serê xwe didît. Wî dizanîbû ku tiştên wilo li bal Ewropayiyan, nemaze li bal Inglizan hebû, lê wî nikarîbû bawer bikira ku Kurdekî dikarîbû xwe têxista wî kirasî, zencîr bi çakêtê xwe yê çermîn vekirina, guhar têxistana guhên xwe.

Kavo rahişt kûfteyek din, bi bêhntengiyek diyar ew cût û daqurtand:

- Tu dizanî min dikarîbû ji binî ve guh li te nekira, lê ez nizanim çima hema wilo dilê min ji ba Xwedê ji te re vebû.

Kavo çend qurtên li dû hev li şûşa xwe xist û berdomand:

- Ez jî wek te bûm dema ez ji welêt hatim. Lê min tiştek nas kir û wî tiştî gelek derî di rûyê min de vekirin. Min nas kir ku mirov li vê derê gerek wek lastîkê be, li gor bayê dem û serdeman be. Mirov divê mîna zilê nerm be. Eger tu bixwazî mîna min ciyê xwe di vê jiyanê de bibînî gerek e tu wek lastîkê bî, wek mar bî.

Wî destê xwe ji hevala xwe re bilind kir û ji Dara re berdomand:

- Xuyaye tu bê heval î. Keçên vê derê ji xortên nerm, wek lastîkê nerm, hez dikin.

Paşê ew hinekî di ber xwe de keniya:

- De li hevala min biner çawa ew bêyî min maye!

Kavo bi rastî bê xem dixuya. Wî bêguman jiyana xwe bi ya tu kesî nedida, ciyê xwe di nava civatê de ji hemû aliyan saz kiribû. Derengî şevê bû û serê wî baş germ bûbû, lê wek ku wî dixwest ji destpêkê de tiştekî giring ji Dara re bigota û ew yek ji bîr kirbûya, wî car din destê xwe danî ser milê wî:

- Birako tu ê rojekê bi ya min bikî û dîplomatekî mezin wê ji te derkeve. Ev yek li ser rûyê te xuyaye. Li vî welatî tenê kesên nerm, wek lastîkê nerm, dikarin bigihên miradên dilê xwe. Zimanê dirêj û nermbûyîn pir bi kêrî mirovan tên. Vê yekê ji bîr meke ha!

Dara di çayxanê de rûniştî bû û gotinên Kavo xweş dihatin bîra wî, di serê wî de dikirin zingînî. Wext derbas dibû û keçê car caran serê xwe ji pirtûka xwe radikir, li saeta xwe an li rûyê wî yê zuha dinêrî. Dara bawer kir ku wê ji nişka ve jê re got: " Hişko, serhişko, ma ez çima nêzîkî te rûniştime? Ma ne ev yek ji bo te ye, kero?". Lê wê li pirtûka xwe dinêrî û eşkere dikir ku ew ê di demeke nêzîk de rabûya, eger tiştek ji Dara çênebûya.

Dara jî divat rabûya ser xwe û bi zimanekî xweş, bi zimanekî nerm bigota:

- Xanim bibuhure eger ez te aciz dikim. Dilê min di serma vê rojê de hebû ez hevalekî bibînim. Lê vaye em pêrgî hev hatine û wext anuha ne wextê hevalan e. Em dikarin hinekî bi hev re biaxifin, eger wextê te hebe?

Erê, gerek bû ew bi vê nermayiyê xwe bi ser serê wê de

xwar bikira û ê çêtir bûya eger wî berdewam bikira:

- Ez jî ji pirtûkan hez dikim û pir dixwînim. Tu kîjan pirtûkê dixwînî? Wî ê paşê li rûyê wê binêriya û bikeniya. Ew ê bikeniya ta ji wê re xuya bikira ku ew xortekî bi xwe bawer bû. Kavo jê re li ser pirsa jinan gotibû ku kêfa wan ji xortên rûtiriş û xemgîn re nayê û wî gerek wê rojê jê re xuya bikira ku wî nizanîbû ne serma heye, ne jî tenhayî heye. Di şûna bayê dikir vîzevîz gerek wî jê re bida xuyakirin ku bilbil û şalûran awazên jîn û evînê li bexçeyê Cluny dixwendin û wan bextewerî li dora wî belav dikirin. Paşê wî gerek destûr jê bixwesta û bigota:

- Ez xwe bi te didim naskirin. Navê min Dara ye, Darayê Dihokî. Wek ku navê min nîşan dide, ez ji bajarê Dihokê me. Ez kurd im û ev heye çend sal ez hatime Parîsê. Ma ez dikarim hinekî li hember te rûnêm?

Keça pir ciwan ji ber nermî û nazikiya tevger û gotinên wî nedibû bigota na. Wê ê destê xwe ber bi ciyê li ber xwe bikira û bi fransiya xwe, bi wî zimanê nerm û xweş ê bigota:

- Je vous en prie (Fermo, ez reca dikim) Erê, wê ji wî di serma wê rojê de reca bikira. Fransî di dan û standinên xwe de pir xwedî ferheng û zanîn in û bêguman ê û bavê wê ew mezin kiribûn ta ku ew bi awakî xweş û dilnişîn bi kesên dora xwe re bijiya.

Erê, wê ê bi destê xwe yê spî û nazik ciyê li hember xwe nîşanî wî bikira. Paşê wan ê dest bi axiftinek xweş bikirana. Gotinê ê gotin bikişanda û baweriya keçê ê bi Dara bihata. Axiftin ê pir xweş bibûya û serma di nava Dara de jî bihata şikestin. Kavo ji xwe re rêyek dîtibû dema digihaşt keçan. Wî dilê wan bi rewşa Kurdan dişewitand, li ser her çar perçeyên

Kurdistanê diaxivî û ji wan re xuya dikir ku mana Kurdan û qirandina wan bi destê wan ve bû. Wan keçan ji nişka ve xwe didîtin, di serê xwe de dibûn tiştek, bi destê miletekî perîşan û jihevketî digirtin, ew ji zîvariyê, ji demên zordariyê azad û reha dikirin. Piraniya caran wan keçan xwe di dawiya şevê de piştî şûşek an du şûşeyên şeraba sor û çend çixarên heşîşê di nav ciyan de didîtin. Dotira rojê, ew radibûn û bi serekî giran bi kar û barên xwe dadiketin. Wan şoreşên Kurdistanê ji bîr dikirin, ew ji keçine din re li dû xwe ve dihiştin.

Kavo herdem bi nermî reyek ji xwe re peyda dikir lê Dara ê çi ji xwe re bikira keys ta xwe nêzîkî wê keça dilrevîn bikira? Wî ê çawa ji alîyekî dilê wê bi halê xwe bişewitanda û ji aliyekî din jî kêfa wê bianiya. Her çar perçên welat bixwe herdem di wê navberê de di wê rewşa kambax de bûn. Wî dikarîbû jî bi dirêjayî li ser serîhildana Berzanî, an Şêx Mehmûdê Berzencî biaxiviya. Wî dikarîbû bi awayekî xemgîn li ser komara Mehebadê ya ku salekê berdewam nekir û li ser kuştina Qazî Mihemed biaxiviya. Helebçe hîn çêtir bû çûnku di wan demên dawîn de hêna bêhna mirinê ji laşên li ser erdê dirêjkirî dihat û televîziyon û rojname li ser ewrên xerdelê rûniştibûn. Di nav kolanên tengik de, li ber deriyên xaniyên wêranbûyî, li ser reya revê, jin, mêr, zarok wek pezê ku qotik lêxe, an mirîşkên bi êşê bikevin hatibûn ramidandin, zikê wan tilêrî bûbûn. Bavan xwe bi ser zarokên xwe dinuxumandin, dixwestin ew ji mirinê biparastana, lê bayê xerdelê bêdeng xwe li her derê dipêçand, erd û asman dixist bin destê xwe. Ji ber ku Dara ji Dihokê bû, wî dikarîbû li ser Koça Mezin jî biaxiviya, li ser Kurdên xwe li tixûban dixistin û ji her alî bi gulleyan dihatin kuştin. Du sê miliyon kes dev ji malên xwe

berdidan, ji ber sawa mirinê direviyan, ber bi rojên windabûnê û serdemên kuşdaran diçûn. Du sê miliyon jin, mêr, zaro, kal, pîr ji nişka ve dibûn parsek li deriyên Ewropayê bi destên qirêjî, bi lêvên qelişî dixistin, dikirn gazî. Kurd herdem mîna sêwiyan bûn, destê wan weke bêrên zingarî herdem direêjkirî bû, li ber dîrokê vekirî bû û Dara dikarî bû li ser van tiştan bipeyiviya

Paşê hat bîra wî ku Kavo jê re gotibû ku ne baş bû ku hema wî perîşaniya miletekî rêz bikira. Gerek bû wî zû demên şewatan li paş xwe ve bihiştana û dest bi gotinên xweş bikirana. Gerek Dara li ser tiştên xweş biaxiviya, li ser fîlmekî sînemayê an jî şanoyekê. Lê ew ji mêj ve neçûbû tu sînemayê û çûyîna şanoyan ne tiştekî ewqas hêsan bû.

Dara bi xemgîniyek diyar nêrînên xwe li ser çiqilên ku car din dikirin carecar gerandin û paşe serê xwe xist ber xwe. Wê rojê, wî dikarîbû li ser xwe, tenê li ser xwe jî biaxiviya. Çima na? Wî dikarîbû bi dirêjayî li ser tenhayiya xwe, serma ku di hestiyên wî de diçû xwarê bipeyiviya. Ji derveyî pirsa welêt û sergûnê, serêşên mirovan jî hene û wî dikarîbû derdên mêrekî ji jinekê re bigota.

Keça ciwan li saeta destê xwe nêrî, û wek ku sozek wê hebû û ew ê dereng biketa wê bi lez rahişt çentê xwe û daket. Ji Dara re xuya bû ku qurpequrpa paniyên wê ji hundirê çayxanê derneketin. Wî dît çawa Lîza li jêra pelika jêrîn rawestiya, kincên xwe ên zivisatanî ji xwe kirin û xwe li ser xîza nerm car dî ramidand. Wê şûşa xwe ber bi devê xwe ve bir û dîsa dest bi kenê xwe kir.

Dara perên qehwa xwe li ser masê hiştin û rahişt çentê xwe. Qatê jêr herdem vala bû û garsonan hêna ji xwe re he-

nek dikirin, xwe bi ser hesinê barê de xwar kiribûn. Dara car din li ber Lîzayê rawestiya û bi xemgînî lê nêrî. Dema wî pişta xwe da wê û ew ber bi derî ve çû gotina "hişko", "nenermo" car din li ber guhên wî ketin. Li derve, wî li hawîrdora xwe li bajarê sar nêrî. Di bexçe de, daran bi dengekî ketî dikirin carecar û nizanîbûn çawa xwe ji ber hovîtiya bayê wê rojê bidana alî. Li ber çavên Dara gelek xortên wek Kavo xuya bûn, wan geh bi nermî, bi dîplomasî ji hev re xweş dikirin, geh qîlên xwe di canên hev de radikirin, herdem bi nermî û dîplomasî. Hemwelatiyên wî li ber çavên wî geh bûn wek pisîkan xwe di nav dîwarên Parîsa tevlihev de vedişartin, geh bûn wek sehên har û hema dixwestin laşê hev bidirînin. Dara di wê gavê, di dijwariya wê tenhayiyê de pir bêriya rûyê dayika xwe û destên bavê xwe kir. Wî bêriya xwehên xwe, birayên xwe, dostên xwe kir, ta bîra dînên bajarê xwe kir.

Wilo jî, eger berî deh salan ji wî bihata pirsîn: " Gelo çi tişt hew jê di bin stûna asmanan de ne xweştir heye ?", wî ê di cî de vegerandibûya, bê ku pir zimanê xwe di devê xwe de bigeranda: " Ew bê welat mabûn e, ew ji wekat dûrketin e ". Lê ji deh salan û vir de û nemaze di sermaya wê roja hanê de, eger hem ew pirsa hanê ji wî bihataya kirin, wî ê bêguman, bersiva xwe bi awayekî din bida.

## DERIYÊ VEKIRÎ

Di wan salan de, di navbera 76 an û 80 êyî de ez li Parîsê dimam. Odeke min teng û tarî hebû û ez li wê bi cî û war bûbûm. Ew di avahiyek kevin de li nêzîkî îstegeha metroya La Muettê bû. Ji rojan rojek zivistanê bû û ez gelekî westiya bûm. Min xwe li ser ciyê xwe dirêj kiribû. Ez li hêviya xewê bûm û xew jî ê wek horiyekê, periyekê ji periyên buhuştê bihata. Wê seriyek ê li min bida, çavên min bi dîtina xwe nerm bikirana. Ew ê bibûya şerşefek hebirmêşî xwe li laşê min yê westiyayî bipêçanda, ew ê bibûya dilopên xweşiyê û dilop dilop xwe berdaya nava palikên çavên min. Pêlên germê ji lûlên chauffagê derdiketin ber bi zikê odê hildikişiyan û dadiketin, ber min ve dihatin, min ber bi xeweke giran û şîrîn ve dajotin. Min wilo dilê xwe bi xewê xweş dikir û ez ê bêguman razama

eger ne ji Seydo bûya. Di destê wê rojê de, di wê Parîsa tevlihev de, Seydo li deriyê min xist. Wî xwe li min girt, xwest ku min, rebenê Xwedê, min di ber dilê wî de bida, di wê cîhana girtî de deriyek, pencereyek di rûyê wî de vekira.

- Kî ye? min bi fransî got

- Ez im, mamoste, ez im Seydo, wî bi kurdî vegerand.

Min li hemwelatiyê xwe mûn dikir û ji ber vê yekê, ez ranebûm ser xwe û min ji nav ciyan bang kir:

- Seydo derî vekirî ye. Derbas be!

Di şeva buhurî de ji bimî ve xew bi çavên min nebûbû. Min li garajekê, li derveyî Parîsê, li Bagnoletê kar dikir. Di şevê gişî de kemyon dihatin û diçûn, malên giranbuha vala dikirin û bar dikirin. Şufêrên wan diketine şûna hev, ên servîsa xwe tev dikirin, çav li xew, bi lez ber bi malên xwe ve diçûn, ên nû dihatin li kêleka mekîna xwekar ya vexwarinên sar û germ qehwa xwe vedixwarin û berdidan xewê. Min kaxezên malê barkirî didane destê wan û bi wan kaxezan min ew bi rê dikirin.

Seydo buhurî hundir û ji ber serma derve wî berê xwe da chauffagê, tiliyên xwe di ser lûlên ava germ re birin û anîn. Ez ji nav ciyan çenk bûm û min berê xwe da destşokê. Min herdu destên xwe di bin şirava sar de dirêj kirin û min rê ji tevzînokên sar re vekir. Ez li destmalê negeriyam û min ser çavê xwe zuha nekir. Min hinekî xwe li ser textê razanê dirêj kir, û ta ku xew bi derîne din de biçûya, dev ji min berdaya, min rahişt kasêta li ser masê û min ew xist teypê. Dengê dudûkê ji kasêta stiranên Kurdên Soviyetistanê derket, ji dûr ve hat û di nava odeyê de tev li pêlên germê bû.

Min bêhntengî li ser eniya hevalê xwe xwend lê min xwe

ragirt. Min jê nepirsî wê rojê çi bûbû, çi bi serê wî hatibû ta wî berê xwe di sibeha zû de dabû min. Wî helbet dizanîbû ku min bi şevan kar dikir û bi rojê ez radizam. Wî dizanîbû jî ku saet ne saeta serlêdanan bû, lê bi xwe nikarîbû, ji ber coşa dilgermiya di nava xwe de bêguman debar nekiribû. Wî eşkere li min nedinêrî wek ku şerm dikir nêrînên me rastî hev bihatana. Wî dizanîbû, bi ser de jî, ku di êvara rojê de ez ê dîsa biçûma ser karê xwe. Ew ji ber chauffagê rabû, li ser sendeliya li ber masê rûnişt, destê xwe dirêjî teypê kir, dengê wê hinekî bilintir kir. Dengê dudûkê xweştir xwe di nav pêlên germiyê de dirêj kişand û wî em bi xwe re dûr xistin, dûrî jiyana Parîsa tevlihev birin, bîranînên me di serên me de li hev xistin.

Ez bi tenha serê xwe di wê odê de dijiyam û wê tenhayiyê rê li ber hevalan vedikir ku wan bê telefon û bê soz kengî bixwestana dihatin. Sê salên min di wê odê de derbas bûbûn. Her ku ez vedigeriyam an ji malê derdiketim, ez di pênc deriyan re derbas dibûm, ez bi sed û pênc pelikan hildikişiyam an dadiketim. Ji odên hemsaye û cîranan bêhna xwarinê herdem xurt dihat. Lê ew bêhnên xurt, nemaze bêhna xwarinên reşên Afriqiyayê, nema serê min gêj dikir. Ez hînî wan bûbûm, wek ez hînî baranê bûbûm, ewrên reş û giran, metroyê, xwaringehên ji bo xwendevanan û wan nivîsên nejadperestan li ser dîwaran "Fransa ji bo Fransiyan e. Biyaniyên gemarî vegerin welatên xwe".

Ava min li ser çavên xwe kiribû hin bi hin berdida xewê, lê piştî şevek zehmet, xew vedigeriya û pêlên xwe bi girr û engirîn bi ser min de dadiweşandin. Seydo deng nekir, lê ew bêdengî di serê min de ji axiftmê xurtir bû. Ew mîna xumexuma

lehiyê bû, wê berê xwe da bû oda qatê heftan, min li ber xwe dibir. Seydo herdem xwîngerm bû, dixwest her deqe dunya xera bikira, ew li ser bingeha bîr û baweriyên xwe ji nû ve ava bikira. Lê dema ew li ser sendeliyê rûnişt, gotin pûç bûbûn, bêçare bûn, nikarîbûn wê rojê bi kêrî wî bihatana. Seydo çivîkekî qels bû ji ber ba û bahozê, ji ber dijwariya rojên dûrbûne xwe avêtibû oda min, xwe li hemwelatiyê xwe girtibû. Wê rojê, ew westiya bû, ji her tiştî westiya bû. Wî dawî devê xwe vekir û di nav dengê stiran û awazan de dengê wî sist û melûlî gihaşt guhê min:

- Mamoste, min do dev ji karê xwe berda.

Min Seydo di civînekê de, di jêra avahiyek kevn de li taxa Pigallê nas kir. Kurdên Parîsê ew xaniyê mîna şikeftê ji xwe re dîtibûn, kiribûn komele û lê civînên xwe çê dikirin. Wan li wê derê derdên xwe ji hev re digotin û li bember êrîşên çavsoriyê, hovîtiyê, pişta xwe bi hev xurt dikirin. Ez nû gihaştibûm Parîsê û ew cara yekemîn bû ez diçûm wê derê. Ji nav hemû xortên rûniştî, Seydo bêtir bala min kişand. Ew ji me gişan biçûktir bû û di serma wê zivistanê de, di nem û şiliya wê şikeftê de, wî çakêtekî havînê avêtibû ser milê xwe û ji şerwalê wî yê tenik û qermiçî min nas kir ku ew tu carî nedihat ûtî kirin. Berî civînê, me xwe bi hevdu da naskirin. Min jê pirsî gelo ew xwendevan an karker bû. Wî bersivek diyar neda ber rûyê min. Pirsa min naxwe bersiveke dirêj dixwast. Seydo ji min re bi dirêjayî rave û rohnak kir ku ew bixwe hêna ne xwendevan bû, ne karker bû ew di navbera erd û asimanan de bû. Ew jî wek min ne ji mêj ve gihaştibû Parîsê û dixwest bixwenda. Pêşî wî ê zimanê fransî baş bixwenda, paşê ew ê biçûya xwendegehê, heft heyşt salan textorî bixwenda ta ji wî

textorekî hêja derketa, textorekî ji bo zarokan. Lê ji ber ku jiyan li her derê û bi taybetî li Parîsê bê pere nedibû, wî hevî dikir di ber xwendinê re karekî hêsan peyda bikira, karekî ku pir wextê wî nebira û ew ji hevalan û ji xebatê jî dûr nexistiba.

Di wê şikefta sar de, min jê nepirsî wî sar bû an na. Di nav wan çekên sivik de, wî xwe mîna keroşkekî qurnisandibû, serê xwe xistibû nava milên xwe û diranên wî li hev diketin. Civîn teva bûbû nebûbû min jê xwest em bi hev re herin tiştekî germ vexun. Min qapûtê xwe dayê ji ber ku min vezele û çakêtekî germ li xwe kiribû. Wî qapûtê min li xwe kir û me berê xwe da qehwexaneyekê. Tar tara qehpik û gewendan bû. Li serê kuçê, du sê qehpikên ji welatê Muxribê bang rêwiyan dikirin. Wan girrê xwe di me jî dan, çav dane me û ji ber ku porê me reş bû, wan bi zarava xwe jî tiştine gotin, lê em di wan gotinan negihaştin. Min qehwak xwest û Seydo qedehek mezin şîrê germ. Wî pêşî qedeh di nav tiliyên xwe de guvaşt, li germahiyê geriya. Em demeke dirêj bi hev re man, li ser şoreşên cîhanê û rewşa mirovan axifîn. Di nav pêlên germê û dûmana çixarên pir de, dostaniya me dest pê kir rîsê xwe bada. Wê bingeha xwe li ser serma dûrbûyînê, dijwariya tenhayiyê û li ser dilpakiyê danî. Seydo herdem hevalekî min yê zaroktiyê dianî bîra min. Bi wî hevalî re hezkirina me ji başokan û ji çiyayên bilind re roj bi roj mezintir bûbû. Piştî Koça Mezin, me berê xwe dabû sînor û tixûbên jiyanek nû û mîna keriyekî pez, em terqiya bûn, li bajarê sergûnê belav bûbûn. Li wê çayxanê min û Seydo me navnîşanên xwe dane hev û dema min xatir jê xwest, ew ji ber min rabû. Temenê min ji yê wî bi sê çar salan bêtir bû û belkî wî jî di rûyê min de rûyê hevalekî biçûkaniyê didît. Wî rûmeteke bilind da min, destê min bi

hêrs hejand û hişt ez lê ecêbmayî bibûma. Di wî laşê ziravokî de, di wê bejna hûrik de, hêzek pir xurt hebû, agirekî pêketî, hezkirineke mezin ji jiyanê re hebû.

Di odeya min de, di wê roja zivistanê de, nêzîkî sê salan di ser hevnasîna me re derbas bûbûn û min bala xwe dayê ku kincên hevalê min herdem ji bo serma zivistana Parîsê nedibûn. Piştî sê salan tu guhertinên mezin, guhertinên ber bi çav, di jiyana me herduwan de çênebûbûn. Min herdem bi şev li garajê kar dikir û Seydo bi şev û rojan ji ser mekînên dirûtinê û ûtîkirinê ranedibû. Ew hêna ne hînî zimanê fransî bûbû, ne dikarîbû biçûya navê xwe li xwendegeha textoriyê binivîsanda.

Xew jî geh dihat geh diçû. Seydo li ser sedema hatina xwe wê sibeha zû bi şêweyekî ne eşkere peyivî:

- Min dev ji karê xwe berda, ji ber ku ez naxwazim xwîneke li vî welatî têxim hustuwê xwe.

Bi gotina "xwînê" xewê xwe bi gihiştî ji ser çavên min vekişand. Min destê xwe dirêjî teypê kir û deng hinekî kêm kir. Min Seydo nas dikir û dizanîbû ku wî dikarîbû bi hêsanî xwînek bixista hustuwê xwe. Min jê pirsî:

- Xwedê bike tu û xwedanê kar hûn ranebûn hev?

Seydo û deh duwanzdeh Kurdan li bal Kurdekî bi navê Remo dixebitîm û wî Remoyî pir ew dêşandin, perên wan dixwarin, kaxezên wan çênedikirin. Wî bi sed caran soz dabû Seydo ku kaxezên wî çêbikira, lê ji bîr dikir an jî hesabdarê wî nexweş diket, diçû deverine din, kî dizane....

- Lawê kuçikan her roj digot îro sibe îro sibe. Bi ser de jî ew anuha dibêje nikare perên karkeran bide wan , Xwedê giravî ji ber ku bank ê destên xwe bidin ser mekînên wî. Ev ne

cara peşî ye ku ew vî karî dike, kargehekê digire, yeke din piştî heftiyekê vedike.

Min li Seydo nêrî û nizanîbû çi bigota. Ew li jiyanek çilo digeriya û pêrgî çi dihat? Wî welat û demên êşê li dû xwe hiştibûn, hêvîdar bû jiyanek bi rûmet, dunyayek xweş, bê serêş li derekê peyda bikira û li Parîsê ew ketibû nava gur û roviyan. Dema ew diaxifî, peyvên wek "azadî", "rastî", "rewşek xweş", "mafên mirovan", "gelên bindest" herdem dihatin ser zimanê wî. Wî bi sedan navên nivîskar û feylesûfan dizanîbû, pirtûkên wan bi rastî xwendibûn. Li Parîsa tevlihev hêviya wî ew bû ku wî karekî hêsan peyda bikira û di ber re jî bixwenda, hema bixwenda û bixwenda. Lê mixabin, li paytextê huner û zanînê, Seydo hema kar dikir, ji sibehê ta êvarê ji kargehê dernediket. Wî ji jiyanê dixwest wê deriyek di rûyê wî de vekiraya, lê dîwar li dora wî pir dibûn, bilind dibûn, digihaştin perên asmanan. Di oda min ya teng de, di wê rojê de min dît ku Seydo ji gotinan westiya bû. Bi ser de jî ew birçî bûbû. Wî ji min pirsî:

- Mamoste, ez hinekî birçî me. Xwarin çi li bal te heye?

Ji ber karê xwe yê şevê, min wext nedidît biçûma mexazeya mezin xwarin ji bo du sê hefteyan bikiriya. Paşê min piraniya caran li sifrexaneya garajê dixwar. Min dizanîbû tiştekî hêja di sarkera min de tunebû lê min li Seydo mûn dikir û ta ku wî xwe di mala xwe de xwe bidîta, min jê re got:

- Li sarkerê biner. Ez ê jî gepek nan bi te re bixwim.

Û hat bîra min, ew roja min berê xwe da mala wî li tara "Montreuilê". Wî gazin ji min kiribûn û bawer kiribû ku çi ye ne çi ye min li xwe danetanî biçûma mala wî," mala karkerekî kurd". Wî hinekî bi xeyd jî ji min re got "Mamoste, ez têm

mala te, nanê te dixwim, lê tu xwe giran dikî. Wilo nabe". Wî bang min dikir û digot "Mamoste", tevî ku min tu carî mamosteyî nekiribû. Wî navê min kiribû " Mamoste", hin ji ber ku kêfa me ji hev re dihat û hin ji ber ku min çend salên xwe bi xwendinê derbas kiribûn, beyî ku min tiştek bi ser bixista. Wî bêguman jî wilo bang min dikir ji ber min baş bi zimanê fransî dizanîbû û dema karekî wî bi zimên dihat wî berê xwe dida min. Li tara Montreiulê, Seydo bi sê karkeran re di xaniyekî biçûk de dijiya. Wî bi wan re her tişt li xwe pahr dikirin, çi ji kiriya xanî, çi ji perê elektrîkê, çi ji paqijkirina hundir bûya. Ew li malê li ber devê derî li hêviya min bû û bi rûyekî bi ken, bi kêfxweşiyek diyar, ber bi min ve hat, û destê min bi hêrs guvaşt. Wî çay amede kiribû û piştî çayê wî sê çar çeşît û texlîtên xwarinan di navbera me de danîn. Min nas kir ku wî wê rojê baş serê xwe bi amedekirina şîvê êşandibû. Li ser xwarinê em pir nepeyivîn û wî hema sênî ber bi min dirêj dikirin, herdu lîwanên ber min yek hema tije şeraba sor dikir, ya din mişt dewekî têr sîr û xwê dikir. Piştî şîvê, wî sêniyek peqlawa ku bêguman ji taxa Strasbourg Saint-Denisê kirîbû li ber min danî. Li bendî çêbûna çaya piştî şîvê axiftinê bi rastî dest pê kir. Em -ez dixwazim bibêjim Seydo ji ber ku wî wê rojê rê yek car neda min-, em li ser rewşa xwendevan û karkerên kurd li derveyî welêt bi dirêjayî peyivîn. Wê rojê, Seydo jiyana xwe, daxwaziyên xwe, tirs û sawîrên xwe hemû ji min re gotin, li ber min raxistin. Em bi hev re vegeriyan. Me gazî teyrê Sîmir kir, me jê xwest ew me bavêje ser pişta xwe, me bigihîne warê evînê, dunya şadiyê. Em nêzîkî navçeyê bûn. Li wê derê, em bûn mîna başokan û me xwe berda xwarê. Di şûna xweşî û şahiyê de, sînorên şewatan li ber çavên me xuya bûn,

bêhna mirinê em gêj kirin. Axiftinê em hin bi hin ajotin nava demên çavsoriyê, meqeresiyê, zordariyê, bi kurtî nava rastiya tiştan û dilê me herduyan bi me şewutî. Seydo li ser zaroktiya xwe li gund peyivî. Ew li ser hevalên heshesûk û rezan, li ser golê, li ser agirê di havînan de ji asmanan dibariya û li ser dijwariya jiyana karker û palan axifî. Wê rojê jî, Seydo li ser mafên mirovî, li ser jiyana bi rûmet, jiyana xweş bi dirêjayî peyivî. Wî nizanîbû ew jiyan li kuderê bû lê wî ew jiyan dixwest û hêviya xwe jê nedibirrî. Wî digot ku wî dizanîbû ku nikarîbû bi artêşa nezanebûnê û bi demên xwînxwaran lê ew herdem hêvîdar bû bi kêmanî tiştek bigihanda jiyana gelê navçeyê. Min lê guhdarî dikir û ta min hinekî di ber dilê wî de bidaya, min bi henekî got: "Seydo, te çay li ber me danî û te xwe ji bîr kir. Ma tu çaya xwe venaxwî berî sar bibe?" Bixwe çaya wî ji mêj ve sar bûbû, lê wî ew bi kêfxweşî vexwar, qedeha tije kir du sê qurt.

Di oda min de pêlên germê wek perdeyek hebirmêşî di bin zikê ban de xwe li hev dipêçandin. Min divat di ber dilê Seydo de bidaya.

- Kurdên ku ji bo peran bextê xwe reş dikin, derewan li kesên dora xwe dikin pir in. Demên dijwar hovîtiya mirovan dadixîne meydanê. Lê ez bawer dikim tê karekî din peyda bikî.

Û hat bîra min gotinên wî di roja yekemîn de, "karekî hêsan", û min wilo jî berdomand :

- Divê tu karekî hêsan bibînî ta di ber re bikaribî bixwînî.

Min ev peyvên han gotin bê ku bi rastî baweriya min bi wan bihata. Piraniya me di nav karên zehmet û xeternak de xwe winda dikirin. Tenê kesên dizanîbûn xwe li her derê bifiroşin, xwe bi her kesî şelaf bikin, ji bo rewşa diravî xwe nêzîkî

şeytanan jî bikin, ew kesên han bi awayekî cuda dijiyan. Cî ji yekî wek Seydoyê dilpak, nefsbiçûk û xwedî bawerî ne di bin asmanê Parîsê de, ne li tu derên din nebû. Seydo wê rojê nema dikarîbû di ber xwe bidaya, ew rewşa li ser derewan hatibû avakirin hilgirta. Gerek bû min bala wî dûrî wê rastiya em tê de dijiyan bibira û wilo jî ez rabûm ser xwe û bi kêfxweşî min got:

- Seydo, hinek çaya welêt ji min re hatiye. Tu çi dibêjî?

Wî tiştek negot, lê hinekî di nav lêvên xwe de bişirî.

Rojekê, ez çûm Seydo li ciyê karê wî bibînim. Wî hinekî bi henekî hinekî bi rastî ji min re gotibû "Mamoste, tu dibêjî tu ji nivîsandinê hez dikî, tu xwe nivîskar dibînî, lê tu tucarî neketiyî nava jiyana karkeran. Ez anuha li ser mekîna dirûtinê kar dikim. Bi kêmanî were, were bi çavên serê xwe bibîne jiyana Kurdên me li Parîsê çawa ye. Ji vê taxa birciwaziyan hinekî derkeve û bide nava jiyana rast. "Ew tiştê hanê ne rast bû û ez ne wiqasî dûrî jiyanê bûm, lê me soz da hev û wilo jî min berê xwe da îstegeha Bonne Nouvellê, îstegeha nêzîkî ciyê Seydo lê kar dikir. Ez li navnîşanê ker û gêj bûm û ez bi ser wê ve nebûm. Min reya xwe ji sê çar kesan pirsî ta dawî min ew peyda kir. Di nav kolanên teng û gemarî de, li serê kuçan, Kurd, Turk, Hindî, Afrîqayî, Ereb bi rûyên nekurkirî, bi bêhntengî dipeyivîn, rojê gişî li hêviyê bûn xwedanên kar bihatana, keda wan ji bo rojê bikiriyana. Tar ji binî ve ne xweş bû û avahiya ku Seydo lê kar dikir kevn bû û dîwarê wê yê li cadeyê dinêrî kavilên xaniyên bêxwedî dianîn bîra mirovan. Min deriyê derve vekir û ez ketim dalanek reş. Min destê xwe li kilîta lempê pelikand, lê min tiştek peyda nekir û wek kwîran ez dîwar û dîwar meşiyam. Ez rastî pelikan hatim û hêdî

hêdî, di nav bêhna text û çimenta şil de ez hilkişiyam. Seydo ji min re gotibû wî li qatê sisyan kar dikir. Dema ez gihaştim qatê sisyan, hinek ronahiya ji derve ji kulek û rojinan dihat hişt hinekî bêtir min ber xwe bidîta. Di her qatî sê derî hebûn û min destê xwe li deriyê destê rastê da. Ez çend deqan li ber devê derî rawestiyam û min nas kir ku di qula derî re kesên li hundir li min dinêrîn. Geleka ji wan karkeran bê kaxez kar dikirin û li Parîsê ji wî karî re dihat gotin "karê reş". Derî vebû û serê Seydo tê re derket. Wî min derbasî hundir kir û min bi karkerên hevalên xwe da nas kirin.

Kargeh baş fireh bû lê ji ber pirbûna mekînên terzîtiyê, depên ûtîkirinê û komên cawê hatibû birrîn ew biçûk bûbû, banê wê nizim bûbû. Ez nizanim çima lê min di nava xwe de karkerên wê hejmartin û tev Seydo ew di wê rojê de panzdeh derketin. Li ser dîwarên ku boyaxa wan ji wan wek pelên pîvazê rabûbû sûretên ronakbîr û şoreşgeran hebûn. Hin karkeran sûretên Marks, Lenîn, Mao, Che Guevara li ser dîwaran xistibûn, hinine din yên Şêx Seyîd, Qazî Mihemed, Berzanî, Apo...

Seydo bi milê min girt û min ber bi mekîna xwe ya dirûtinê ajot. Wî sendeliyek dirêjî min kir û ew li hember min li paş mekînê rûnişt. Karkeran gişan bi berçe kar dikirin û ji ber vê yekê jî, bêj rojê gişî û perçeyek dirêj ji şevê jî ew di nav wan dîwarên kurimî de diman. Her yekî ji wan bi kêmanî panzdeh bîst hezar dabû kesên ku kaxezên penaberiyê ji wan re çêdikirin û ji bîr nedikir ku çavên hemû malbatekê li destê wan bû. Ji bo hatina min kesekî dev ji karê xwe berneda. Tenê Seydo hema bi kêf li min dinêrî û bi min re bi wê dilpakiyê hema dikeniya. Min jê re got ku tevî ez li wir bûm wî dikarîbû

karê xwe berdewam bikira, lê dengê me di nav gurregurra mekînan de winda dibû. Wilo jî ji dêvla axiftinê me di wê kargehê de kir qîrîn. Seydo helbet wek her car xwest li ser rewşek xweştir, jiyanek çêtir bi dirêjayî bipeyiviya lê gurrîna bi mekînên dirûtinê diket dîwar dihejand û rê nedida wî. Di wê navberê de xwedanê mekînan Remo ji derekê vegeriya. Wî ji mecbûrî silav li min kir, lê eşkere bû hatina min ne bi dilê wî bû. Seydo di vê yekê de derxist û bi dengekî bilind ji min re got "Mamoste, guh li vî bêbavî neke! Erê ew Kurd e lê ji min bawer be ew dikare namûsa xwe ji bo sed firingî bifiroşe". Min lêva xwe ya jêrîn gez kir û tiliya xwe danî ber devê xwe ta Seydo dengê xwe nizim bikira, lê dengê wî bi zorê gihaşt guhê min. Min nexwest li wê derê dirêj bikira, serêş ji hevalê xwe re peyda bikirana. Ez zû rabûm ser xwe û min berê xwe da derî. Min li sûretên li ser dîwaran nêrî û ez nizanim çima wê rojê nêrînên wan rewşenbîr û şoreşvanan tije xemgînî bûbûn.

Seydo bi min re hat ta ber devê derî. Min ji wî pirsî kilîta elektrîkê ketibû kuderê. Ew kemiya û wî ew nîşanî min da. Ew di derekê de bû ku bi rastî tu kes bi ser ve nedibû. Li derve, li tara Strasbourg Saint-Denisê, dunya sar bû û bayekî xurt dikir vîzevîz. Piraniya karkerên biyanî mîna sehên bêxwedî di kolanên gemarî de diçûn û dihatin, li hev digeriyan, li tiştekî ku peyda nedibû kerr û gêj dibûn.

Ava germ li ser agir coşiya. Seydo li bal min wek li bal xwe bû, ciyê her tiştî dizanîbû. Wî xwarin ji sarkerê derxist û nîv nanekî dirêj, nîvê baguettê nîşanî min da û got:

- Mamoste, nanê te hişk e. Ez ê dakevim nanekî germ bikirim.

Dikana nanfiroş hinekî dûrî odê bû û tevî min li Seydo

mûn dikir, min nexwest ku ew bi wan sed û pênc pelikan daketa û car din hilkişiya. Min bi henekî jê re got:

- Ew ê di nav çayê de nerm bibe. Ma nanê tenûrê yê kevn û semûnên binê çadirê ji bîra ta çûne?

Seydo mast, dîlmeyên penêrê "La vache qui rit", (çêleka dikene) û çend lib zeytûn li ser masê danîbûn. Wî wê rojê nexwest henekan bike û got:

- Nanê hişk hişk e û nexweş e, çi li vir be, çi li wir be.

Wî dil tunebû bipeyiviya. Paşê min naskir ku erê gewdê wî li bal min bû lê belê hişê wî dûr çûbû, ketibû nava geremol û gerrînekên fikran. Salên zaroktiya li ser bênderan, li kêleka gola gund, bêguman hatin bîra wî. Wan di serma wê rojê de jî germiyek xurt bi xwe re anîn û Seydo pişta destê xwe di ser eniya xwe re bir, wek ku wî xwest xwêdanek nediyar zuha bikira.

Kasêta stiranên Kurdên Ermenistanê gihaşt dawiya xwe. Bêdengiyê car din xwe li oda qatê heftan girt. Min çayê amede kiribû û ez li hêviyê bûm wê dêma xwe baş berda. Lê ji nişkê ve, Seydo rabû ser xwe û got:

- Bubhure Mamoste, dilê min nema dire xwarinê. Divê ez herim.

Ew ê bi kuderê ve di wê serma hanê de biçûya? Di dîwarê kîjan jînê de deriyek, pencereyeke biçûk an rêyek wê rojê di rûyê siwarê êşê de ê vebûya? Min ew pirs jê nekirin ji ber ku baweriya min bi bersivên wan, eger ew bersiv jî hebûna, bixwe nedihat. Seydo tiştekî din negot û derket. Bi derketina xwe re, wî derî li dû xwe vekirî hişt.

Xewê ji ser çavên min bar kiribû, lê ew ê vegeriya û mîna periyekê destên xwe ên hebirmêşî li ser canê min yê şikestî re

bibirana. Dosta min, xewa şêrîn ê bihata, serek li min bida û wê bihişta min li ser sînga wê hemû kul û derd ji bîr bikirana. Dilber gerek bû bihata û çavên min nerm bikirana. Min çaya germ berda destşokê, nanê hişk avêt û xwarin car din xist sarkerê. Min demekê li deriyê vekirî mêze kir û ew ji min re mîna nîşanekê, rêyekê xuya bû. Min pêşî ji xwe re got ku Seydo ne tenê deriyê oda min vekirî hiştibû lê wî deriyê jiyaneke nû li ber min vekiribû. Lê êvarê ez ê car din biçûma kar û nedibû min serê xwe bi wan tiştan biêşanda. Min got ku tiştekî mezin wê rojê di bin asmanê Parîsê de çênebûbû, asman bi ser serê me de neketîbû û em hêna sax bûn. Tenê hevalek bê kar ma bû û hinekî xewa min li min herimî bû. Derî jî eger Seydo li dû xwe vekirî hiştibû, ew jî ne tiştekî pir balkêş bû. Ma ne derî çêdibin ta bên girtin û vekirin?

# HAVÎNA SEYDO

Germa pir bi tîn mîna baranek ji pêtên êgir bi ser rûyê gundê li bakurê gir dibarî. Zarokan di qiçîna rojê de xwe avêtibûn bin siya dara tuwê, nêzîkî bîra avê xwe vezilandibûn û di nav xwêdanê de mabûn. Li ber siya kin ya dîwaran, li dora qutî û tenekên avê, mirîşk, qaz, werdekan ax hinekî bi navperûşkên xwe vedabûn û bêçarê li piçek hênikayî digeriyan. Seh ji ber germa dijwar gêj bûbûn. Wan xwe bi ser kêlekên xwe ramidandibûn û zimanê wan ji devên wan bi qasî bihustekê kişiyabû.

Di agirê wê rojê de, di kelekela germa wê havînê de Seydo di bin teneka avê de her gav dihat bi ser dev de biçûya xwarê. Wî berê xwe dabû çadira li ser sînga bêndrê û kela girî ji qirika wî dernediket. Ew bi salekê an duduyan ji wan zarokên

bin darê mezintir bû, lê bavê wî ji ber tunebûnê bi awakî cihê li vê yekê nêrîbû. Berî ku çinîna geniman dest pê bikira, ew li kêleka Seydo rûnişt û bi dengekî nerm ji lawê xwe re got: "Seydo, vaye tu anuha bûyî xortekî serxwe. Lawê min lîstika bi zarokên gund re nema ji te re dibe. Tu nema zarokî ta di nav zarokan de bimînî. Gerek e tu alîkariya malê bikî, wek xortan karekî bikî." Wî di serê lawê xwe de wilo xwend ta ku Seydo bi rastî bawer kir ku ew bûbû xortek bê ku hayê wî ji vê yekê hebûya. Bavê wî havînan dibû barhilgir, çewalên genim ên sed, sed û sîh kîlo li ser pişta xwe dikirin davêtin paş kemiyonan, li bajarê Amûdê an li Qamişlokê dadixistin. Wî li bal Hecî kar dikir û wilo jî Seydo bû berdestê Elîkê nanpêj. Seydo ji hevalên xwe dûr ket, di nava çend rojan de Xwedê giravî bû xortekî hivdeh hîjdeh salî û jiyanek nû di rûyê wî de vebû.

Li ser bênderê çadira spî hêna dûr bû. Seydo piştî ku ji nav dîwarên hewşê derket û deh duwanzdeh gavan ber bi bênderê avêtin, wî teneka giran danî ser erdê û xwest hinekî bêhna xwe berda. Hevalên wî di bin siya darê de bûn û wî dixwest her gav hema ew teneke di wê navberê de bihişta û biketa nav wan, bi destê wan bigirta û berê wan ber bi gola avê vekira. Ev tişt ji wî dihat lê wî tucarî nexwest dilê bavê xwe bişikenanda. Wî wilo jî car din rahişt teneka tije û bi gavine sist ber bi bermîlên avê ên li kêleka çadirê ve meşiya.

Roja ku bavê wî jê re li ser kar peyivî û jê re got ku Elîkê tebax li berdestekî digeriya, Seydo di cî de nas kir ku ew ê dûrî heval û hogirên xwe biketa. Lê wî dilê xwe bi tiştekî xweş kir, wî bawer kir ku di binê çadirê de wî ê zikê xwe bida ber xwarin û vexwarinên pir xweş. Sala buhurî, dema ew hêna pir

zarok bû, carinan ew diçû kêleka çadirê, li bal bavê xwe rûdinişt. Ew derbas nedibû lê ji dûranî didît mêvanên xwediyê çadirê çi xwarinên xweş dixwarin. Wilo jî dema bavê wî li ser berdestekî ji bo Elîkê nan çêdikir axifî, goştê berxan, birinca liblibî, dîlimên penêr, çaya pir, av û şekir û hemû xwarin û vexwarinên ku li mala wan peyda nedibûn di serê wî de dan dû hev, li ber çavên wî xuya bûn. Karê wî ê çi bûya? Ew ê li ber destê Elîko bûya û av ji bîra nêzîkî bênderan her roj ji bo çêkirina xwarinê û vexwarina karkeran bikişanda. Wî bawer kir ku karkerên "meslehê" ê bi çend tenekên avê tîhna xwe bişkenînin û ew jî herdem bêkar bima. Lê di bin asmanekî spî de, li ser axek wek sêlek sincirî, havînê laşê mirovan zuha dikir. Germa xurt ew laşên westiyayî diguvaştin, dax didan û tîrên rokê xwe seraser berdidan nava reh û damarên xwînê. Karkeran ji ber wê şewatê piştî servîsê xwe davêtin bin siya çadirê yan mekînên rawestiyayî û hema av dixwestin. Tasa avê ji destekî diket destekî din, diket bin simbêlên stûr, bi hawara lêvên qelişî û kezebên peritî dihat.

Seydo ber bi çadirê ve çû û ji ber roka xurt wî bi zorê ber xwe didît. Herdu çavên wî bûbûn wek du libên nîskê û di kortên xwe de çûbûn xwarê. Li ber wan çavan li ser axa bênderê çadira spî dibû mîna leylanê geh biçûk dibû, geh mezin dibû, geh nêzîk dibû, geh dûr diçû. Ew cara çendan bû wî av ji bîrê kişandibû ûbi kovika mezin berdabû bermîlan? Wî nema dihijmart. Av di ser bermîla dawî re çû û wî berê xwe da binê çadirê û li kêleka Elî rûnişt.

Di binê çadirê de keldûman bi hêrs ji dergîrkê çaydanê çayê derdiket û bêhna mirovan diçikand. Seydo tasek ava sar bi çemçikê ji den berda tasekê, pişta xwe da çewalekî birincê

û ew bi ser gewriya xwe dakir. Wî çavên xwe girtin û da nava karwana xewnên rojan, xeyalên xweşiyan. Wilo jî wî berê xwe da kîsê şekir û kulmek ji wî şekirê hûr berda tasa xwe. Paşê wî destê xwe direjî qutiyekê kir, ew vekir û biqasî kevçiyekî biçûk xwêya lêmûnê berda nava avê. Wî bi kevçiyekî li hev xist û li hev xist û dema şekir û xwêya lêmûnê di nav ava zelal de winda bû, wî tasa avê bi ser xwe dakir. Wî xwest di devê xwe de tama şekir û xwêya lêymûnê bidîta. Wî zimanê xwe di ser lêvên xwe re bir û tenê wî di devê xwe de tama axê dît.

Li derve rêza zekatxwazan li hêviya hatina Hecî ji şefeqê de dirêj bûbû. Piraniya wan rêwiyan kal bûn, wan bi destên kor û sêwiyan girtibûn û ji derên dûr û nêzîk ve peya an li ser pişta ker û bergîlan hatibûn. Sal bi xêr dixuya û genimê zerbûyî di navçeyê de digihaşt newqa mirovan. Mebesta dilê wan gişan çend tenekên genim bû. Wan pir hêvî dikirin û wê rojê destê xwe li ber asmanê sincirî vedikirin. Erê, hêviya wan xurt bû û baweriya wan bi xwedanê çadirê dihat. Wan ji xwe re xweş dikirin û digotin ku ew mirovê Xwedê dabûyê ê tiştek bida wan, dilê wan neşikenanda. Sal pir bi xêr bû û bi ser de jî xwediyê terektor û patozan hecî bû, bi deh caran çûbû mala Xwedê, destê xwe di ser Kevirê Reş re biribû û dema rê ketibûyê maç kiribû. Di zivistanê de baran qut nebûbû û reya di navbera gund û bajaran de hatibû birrîn. Piştî wê barana pir Xwedê buharek xweş bi ser navçeyê de kiribû û axa têr av serê gulegeniman ber bi ronahiya salek bi xêr ve kiribû.

Hêviya rêwiyan mezin bû, lê li ser wê axê, di bin wî asmanî de, piçek bayê hênik ji bo dermanan jî peyda nedibû. Roka ku gulegenimên tije ji bo gwîzanên makînên zaddirûnê û patosan amede dikirin di nîvê asmanan de rawstiyabû û hema

pêlên şewatan pêl li dû pêlê bi ser serê wan kesan dadiweşand û mêjiyê wan belav dikir.

Seydo pişta xwe dabû telîsekî, hayê wî nema ji tu tiştî hebû. Ew di serê xwe de anuha vegeriyabû nava zarokên gund, li kêleka golê bû. Gol li ber wî fireh bû, ew golek ji av û şekir bû. Seydo bîst sîh gavî jê dûr diket û heta ji wî dihat bi bazdan ber bi qeraxê ve dihat. Gol jî ber bi wî ve dihat û sînga xwe ya mişt bextewerî li ber wî pehn dikir. Seydo xwe davêt nav avê, destê xwe li binê golê dida, binê golê hemû şekir bû. Piştî panzdeh bîst gavan, wî serê xwe derdixist, li hevalên xwe bi kêfxweşî dinêrî. Hevalên wî jî bi kêf dixuyan, av û şekir vedixwarin, ji xwe re dilîstin. Paşê Seydo dibû firendeyek, başokeyek û di ser gola mezin re difiriya. Bi firê û bi zikekî têr ew gelekî dûr diçû, dûrî çadir û axa sincirî diket.

Seydo germa havînê û tenekên avê ji bîr kiribû û dabû dû karwana xewnên şêrîn dema ew li ser tevliheviya li derve ji nişkê ve bi ser hişê xwe ve hat. Ew ji nav pêlên hebirmêşî derket, vegeriya binê çadirê. Wî car din li kêleka Elîkê simbêlboq çogên xwe dan erdê. Tiştên ku her roj li ber çavên wî bûn hin bi hin xuyabûn, ciyên xwe girtin. Çaydanê çayê li ser paporê dicoşiya û qedehên camtenik di nav ava legana lastîkî de dirêjkirî bûn. Seydo ji ciyê xwe tenê serê çend kesan didît lê ji dengê rêwî û zekatxwaran wî nas kir ku trumbêlekê, navgînekê xwe li gund girtibû û belkî jî ew ya Hecî bû.

Dema Hecî di bin çadira xwe de rûdinişt, Seydo newerîbû bêhna xwe neberda, nebistanda. Wî dixwest carinan erd vebûya û wê ew daqurtanda, an bibûya mîna reşikê şevê û ji ber çavan winda bibûya. Piraniya caran wî tenê dixwest ji wê derê dûr biçûya, xwe bigihanda hevalên xwe. Bi wan re wî dikarîbû

hezar tişt bikirana, têketa nav ava golê, biçûya nava rez û bostanan, bêrîkên xwe mişt heshesûk bikirana, daf di newala çem de li ber kewzeran vedana.

Li derve, nîvkemiyonekê ewrek ji tozê bi dû xwe ve dikişand û berê xwe dabû çadirê. Zekatxwaz car din li ciyên xwe rûniştin ji ber ku her kesî trumbêla Hecî nas dikir. Kemiyon ji ser reya axê derket û pozê xwe ber bi çadirê ve kir. Ew li ber singekî rawestiya, bi hêrs di ciyê xwe de hejiya, toza spî ji ser canê xwe yê hesinî daweşand. Ewrê tozê jî bêdeng ji ser rê derket, bi ser gund de girt û li ser bênderê xwe li zekatxwazan pêçand.

Bi şaşika xwe ya kesk û zikê xwe yê mezin, şêx Hadî daket û bi lez berê xwe da hundirê çadirê. Mezin û biçûk ji ber wî rabûn û ber bi wî ve çûn û xwestin herin destê wî. Lê agir ji asmanan dibarî û şêx bi lez buhurî hundirê çadirê. Nîvro derbas bûbû û wî nedixwest nimêja wî li wî biçûya.

Elîkê nanpêj ji ciyê xwe bi lez rabû û xwe bi ser destê direêjkirî de xwar kir. Wî doşekek raxist û sê çar balgehên stûr danîn ser. Lê şêx Hadî guh li doşekê nekir û bi gotina pêşî wî berra nimêjê xwest. Wî bixwe ew li ser kulavekî raxist, berê xwe bi gora Pêxember li erda Erebistana siûdî ve kir û bi dengekî bilind got "Allahû ekber". Li derveyî çadirê rêwî bi lez ketin rêzê, rûyên xwe ber bi roka ji ciyê xwe nediliviya vekirin û yê nimêja nîvro kiribû jî ew dubare kir. Bêdengiyeke mezin xwe li bênderê pêçand her cara ku şêx di dilê xwe de, di ber xwe de xwend. Seydo di hundirê çadirê de çay di qorzîkekê de amede dikir. Di wê bêdengiyê de keldûmana bihêrs ji devê çaydên derdiket dikir firefir. Li derve ji newala çemê li kêleka bênderê, gundiyan kerên xwe girêdabûn ta neketana

nava genimên hişk û berî ku şêx nimêja xwe temam bikira yek ji wan keran bi dirêjayî ziriya.

Piştî nimêjê, şêx xwe li ser doşekê dirêj kir. Wî ciyê xwe xweş kir, anîşkên xwe di nermiya balgehan de çikandin. Wî tizbiyek dirêj ji bêrîka xwe derxist û di nav tiliyên spî û dagirtî de libên wê bi giranî dane dû hev.

Seydo qedeha çayê li ber şêx danî û bi paş ve vegeriya ta li ciyê xwe rûnişta. Şêx desmalka xwe di ser eniya xwe re bir, ew çend dilopên xwêdanê zuha kirin û li Seydo zîvirî taseke av xwest. Bayê di binê çadirê de ji ber agirê ku ji asmanan dibariya, ji ber paporê û keldûmana ava çayê giran bû, bîn li mirovan diçikand. Wilo jî piştî ku şêx du sê qurt vexwarin û riya xwe şil kir, wî ava mayî bi ser axa ber xwe de kir. Ax tî bû û wê di cî de ew av vexwar te digot ew ji hezarên salan li bendî wê bû. Tîbûna axê pir bala şêx kişand û wek ku dilê wî bi wê bişewitiya, wî tasek din xwest, axa ber xwe av da û bi dirêjayî lê nerî. Paşê berî ku hişê wî biçûya derine din, wî li Seydo û li Elî nêrî û got:

- Hûn ê bi qedrê navê Xwedê kin hinek av li vê axê bikin. Ji wexmê bêhna mirovan der nakeve.

Elîko ji ciyê xwe pengizî, lê hat bîra wî ku ew karê hanê yê berdestê wî bû û wilo jî ew bi ser Seydo de rabû:

- Erê Seydo ma tu hinekî xwe nalivînî axa binê çadirê avnadî? Hecî jî wextî bê.

Ji ser doşekê, şêx saetek bêrîkan ji ber sînga xwe derxist, lê nêrî û di serê xwe de hesabine kirin. Rast bû, Hecî jî ê dirêj nekira. Li gor saetê ew li ser rê bû û piştî çarîkekê çend deqe kêm zêde gerek li wê derê bûya.

Seydo derket û berê xwe da bermîlên avê. Wî satilek tije

kir û vegeriya binê çadirê. Di wê navberê de şêx tas ji destê wî girt, tizbiya xwe danî ser doşekê û bi xwe axa binê çadirê avreşandî kir. Wî bi destekî çaya xwe bi giranî vexwar û bi destê din wî tîhna axê şikenand. Dema dîsa rêwî rabûn ser xwe û bang hev kirin, wî li saeta xwe dîsa nêrî û tas dirêjî destê Seydo kir. Axê têra xwe vexwaribû.

Trumbêla Hecî kêleka kemiyona şêx Hadî rawestiya û Hecî bi lez jê peya bû û bi rûyekî tirş li kesên ber devê çadirê rêz bûbûn nêrî. Ew û şêx çûn rûyên hev û bê ku wî li ber xwe bineriya, ew wek her car bi ser serê Seydo de qîriya:

- Agir ji asınanan dibare. De rabe Seydo hinek av li vê axê bik!

Paşê dema wî dît ku binê çadirê xweş hatibû avdan, wî gotina xwe guherand:

- Lê ne anuha, paşê paşê.

Wî destê xwe danî ser milê şêx û got:

- Bubure şêxê min ez hinekî dereng hatim. Karekî me li bajêr çêbû, lê tu bi xêr hatiyî.

Hecî û mêhvanê xwe peyivîn û piraniya caran di nav xwe de kirin kurtepist wek ku tiştine pir giring ji hev re digotin. Piştî nîv saetekê, Hecî serê xwe di deriyê çadirê re derxist û bang barkêşekî kir:

- Heseno, rabe deh çewal genim bavêje paşiya kemiyona şêx!

Di bin siya terektorê mêrikekî xwe dirêj kiribû û li ser dengê Hecî rabû ser xwe. Germê ew gêj kiribû û piştî çend kêlîkan ew bi ser hişê xwe hat. Paşê şêx rabû ser xwe, karê xwe û çûyînê kir. Ew ê li wan hemû gundan bigeriya, zekat bida hev, bereketa Xwedê bi ser xwedanên terektor û patosan de biba-

randa. Wî ê Quran li ser ruhê bav û kalên wan bixwenda, ji Xwedê bixwesta ew li wan were rehmetê, di gunehên wan bibuhure. Bi rabûna wî re, Hecî jî ra bû ser xwe û bi wî re ta ber kemiyonê çû. Li wir çend gotinên wan mabûn lê ne şêx ne Hecî ne xwestin di bin agirê wî asmanî de dirêj bikirana. Wan ê hevudu li bajêr bidîtana, ecele tunebû.

Hecî dîsa bi rûyekî tirş derbasî binê çadirê bû. Wî çixarak vêxist. Elîko çay li ber danî û serê xwe xist ber xwe. Wî nizanîbû ê çawa dest bi axiftinê bikira. Her ku Hecî dihat, wî pirsa tiştên di bin çadirê de û li ser erdan dikir û Elîko ta bi derziyê ve dikir, agahiyên xweş dirêj dikir, bi lez di ser ên ne xweş diçû, te digot wan zimanê wî dişewitandin. Wê rojê di destê şefeqê de, hesinekî patosekê ji nav her pênc patosên Hecî şikestibû. Şufêrê wê şandibû dû Wanêsyan, hosteyê ermenî û bi hev re paşê çûn bajarê Qamişlo û hesinekî nû kirîbûn. Di wê rojê de, patos nêzîkî sê çar saetan di nav zadan de bê kar mabû.

Elîko gerek ev nûçe bigihanda Hecî lê çawa? Bi çi zimanî? Wî ceger nedikir. Dema ew wilo bêdeng ma, Hecî lê nêrî û têderxist ku tiştekî ne xweş qewimîbû. Di wê navberê de kalek derbasî binê çadirê bû. Wî çewalekî pînekirî avêtibû ser milê xwe. Barê salan û nîşanên zîvariyê xêzine kwîr di rûyê wî de vedabûn. Çavên wî di kortên xwe de çûbûn xwarê û ji ber ku ew demeke dirêj di bin roka rojê de mabû, ji xwe ew çav bi zorê dihatin xuya kirin. Hecî çaya xwe bi bêhntengiyek diyar vedixwar û hema li hêviya Elî bû ku wî ji ber xwe ve dest pê bikira. Elîko zimanê xwe di devê xwe de digerrand û ji nişkê ve devê wî geriya. Bi dengekî bi tirs got:

- Hecî bila bêhna te teng nebe. Her tişt xweş derbas dibe.

Tenê di destê sibehê de patosek hinekî rawestiya. Hesinekî wê ez bawer dikim şikestibû. Hoste Wanêsyan çû ji Qamişlê hesinekî nû xist şûnê. Ji bilî vê yekê her tişt li gor dilê te derbas dibe.

Elîko piştî van gotinan xwe bi ser hev de guvaşt û simbêlên wî bi ser devê wî de xwar bûn. Wî Hecî ji mêj ve nas kir, dizanîbû çawa dibû dema agahiyek wilo di nîvê mewsimê geniman de dibihîst. Yê kal bêguman guhgiran bû û hêna gotinên xwe berdidomandin, ji Xwedê dixwest ku wî mala Hecî avatir bikira, malê wî pirtir bikira ta xêra wî bigihaşta her kesî. Hoste Wanêsyan ne li wir bû û Hecî dizanîbû çawa ew li bajêr peyda bikira. Wî çaya xwe temam nekir û bi ser kalê li hember xwe de qîriya:

- Tu ê bigihêjî teneka genimê xwe lê anuha ne wextê tey e.

Wî bi lez berê xwe da trumbêla spî. Wî pozê wê ji ser benderê derxist, ber bi reya bajêr kir û pê li benzînê kir. Trumbêl ne wek kevokekê lê wek gulla ji lûla tufengê derkeve ew wilo ji ser benderê derket. Piştî çend kêlîkan ew ji ber çavan ket. Mirovê kal ji binê çadirê derket, vegeriya nava rêwiyan, çewalê vala li ser axê raxist û li hêviya vegera Hecî rûnişt. Ew ê bigihaşta tenga xwe, Hecî bi devê xwe ev yek gotibû.

Seydo li ciyê xwe dixwest bigiriya lê hêsirên wî nedihatin xwarê, di nava palikên çavên wî de asê bûbûn. Wî li erda binê çadirê dinêrî û dihat ji qehra nava xwe biteqiya. Dilê wî ji binî ve nema diçû tasek av û şekir û anuha diçû mirinê, diçû kuştinê. Wî dixwest her kes li dora xwe bikuşta, bi taybetî ew kesên ew ava wî bi zehmetî dikişand bi ser axê de dikirin. Wî dixwest paşê xwe bikuşta ta ji wê jiyana pîs xilas bibûya. Wî bihîstibû ku dema zarok dimirin ew dibin teyrikên buhuştê û

ji ber sivikbûna gunehên xwe difirin û kêf dikin. Wî di serê xwe de digot ku ji bilî ketina nav rez û bostanan, ji bilî kuştina beqan wî tu guneh nekiribûn. Ew wilo bû dilê xwe bi buhiştê xweş dikir dema Elîko bi milê wî girt û ew hejand:

- Seydo, layê kerê, ma deng nayê te? Ev cara sisiyan e ez ban te dikim. Rabe firaxan bişo, doşekê bavêje ser kulînê, hinek av li binê çadirê bike!

Trumbêla Hecî û kemiyona şêx ji ser benderê rabûbûn û ji ber çavan ketibûn. Li derve, zekatxwazan nedixwestin ji ciyê xwe biliviyana. Ew li hêviya vegera Hecî man. Sal bi xêr bû û gulegenimên navçeyê digihaştin kemera bejindirêjan. Sal pir xweş bû û wan di dilê xwe de, di nav xwe de digotin ku Hecî mirovekî rind û dilovan bû. Wî ê ji bo xêra ê û bavê xwe çend tenekên genim bidana. Wan tu çewalên genim nedixwestin, tenê du sê teneke, du sê tenekên baş dagirtî dixwestin û baweriya wan bi Hecî xurt bû. Sal bi xêr bû, gelekî bi xêr bû.

# TEVGEREKE BÊRÛMET

R... bi du sê hevalan re li kêleka cadeya herî mezin ji xwe re digeriya, dema dengekî wek dengê guregura ewran xwe li bajêr girt û bêhna wî himekî teng kir. Di destpêkê de, deng bixwe pir qels bû û wî guh lê nekir. Wî ji xwe re got ku buhara nû hatibû, dikarîbû tavên xwe, boranên xwe jî bi xwe re bianina. Baxçeyê "Gulistana Canan " xwe di nav rengên corbercor de vezilandibû. Di nav şîşên hesinî re surrên bê hênikayî û bêhna gul û kulîlkan li ser baskên xwe dikirin û ew bêhna xweş li hemû bajêr belav dikirin. Hechecîkên dûvmeqesî ne ji mêj ve ji welatên germ hatibûn û li ser rûyê asmanê şîn xêzikine reş û li hevhatî bi lawendî çêdikirin. R... jî ne ji mêj ve wek hechecîkekê vegeriyabû û dixwest bi malbata xwe re çend rojên xweş derbas bikirana. Wî salê gişî li Parîsê, ser-

bajarê Fransayê kar dikir û her buhar ew bi jin û zarokên xwe re vedigeriya û dûrî tevliheviya cîhana bi xirecir wî çend rojên xweş li şehrê zaroktiya xwe derbas dikirin.

Ew wê rojê derketibû seyranê û nêrînên wî di nava şîşên hesinî re dibuhurîn baxçe. Serok ji mêj ve dergehên "Gulistana Canan" girtibûn û ji ber vî tiştî jî şêniyên bajêr dikarîbûn tenê ji dûr ve dilê xwe bi hatina buharê şad bikirana. R...erê hundirê baxçe nedidît lê dizanîbû ew çawa bû. Wî dikarîbû çavên xwe bigirtana û yek bi yek rêyên teng bi daran xemilandî bi bîra xwe bianiya. Dema ew zaro bû û diçû dibistanê, riya wî di nav baxçe re dibuhurî. Wê çaxê, deriyên baxçe ji her kesî re vekirîbûn, nemaze ji bo xort û keçên dilê wan di hev de hebûn. Piştî hatina Serok û şikestina bajêr, deriyên baxçe car din demekê vekirî man. Lê leşkerên biyanî çend guhertin tê de çêkirin. Wan di navbera her çend daran de peykerek ji bo serokên xwe danîn. Her deh duwanzdeh gavan, wan çend darên biyokan an gwîzan ji qurm ve rakirin û di şûna wan de peykerekî Serok mîna dareke hesinî çikandin. Wan Mala Ferhenga Gel jî helweşandin û li ser bingehên kevnare qesrek pir mezin ji bo Serok ava kirin. Ew qesr wê roja buharê di nav daran de carinan jî ji R... re xuya dibû. Di nîvê reya ku ber bi qesrê ve diçû, leşkerên bi rext û tufengên xwekar herdem şipiya bûn û bi rûyine tal li bajêr dinerîn lûlên çekên xwe ber bi sînga rûniştivanan ve dikirin.

Dengê weke guregura ewran hema nêzîk bû û R... ji ber nema karîbû bi xweşî nêrînên xwe li ser baxçeyê rengareng bigeranda. Wî xwest bizanîbûya ew deng dengê çi bû, lê dema wî kir ku ji wan du sê hevalan bipirsiya, wî xwe bi tenha serê xwe dît. Heval di nav kolanên bajarê kevn de ji ber çavan

ketin te digot qey erd qelişî bû û wê ew daqurtandibûn. R... ji wan bêhnteng bû ji ber ku bi kêmanî wan dikarîbûn tiştek jê re bigotana, agahiyek li ber guhên wî bixistana. Mala wî ji wê derê ne pir dûr bû û wî berê xwe dayê lê ji nişkê ve ew reya fireh mişt mirov bû û di rûyê wî de hat girtin. Raperînê, serîhildanê bi dengekî mîna guregura ewran xwe li ciyê Serok girtibû. Buhar bû û gel dixwest agirê roja nû, agirê Newrozê, di meydanê de di dilê bajêr de pêxista.

Di wê gavê de, R... xwest bibûya hechecîkek û bi asmanan biketa an jî bibûya reşkekî şevê û di jêra zêmînê de biçûya xwarê û winda bibûya. Lê ew ne bû hechecîk, ne jî bû reşkê şevê û wilo jî bêçare di wê navberê de ma. Li aliyekî wî, leşkerên biyanî milên xwe didan hev, paşûber diçûn û li aliyê din, gelê bajêr ber bi wî ve dihat, dixwest agirê cejnê, pêtên şewatê bi ber perên asmanan bilind bikirana. Di wê gavê de, R...têgihaşt ku eger ew di rûyê lehiya şêniyan de rawestiya, ew ê li ber lingan av û av biçûya. Ji ber vê yekê, dema pêlên rikê nêzîkayî li wî kirin, wî xwe avêt nav wan û ew jî ber bi avahiya bilind ve çû.

Di nav wan salên dawîn de, tişt pir tevlihev bûbûn û guhertinên mezin di navçeyê de çêbûbûn. Hayê R... pir ji wan tiştan tunebû ji ber wî guh li guhertinan nedikir û paşê, ew li derveyî welêt dijiya. Ew li Ewropayê bi cî û war bûbû. Wî ji xwe re jineke ji welêt anîbû, karekî baş bi dest xistibû û dixwest jiyana xwe giş wilo bê serêş û bê teşqele bibuhuranda. Lê wê rojê wî bixwesta nexwesta ew ketibû nava bûyeran, geremolên guhertinan. Ji roja roj de, wî dizanîbû çawa di tengasiyan de xwe mîna mûkî ji nav hevîr bikişanda, çawa xwe dûrî tevgerên xeternak bikira, wî dizanîbû çawa xwe ji belan

bikirîya. Wî ev tişt dikirin bê ku bêhna kesekî ji xwe teng bikira an jî ji xwe re dijmin çê bikirana. Wilo jî, tevî ku bûyer tevlihev bûbûn û qîrîn ji her derê dipijiqî, R... di wê firtoneyê de li tiştan car din bi dûrbînî nêrî. Wî xwe di nava pêlên serîhildanê de sist kir wek ku dema ew diket nav ava çeman û rastî gerînokekê dihat. Ew ber bi meydana mezin ve meşiya û li çarekê geriya.

Meydan gelekî hatibû guhertin. Bi hatina xwe re leşkerên Serok ew meydan gişt kirin sêdar. Wan her kesê di rûyê wan de rawestiya bi wan sêdaran ve kirin û pir xwîn rijandin. Kesên li ber xwe dabûn, xwestibûn bajêr biparêzin perçe perçe bûbûn, hestiyên wan di zindanên kor de riziya bûn an jî xwe li çiyayên bilind girtibûn, li hêviya rojekê bûn, li bendî guregura boranên guhertinan bûn. R... li meydanê nêrî û tevî ku bajar gişt li hev ketibû, hat bîra wî ku çawa berê ew tev dar û hişînkahî bû. Piştî wan salan darek çi ye lê tunebû. Di navenda wê de, pûtekî Serok pir mezin hebû. Serok herdem bi kincên leşkerî bi rûyekî tirş û bi pozbilindî li kesên li ber nigên xwe dinêrî û destê xwe ber bi bajêr ve dikir.

Di nava serîhildanê de kesekî destvala tunebû. Leşkerên Serok çek di nav malan de nehiştibûn lê her yekî rahiştibû tiştekî. Zarokan bêrîkên xwe tije kevir kiribûn û wan ew peyker ji xwe re kiribûn nîşan. Di navenda meydanê de, li ser payekî ji çimentoya têr hesinî, serê peyker wek çiyayekî bilind bû û bi ser serê darên bexçeyê nêzîk diket. Herdem bi cil û bergên leşkeran, wî mirovê hesinî kesên li ber nigên xwe pir biçûk didît û destê xwe herdem ber bi navenda bajêr ve dikir.

Di wê meydanê de gelek kesên bajêr hatibûn bi dar vekirin û yê pêşî serokê komarê bû. Dîtina heykelê wî Serokê li wê

derê hişt ku pêlên bîranînan li hev bikevin. Lêvên birînên kevn ji nû vebûn û xwîn di damaran de bêtir keliya, bi hêrs coşiya. Çend mirovan ji kerba nava xwe êrîşî payê peyker kirin. Ew hatibûn agirê Roja Nû di nava bajêr de bilind bikin û wan ji şewata nava xwe xwestin peyker bixînin. R... pewîst dît ku ew dûrî wan serêş û teşqelan bima. Piştî deh rojan ew ê li balefira xwe siwar bibûya û li Parîsê car din dest bi karê xwe bikira û zarokên wî jî ê biçûna dersxanên xwe. Wî ji xwe re got ku karê wan şêniyan karê dînan bû ji ber ku wî nikarîbû bawer bikira ku hêzekê ê bikaribûya ew peyker ji ciyê wî bilivanda. Paşê wan dikarîbûn agirê xwe li dereke din hilor bikirana, ma nedibû illeh li wê meydanê bûya? Riqê bêguman hêz deh qat, sed qat dikirin û ji ber vê yekê ji nişkê ve peyker ji ciyê xwe liviya û bû qirçeqirça hesinên wî. Qelşek dirêj di stûnê çimentoyê de vebû. Di wê firtonê de, çavên R... li komek nûnerên welatên dûr, şandeyên kovar û rojnaman û perpirsiyarên televîziyonên biyanî ketin. Wan di goşeyekê de dinerîn û berê kamêreyên xwe geh ber bi qesrê ve dikirin, geh dibirin nava gel. R...xwe wek ewropayikî didît û di wê coşê de wî dizanîbû ku tiştek bi wî nedihat. Rê hemû hatibûn girtin lê ew ê bi saya biyaniyan û wan nûnêran vebûya û wî ê xwe bigihanda malê û paşê dûrtir biçûya.

Di wê roja buharê de, pir xwîn rijiya, zarok di bin botên leşkeran de perçiqîn û zikê jinan bi singoyên tufengan hatin qelaştin. R... ew yek nedît û ne dixwest bidîta. Berî ku leşkerên Serok bi cebirxanên mezin bihatana û hawîrdora qesrê bigirtana, serbazekî mezin bi kincine xweşik û bi devekî bi ken ber bi wan ve hat. Wî bi du sê çar zimanên awropayî dizanîbû û got ku ew giş bi xêr hatibûn, ser seran û ser çavan

hatibûn. Wî got ku tişt hinekî ji ber hovîtiya şêniyên bajêr tevlihev bûbûn û ji ber vê yekê nedibû ew li wê derê bimana. Eger tiştek bi yekî ji wan bihata, tiliya yekî ji wan xwîn bibûya, Serok ê pir li ber biketa, kirasê xwe yê hesinî biçiranda. Paşê, eger wan agahî dixwestin, rastî li ser rewşa wê navê dixwestin, ji xwe Serok bixwe dikarîbû hemû rastî ji wan re bigota. Piştî wan gotinan, wî destê xwe ber bi avahiyekê ve kir û ew gişt vexwandin ser masa Serok.

R... li dû serbazê Serok buhûrî eywaneke gelekî fireh, eywaneke lihevhatî û xweş raxistî. Li bajêr nan çi ye bi hêsanî peyda nedibû lê li ser maseyên mezin xwarin û vexwarin hatibû rêzkirin û hemû çeşîtên mêweyên xweş li ser wan hatibûn danîn. Serok nedixuya û belkî ji tirsa nava xwe xwe di binê zemînê de veşartibû. Di zikê eywanê de mirovekî kin û dagirtî bi dengekî bilind peline dixwendin. Wî ji bo her kesî û nemaze ji bo nûner û rojnamevanên biyanî re kar û pêkanînên Serok di nav wan salan de rêz dikir. R... hinekî guhdarî kir û paşê wî çavên xwe li dora xwe gerandin û li kesên rûniştî temaşa kir. Tîşt li ber çavên wî wek di xewnên pirtirs û sawîr de xuya bûn. Wî dît ku her kesî serê xwe xistibû ber xwe û wek dewarên ku êmê xwe bixwin û kayîna xwe bikin wan kesan hema gepên xwe dicûtin, bi xemgînî li sênî û ferfûrên mişt xwarin dinêrîn. Kesî guhdarî pêkanînên Serok nedikir ji ber ku bêguman ew serfiraziyên hanê bi hezarên caran hatibûn gîsinkirin û hatibûn ezberkirin. R... di wê gavê de bawer kir ku wan mêvanên rûniştî goştê şênîyên bajêr dixwarin û li ser masan dest, ser û rehnên mirovan dirêj bûn û di nava dohnê xwe de keldûman bi wan diket. Her ku yekî diranê xwe di goşt de diçikand qajîniyeke kerr li ber guhê R... peyda dibû.

Bi wê yekê dilê wî li hev ket û bi lez berê xwe da destşokê.

Mirovê ku pesnê karîn û pêkanînên Serok dida hêna lîsta xwe dixwend û yê ku jê bawer bikira wê bigota tenê rakirina miriyan ji gorên wan ji Serokê mezin kêm ma bû. R... nema guhdarî dikir ji ber ku wî di wê navê de deriyek dît û nas kir ew ji bo derketinê bû. Derî nizim û teng bû û R... pişta xwe xûz kir û derket. Wî berê xwe bi lezek mezin da malê. Roja din wî çenteyên xwe dane hev û zîvirî Ewropayê.Wî dilê xwe helbet bi buhara bajêr şad nekir lê wî ew hefteya mayî li ber peravê li başûrî Fransayê derbas kir.

R... xwe nas dikir û dizanîbû ku heyvanê mêraniyê di nava wî de tunebû. Ew nehatibû ser rûyê dunyayê ta agirê şoreşan pêxista, an ew agir xurtir bikira, an jî guhertine mezin di nava tiştên jiyanê de saz bikira. Erê eger ew li ser dûvê xwe rûnişta kesî ê gazinên pir mezin jê nekirana. Lê belê, piştî ku ew zîvirî mala xwe, karê xwe û zarokên wî car dim çûn dibistanê, ew bi tevgerekê rabû. Wî xwest dûvekî mezin bi dû serîhildanê vekira, lê wî ceger nekir û ji ber ku ew dûrbîn bû, wî dizanîbû ku belkî rojekê serîhildan biserketa û ew yek di serê wî de biteqiya. Ji ber vê yekê wî ne biqencî, ne bi napakî li ser axifî. Wî got çi ye ne çi ye bîr û ramanên wî û yên kesên dabûn pêşiya serîhildanê di derinan de ji hev dûr diketin. Wî dizanîbû ku ew ne xwedî tu bîr û bawerî bû, lê ew yek li Ewropayê tiştekî hêsan bû. Wî çend hevalên wek xwe li dora xwe civandin, bi wan re li malan an di çayxanên pir ên bajêr de rûnişt. Wî bernameyek ji rêxistina xwe re danî û paşê tiştê herî giring, wî gazî çend rêxistmên nîvsiyasî, nîvmirovayî kir. Wî xwe gihand partiyên ku çavên xwe ji bo rojên helbijartinan berdidan dengên biyaniyan. Wî bi çend kesên wek xwe re belavok derxistin

lê tu kesî rojekê jî ew belavokên hanê nedîtin.

Piştî vê tevgerê R... dev ji karê xwe berda. Karê wî wek hemû karan bû lê wî nema xwest wek her kesî bima. Wî reya xwe peyda kir û ciyê xwe di nava civakek nû de dît. Carekê an du caran jî ew derket ser televîziyonê û tevî ku bi dirêjayî peyivî kesekî nizanibû ne wî çi dixwest bigota, ne wî doza çi dikir.

# ÇEND WÊNE JI JIYANEKE PÎS

**Wêneya pêşîn**

Sêla rokê hêna bi giştî ji Rojhilatê derneketibû dema çavên du sê pasebanan li çend pitikên reş ketin. Wan pitikan bala wan kişandin ji ber ku ji dera ew derdiketin herdem mirin û malwêranî dihatin. Paseban û dergevan û leşkerên newbetdar bang hev kirin, hilkişiyan ser bircên bajêr û bi bêhntengiyek diyar xwe ragirtin. Pitikên reş menzintir bûn, pirtir bûn, te digot ji asmanan dibariyan, ji zikê zemînê derdiketin. Kesên ser dîwaran piştî bêhntengiyê hêrs bûn ji ber ku wan nas kirin ku dijminan car din mirina wan dixwestin, nebedîkirina bajêr dîsa ji xwe re kiribûn daxwazî û armanc. Dema roka wê roja buharê ket zikê asmên, leşkerên dijmin ji ser dîwarên kelehê hatin xuyakirin. Wan mîna merşekî reş, mîna

şevek bê serî û bê binî xwe li kelehê girtibûn. Di danê êvarê de, siwarên li ser pişta hesp û fîl û devan peya bûn. Bergîl û kerên wan bi zehmetiyek mezin di bin cebirxanên şûr û riman de diliviyan. Al û beyreqên reş li ber dîwarên kelehê li hev ketin û bû şerqeşerqa wan li ber bayê hovîtiyê.

Di hundirê kelehê de şêniyên bajêr xwe ji destpêka rojê de bi lez û bez amede dikirin. Wan şûr û xencerên xwe tûj dikirin û li gor hêza zendan tîr û kevanên xwe di nav xwe de bi hev re diguherandin. Di bin tîrên roka rojê de şewqa çekên hesinî ên nû hatibûn tûjkirin li bin guhên dîwarên bilind diket, vedigeriya û çavên mirovan kor dikir, awir dibirrî. Şêniyan, rûneştevanên bajêr xwe ji bo şerekî dijwar û bêguman direj amede dikirin. Leşkerên wî dijminî bi hovîtiya xwe di hemû dunyayê de bi navûdeng bûn. Dengbêjan di stiran û çîrokên xwe de herdem bi napakî, bi xerabî li ser wan diaxiftin û digotin ku axa ew leşkerên mîna ewrên kulliyan di ser re dimeşiya tucarî nema giha lê şîn dihat. Wî dijminî wê rojê bîra rijandina xwînê kiribû, dixwest dunya bi tevayiya xwe bikira qurtek av, gepek nan, wêran bikira.

Remo jî wek her kesî çû û hat, geh hilkişiya ser dîwaran û li hêzên reş nêrî, geh daket û ji ber dergehekê çû ber dergeheke din. Di danê êvarê de, wî berê xwe da malê û xwest xwe veşarta, canê xwe ji mirinek ne pir dûr biparasta. Dema ew derbasî hundirê malê bû, destê kevaniya wî Gulê di nav teşta hevîr de bû. Gulê serê xwe bilind kir, lê nêrî û bi wî re bişirî. Paşê wê hinek av li hevîrê xwe kir û car din hemû giraniya xwe berda ser teştê. Erê, bajar ê li ber xwe bida, tiştê jê bihata û nehata ê bikira, ew ê di rûyê dijmin de rawestiya. Parastina kelehê ne tenê karê mêran bû. Jinan jî radihiştin çekan an

nan û xwarina cengaweran amede dikirin, hîzarên kevn perçe perçe dikirin, ji bo girêdan û dermankirina dev û lêvên birînan av dikelandin. Gulê ne ji mêj ve bûbû kevaniya mala Remo û ew cara yekem bû ku wê di mala mêrê xwe de ji bo şer hevîr dikir û karê xwe û çend tenûrên nanî dikir.

Hewa di hundirê malê de giran bû, nediliviya. Xwêdanek sar û demûşî ji eniya Remo dihat xwarê û bîna wî hema diçikiya. Wê rojê ew ji desthilanîn ketibû û wî dixwest xwe li paş kulînê an li devereke din veşarta. Di hundirê malê de ew çû û hat û bêhntengiya wî hema zêde bû. Leşkerên dijmin di destê sibeha roja din de ê bêguman êrîşên xwe bi menceniqan dest pê bikirana, paşê ê bi beştên mezin gurmînî ji dîwar û deriyên bajêr bianîna. Wan ê reyek peyda bikirana, wan ê bajar têxistana bin destên xwe, mal talan bikirana, bi zorê bi jinan bikirana. Remo di hundir de çû û hat û piştî çend kêlîkan nas kir ku debara wî di malê de nedibû û gerek bû li çarak din bigeriya. Wî li Gulê nêrî û tenê wê gavê pişta wê ya pehn û paşiya wê ya dagirtî ji wî re hat xuyakirin. Gulê pêşmalka xwe li nava xwe ya zirav girêdabû û bi hêrs hemû giraniya laşê xwe yê lihevhatî berdida ser destên xwe. Hayê wê ji tiştekî nebû û wê hevîrê xwe distra. Remo li paşiya giran ya bi strandina hevîr hema diliviya nêrî û ta di wê dema dijwar de dilê wî bibijya wê. Wî xwest destê wê ji nav hevîr derxista û berê wê bida nava ciyan an jî hema di wê navê de ew zeft bikira û xwe berda nava hêtên stûr. Lê wî ji xwe re got ku wext bê hawe zû derbas dibû û gav ne gava wê yekê bû. Wî gerek reya xwe peyda bikira û deqe berî deqê zû dûr biketa. Di wê gavê de Gulê serê xwe rakir û car din bi ken li mêrê xwe nêrî. Wê dît ku rûyê wî mîna quşûfê zer bûbû lê rûyê hemû mirovan di demên

cengê de tên guhertin. Wê bawer kir ku Remo tiştek li malê ji bîr kiribû, vegeriyabû û paşê ew ê car din tev li hêzên li ser dîwaran bibûya. Wê wilo bawer kir lê wê rojê Remo tu tişt ji bîr nekiribû. Wî kevaniya xwe ya ciwan, mala xwe, namûsa xwe, bajarê xwe li dû xwe ve ji bona parastina canê xwe ji neyaran re hişt. Dijmin dizanîbû ku li her bajarê dixist bin destê xwe, hemû şêniyên wî ne qehreman û dilêr bûn. Wî bîra kesên wek Remo dibir û ji qazî ve dora hemû bajêr tucarî nedigirt, reya revê vekirî dihişt û barê xwe bi wî awayî sivik dikir. Remo jî wek gelek kesên din reya xwe nas kir û berê xwe da bakurî bajêr. Ew di qulekê di binê dîwêr de derket. Wî gavên mezin avêtin û ji binî ve li paş xwe nezîvirî û berê xwe da daristanê. Di danê êvarê de, berî ku rojek bi gihiştî biçûya ava, dergevanek li ser dîwarê bakur çav li wî ket. Remo li ber çavên wî biçûk bû, bû wek pitikekê û di nava daristana reş de winda bû, ji ber çavan ket.

Li ser dîwaran, di nav kolanên bajêr de, rûniştevan mîna ava li ser agirekî xurt dicoşiyan. Wan bi dengekî bilind hema nav di hev de didan, bang hev dikirin, salixdanên mêraniyên çend şerên berê didan. Şirqeşirqa çekên wan dîwarên kelehê dihejand û li hemû tarên bajêr belav dibû. Li bendî roja din kêm çav ketin ser hev û xewê ji wê derê bar kir. Zarokên di dergûşan de an li ser sîngên diyên xwe kirin carecar lê kesekî nikarîbû ew haş bikirana. Di spîdeya roja din de dijminan ê êrîşên xwe berdana û mirinê ê tapana xwe têxista destê xwe û laş li ser rûyê erdê dirêj bikirana. Cengaweran ê li ber xwe bidana û xwîna xwe ji bo parastina bajarê kevn birijandana. Berî destpêka cengê, ew çûn rûyên hev, diyên wan serên wan ber bi sîngên xwe ve kişandin û şîrê xwe li wan helal kirin.

Bav çûn rûyên zarokên xwe û bi xemgînî li jinên xwe nêrîn. Mirinê li hêviya destê rojê tapana xwe tûj kir. Wê aleya xwînxwariyê wek cawekî reş û fireh vekir û darê wê di sînga navçeyê de çikand.

Paşê gelek xwîn rijiya û gelek hêvî û bawerî di pêçekên xwe de qurmiçîn. Destpêka buharê bû û gelek gul li ser darên xwe hişk bûn bê ku wextê kesekî hebûya ew bîhn bikirana, an diyarî kesekî bikirana.

*

**Wêneya duyem**

Dema Remo vegeriya, nêzîkî salekê di wê navberê re derbas bûbû. Leşkerên dijmin erê keleh xistibûn bin destên xwe lê belê roj bi roj zora wan diçû û agirê şer herdem gûr û dijwar bû. Têkoşeran êrîşên xwe ji hundir û ji dervê pir dikirin û hin bi hin berxwedanê reya xwe didît û bi ser diket. Mirin û şîniyê konek bi hev re di navçeyê de vegirtibûn û cih ne di goristanên kevn de ne di yên nû de mabû. Ertêşa biyanî dizanîbû ku şikestin û derketina wê nêzîk bûbû û wê nema miriyên xwe binax dikirin û hema ew dişewitandin. Ji ber laşên kizirî, bêhna genî ji ser bajêr ranedibû û balendeyên beratan li ser dîwarên li dora bajêr xwe datanîn û baskên xwe ên wek depên deriyan fireh vedikirin, ji xwarina goştê pir bûbûn wek dermalan û bi zorê difiriyan.

Remo ne cengawerek bû vegeriya bû lê reya vegerê li ber her kesî vebûbû. Paşê wî dizanîbû ku tirsek wilo mezin li ser jiyana wî tunebû. Di danê êvarekê de ew nêzîkî dîwarên nîvketî bû. Dema rok li pişt asoyê sor winda bû, heyvek pîsik serê xwe bilind kir û berê xwe ber bi sînga asmanekî çikî sayî ve

kir. Tarîtiyê hêna perda xwe bi ser bajêr de nekiribû, lê hin bi hin ciyê xwe çêdikir û şûna ronahî û germa rojê digirt. Remo derbasî nava bajarê wêranbûyî bû, xwe li pişt dîwarekî veşart û guhên xwe mîna roviyekî miç kir. Di nava wan mehan de pir tişt hatibûn guhertin. Sînorên di navbera jinê û mirinê de mîna pelên pîvazê pir tenik bûbûn. Piraniya avahiyan hatibûn xwarê û kêm kerpîç li ser hev mabûn. Remo li bajêr guhdarî kir û dengê wan leşkeran gihaşt guhên wî. Ew diçûn û dihatin, bi zimanê xwe dipeyivîn û dengê botên wan ên giran di nav tamarên mezin ên bajêr de her gav dikirin qurpequrp.

Remo xwe ji dîwarekî avêt ber dîwarekî, ji qulekê ket qulek din ta ket tarê. Ew nêzîkî malê bû û xwe di ser dîwarê hewşê re avêt. Ji ber ku hemû çirên malê pêketîbûn û dengine dihatin, wî berê xwe seraser da axurê çêlekê. Wî ji xwe nepirsî çawa di wan rojên dijwar de, di wê firtoneyê de mirovan dikarîbûn ji malên xwe derketana û bihatana serlêdana wan. Dilê wî di nav parsûyên sîngê de lêda û xwêdana sar û demûşî carek din ji eniya wî hat xwarê. Ew bi mehan dûrî malê mabû û anuha jî dikarîbû di wî axurî de demekê xwe ragirta. Wî li dora xwe mêze kir û nizanîbû çêleka wan bi kuderê çûbû. Kesekî di wî şerî de çeleka xwe nedibir garanê û çeleka wan gerek li ciyê xwe bûya di wî axurî de bûya. Wî ji xwe re got ku mal û nemaze di demên şer de bê şîr û bê mast nedibû. Wî xwest ji Gulê paşê bipirsiya ka çi bi serê wê çelekê hatibû. Di qelşên derî re wî li xaniyê malê nêrî û li hêviyê ma ku mêhvanên wan biçûna û Gulê çira vemiranda.

Di axurê çêlekê de hinekî bêhna wî hate ber wî. Paşê hat bîra wî ku dema wî berê xwe da tara xwe, tiştekî bala wî kişandibû û anuha dikarîbû lê vegeriya. Erê wî dît ku piraniya

xaniyan ketibûn, an bêxwedî mabûn, tenê mala wî wek xwe ma bû û dengê kesan bilind jê dihat. Piştî wan mehên pir, te digot wê malê nizanîbû şer heye an tuneye û dengê stran û mûzîkê qube jê dihat. Remo kir nekir bersiva wê yekê nedît. Wî ji xwe re got ku piştî rabûna mêvanan wî ê ji kevaniya xwe bipirsiya.

Piştî demekê, hêna ew di wî axurî de bû, çend leşkeran berên xwe dan malê û bê ku li derî xistana, hema derbas bûn. Remo di cî de bawer kir ku ew hatibûn li wî digeriyan û wilo jî bêtir di ciyê xwe de lerizî, xwêdana wî bêtir bi ser canê wî de herikî. Wan çend leşkeran demeke baş dirêj di hundir de man û dema derketin tiştekî ku ji bêhntengiyê an ji dijminatiyê li ser rûyên wan xuya bûya tunebû. Ew bi ser de jî bi kêf dixuyan û di nav xwe de dikeniyan û henekên xwe bi xwe dikirin. Ew hemû serbaz dixuyan û ji stêrikên li ser milên wan û nîşanên li ser sîngan ew bêguman serbazine mezin jî bûn. Li ber devê deriyê hewşê berdestên wan serê hespên wan dirêjî destên wan kirin û ew jî buhurîn hundirê malê

Paşê, teka teka an her du sê leşker bi hev re ta derengî şevê ew derbasî malê bûn. Remo di axurê çêlekê de dikir îskeîsk û wek pelê darekê li ber bayekî dîn û har dilerizî. Wî lêva xwe ya jêrîn gez dikir û anuha tak xwînê tev li hêsirên wî bûbû.

Piştî nîvê şevê, leşkerên dawî derketin. Ew bêguman mest û serxweş bûn ji ber ku berî ji hewşa malê derketana, wan bi destên hev girtin û demeke dirêj ji xwe re dîlan kirin. Wan bi henekî şûr û rimên xwe carinan jî ber bi xwe ve dikirin û xwe li ser axê dirêj dikirin. Mîzê da ser yekî ji wan û wî berê xwe da axurê çêlekê. Wî dawa xwe bilind kir û bi ser dîwêr de mîz

kir. Teşkên mîzê belav bûn û hin ji wan jî li Remo ketin.

Piştî çûyîna hemû leşkeran Gulê derket ber devê derî, li hawîrdora xanî nêrî û ket hundir. Wê çira heywanê vemirand û tenê ronahî di oda razanê de hişt. Ew bêguman pir westiya bû û wê zû çira oda razanê jî vemirand. Bi wê yekê, tariyê xwe li tarê gişî pêçand.

Remo ji ciyê xwe liviya, devê deriyê axurê çêlekê bi dizî vekir. Ew dudilî bû. Wî ji aliyekî dixwest berê xwe car din bida dîwarê bakur, dûr biketa, her tişt ji bîr bikira, ji binî ve nema bizîviriya wê malê. Ji aliyekî din, dilekî wî û vegerê hebû û dixwest li halê Gulê bipirsiya, kevaniya xwe car din bidîta. Wî pişta xwe xwar kir û ber bi pencerê ve çû. Wî destê xwe du sê caran bi hêdîka li camê da. Gulê hêna ranezabû û bawer kir ku ew zibûnek, kerîdarekî şermoke bû û piştî çûyîna her kesî dixwest ew bidîta. Wê wilo jî bi zimanê biyaniyan bi dengekî bilind got:

- Îşev tev bû! Sibe danê êvarê vegere. Ez nema dikarim û gerek ez hinekî ji xwe re razêm.

Remo bi tirs li dora xwe nêrî û dilê wî ket cî dema ew çav li tu kesî neket. Wî devê xwe xist qelşa textê pencerê û bi dengekî melûlî got:

- Gulê! Ez im Remo. Mêre te.

Deng ji hundir nehat û Gulê zû bi zû destê xwe dirêjî lempê nekir. Remo bi ser tirsa xwe de bêhnteng jî bû ji ber ku Gulê bi lez derî venedikir û ne dûr bû ku leşkerekî serxweş hustuwê xwe di ser wî dîwarê nizim re dirêj bikira û çav li wî biketa. Erê dunya şev bû lê ronahiya heyvek qels û pîsik dîsa xwe li ser rûyê bajarê wêranbûyî radixist, siyên tiştan li ser rûyê êrdê dirêj dikir. Remo guhê xwe ji ser textê pencerê ra-

nekir û nizanîbû Gulê li hêviya çi bû, çima wê derî jê re venedikir. Piştre, dengek gihaşt guhên wî û wî naskir ku kevaniya wî bi dengekî nizim di ber xwe de digiriya. Ronahiya çirê di hundirê oda razanê de belav bû û ber bi eywanê ve çû. Dema Gulê derî vekir wê hêsirên xwe zuha dikirin. Remo bi lez xwe avêt hundirê malê û derî li dû xwe girt. Bêhna wî hêdî hêdî hate ber. Wî dest pê kir li ber ronahiya çirayê li hawîrdora xwe nêrî û dît ku pir tişt di mala wî de hatibûn guhertin. Nêrînên wî li pir tiştên nû ketin. Berê di hewyanê de dîwançe tunebûn û ew masa bi guldankê tiştekî nû bû. Ew buhurî oda razanê û dît ku tiştek wek xwe nemabû. Berê Gulê her şev nivîn radixistin û di destê sibehê de ew car din datanîn ser kulînê û anuha textekî ji hesin bêtirî nîvê odê girtibû. Li ber serê text maseyeke biçûk hebû û li ser wê rê û rêwanî nema bû ji ber şûşên bêhnê û qutiyên dermanên ji bo xwe xweşik kirinê.

Gulê li bêndî Remo bû tiştek bigota lê Remo bêdeng ma û piştî ku çavên wî li wan guhertinên di malê de ketin wî serê xwe xist ber xwe. Wî tenê dizanîbû ku dijmin dişikest û îmkana vegera bi gihiştî li ber wî peyda bûbû. Ew vegeriya bû ji ber ku dixwest bizanîba çi bi mala wî hatibû.

Di wê navê de hêsirên wî dîsa hatin xwarê û girî zora wî bir. Wî bêguman ji Gulê hez dikir û çawa bûya, wî ew xwestibû, qelenê wê dabû, ew kiribû kevaniya xwe, stûnê malê û belkî wî hêvî dikir rojekê ji rojan ew bibûya diya zarokên wî. Wî nizanîbû çi bikira û hema xwe avêt Gulê û ew ber bi sînga xwe anî. Wî Gulê hembêz kir û xwest di wê gavê de ew di dilê xwe de veşarta. Gulê nema hêviya tu tiştî dikir lê wê got ku mêrê wê çawa bûya vegeriya bû û wî ê tiştek bikira ew ji wê rewşa xerab derxista û wê xwe di nav destê wî de sist kir.

Nêzîkî salekê derbas bûbû û Remo tucarî laşekî wilo germ, wilo nerm û nazik li ser sînga xwe nedîtibû. Wî xwe şaşomaşo kir nema xwe girt û destê xwe avêt sînga kevaniya xwe. Wî pif çirayê kir û Gulê avêt ser textê razanê. Di şevreşê de wî kirasê Gulê di ser serê wê re avêt û dema wî destê xwe dirîjî doxîna derling kir, ew ecêbmayî ma ji ber ku ew cara yekem bû ku wî Gulê bê derpê didît. Nêzîkî salekê bihurîbû ku wî xwe li kêleka laşekî wilo xweş ranemidandibû, xwe li ser dirêj nekiribû. Helkehelk bi wî ket û di nava pêlên xweşiyê de wî sawa xwe jî ji bîr kir. Wî pîsîtiya Gulê ji bîr kir çûnku çawa bûya ew pîsîtî ji ber serê wî bû. Gulê gulek bû wî ew bêhn kiribû û paşê ew ji biyaniyan re kiribû diyarî. Wî bi destê xwe tevnê bênamûsiyê çêkiribû, jina xwe bê pişt û bêxwedî hiştibû.

*

**Wêneya sisiyan**

Rok bixwe hêna derneketibû dema Remo di nava ciyan de li kêleka Gulê firfitî. Wî çavên xwe di tariya oda razanê de vekirin û wek ku dûvpişkekî bi wî vedabûya ew ji nişkê ve ji nav ciyan pekiya. Wî di şevreşê de destê xwe li kincên xwe bi bêhntengî pelikand. Ew ber bi pencereyê ve çû û perde hinekî bilind kir. Li derve şevê wek lawirekî efsanan, wek pezê li kozerê, li ser sînga bajarê wêranbûyî mexel hatibû. Wê hilma xwe wek du çemên ji dûmanek reş ji firnikên bêvila xwe berdida û distand. Dilê Remo ket cî dema dît ku reşayiyê xwe bi ser kavilên bajêr de vegirtibû.

Gulê çira pêxist, çavên xwe ên ji ber xewa kêm sor bûbûn firikandin û li rûyê Remo nêrî. Wê nizanîbû wî çi dixwest û çima wî bi lez kincên xwe li xwe dikirin. Remo sola xwe xist

lingên xwe û bi dengekî nizm got :

- Gulê, hêna rok derneketiye. Gerek e ez zû xwe bidim alî ta ew min negirin.

Wî di serê xwe de ji xwe re got ku di navbera mala wî û dîwarê bakur de bêtirî deh deqan meş tunebû. Wî reya xwe baş dizanîbû. Deng ji Gulê nehat. Remo berê xwe da derî û derket. Di hewşa malê de wî bi tirs li dora xwe mêze kir û bayekî sar mîna şivekê li rûyê wî xist. Gulê derket ber devê derî. Wê di tariyê de mêrê xwe nedidît, lê dizanîbû ku hêna ew dûr neketibû. Bi dengekî bilind û ta ji wê hat, wê kir qîrîn:

- Ma tu ji çi ditirsî Remo? Eger leşker te bigirin, ji wan re bêje tu mêrê min î. Ew ê te nas bikin û wê te berdin. Ma te çi ji wan kiriye ta ew te bigirin?

Remo xweş dengê wê kir û nava wî qetiya. Li ser wê qîrînê belkî leşkeran dora xanî bigirtana û ji ber vê yekê wî bêtir lezand. Lê ew bextewer bû û kesek ji wan li wê derê nebû. Ew ji bajêr dûr ket, wî berê xwe da daristanê û paşê dûrtir çû.

Gulê derî girt, xwe avêt ser ciyan û bû kûrekûra wê. Hêsirên wê wek her roj hatine xwarê û wan rûhinarik û çavên wê şewitandin.

## SERIYÊ KU HERDEM JI BÎR DIKIR

Dema min dest bi bazdanê, ez dixwzim bibêjim bi revê kir, min yekcar nizanîbû ku ez ê wilo dûrî malê, dûrî niştimanê wêranbûyî biçûma. Xwêdan ji hemû bedena min dihat xwarê û ya eniya min di nav ebrû û mijankan re diket nav çavên min û ew dişewitandin. Dilê min di sînga min de bi hêrs lêdida û dikir ku belav bibûya. Ez wê carê ji ber kê direviyam? Ez ji çi ditirsiyam? Bersiva van herdu pirsan pir hêsan e: ez ji ber her tiştî direviyam û hemû hawîrdora min bûbû mirin û tirsa nebedîbûnê berdida nava min. Berî Helebçeyê agir, piştî Helebçeyê jî agir û di hemû dîroka Helebçeyê de agir. Helebçe, helkehelk, helak, hewar, helweşandin. Helebçe herdem di dilê ba û boranê de. Helebçe herdem di bin barana mirin û malwêranî û tavên xerdelê de.

Xwendevanê hêja, guhdarê birêz! Min ji bîr kir li gor usûlê ez xwe bi we bidim naskirin. Nabe ez serê we hema wilo bêşînim bêyî ku hûn bizanibim bi kêmanî ez kî me. Ez hêvîdar im ku hûn ê di vê kêmasiyê de bibuhurin. Hişê min yekcar nemaye û ez her tiştî ji bîr dikim. Serê min bi rastî wek moxilê, na wek bêjingê, na wek seradê ye, seradeke bi qulên pir mezin e. Êşa min, dostên pir hêja, ew e ku ez bêhiş im. Ji bîra min diçe çawa kêr ji destpêka dîrokê de û ji roja roj de li ser qirika min hema pir dibin, çawa her kes mirina min dixwaze.

Di reva xwe de min pişta xwe dabû welatê xwe, erê min pişta xwe dabû niştimanê derd û kulên bêserî û bêbinî. Min berê xwe dabû bajarên sergûnê, tixûbên guhartinan, demên nû. Mîna hemû sêwî û sehên berderiyên dîrokê, min dixwest pişta xwe bidaya dîwarekî neketî. Li ser rê, di nava newal û çiyan de, nîşanine grover, sêniçik, çarqorzî hebûn û Xwedê giravî çi ye ne çi ye wan berê min ber bi xelasê, ber bi jiyan û azadiyê dikirin. Wan nîşanan min sipartin hev û çiyayekî min xist bextê çiyayekî din û ez wilo demeke dirêj li ser wan reyan mam ta ku dawî ez rastî bajarekî mezin hatim. Bi tirs min li paş xwe nêrî û dema min nema pêjna leşkerên pir, kesên di mirovan de hildidan û sehan kir, min xwe berda erda rast. Dilê min fireh bû û min ji hemû canê xwe xwest bawer bikira ku ez bi rastî gihaştibûm bendera xelasê, warê jiyanê. Min ji binî ve nikarîbû bawer bikira ku li ber dergehekê ji dergehên wî bajarê hanê pir tişt ê bi serê min bihatana. Li gor nîşanan, xwendevanê hêja an guhdarê birêz, ez ji nav pencên mirinê filitîbûm, ez dûrî ewrên xerdelê û bêhna mirinê ketibûm. Û wek lawikê navpêçekê ku devê xwe ber bi pêsîrên grover û mişt şîr ve dike, min jî Xwedê giravî berê xwe ber bi çavka-

niyên xweşiyan dikir, dev ji kul û derdên xwe berdida û dest bi jiyanek bêserêş dikir.

Ez bixwe mîna hemû hemwelatiyên xwe di nav tirs û sawêran de mezin bûbûm. Bi hezarên caran ez û mirinê em rastî hev hatibûn û wê tapana xwe dirêjî nigên min kiribû. Wê bi min dilîst wek çawa pisîk bi mişkê bêcare re ji xwe re dilîze. Ji ber vê yekê ez herdem bi tirs bûm, lê belê wan nîşanan hiştin ez ji ber tirsa nava xwe şerm bikim. Ez car din li hêviya şevê mam û wê jî wilo dest pê kir perda xwe bi ser rûyê bajêr de kir. Lempên malan jî dest pê kirin piştî yên cade û kolanan pê ketin. Li gor bêdengiya ku xwe li hawîrdora min girtibû, gerek bû min bidaya ser rê, berê xwe bidaya dergehên bajêr. Ez bixwe gihaştibûm welatê kelehên kevnare, cîhana xwarin û vexwarina xweş, bêhnên giranbûha, ez ketibûm navenda jiyana hêsan û bê serêş bûbûm.

Lempeyên bajêr di tariya şevê de xweş xuya kirin. Û şevê hin bi hin perdeya hêminî û bedengiyê li ser rûyê cihanê raxist. Wilo jî, min destê xwe di ser serê xwe re bir, porê xwe rast kir û bi tiliyên xwe şeh kir. Riya min dirêj bûbû û di dilê xwe de min ji xwe re xweş kir û got: "Hema ez bigihêjim bajêr, ez ê têkevim nav ava germ, serê xwe baş bişom, riya xwe kurt bikim û bi kêmanî duwanzdeh saetan ser hev ez ê ji xwe re razêm, çavên xwe nerm bikim.". Gihayê dirêj di wê navberê de di bin payên min de dikir xişexiş û bêhna jiyanê ji her derê dipijiqî û bêvila min dax dida. Di wê navê de dengê teqînekê gihaşt guhê min û gulleyekê ba qelaşt û di sînga min de çû xwarê. Belê, gulleyek ji lûla tufengekê derket û di sînga min de û ne di piştê de çû xwarê. Berî ez bi ser dev de biketama, gulleyek din berê xwe ber sînga min ve kir û wê ciyê xwe

di navenda dilê min de vekir.

Piştî van herdu gulleyan tişt pir tevlihev bûn û bûyeran wek libên tizbiyê dan dû hev. Min bawer dikir, wek min berê got û nivîsand ku ez gelekî dûrî pencên mirinê û ewrên xerdela mirovkuj ketibûm. Ez gerek ketibûma nava serdemên ûmîdiyê, demên baweriyê û min ji xwe re got ku ew herdu gulleyên ku aramiyê wê derê ji hev xistin tiştine ne di ciyên xwe de bûn.

Wilo jî ez têgihiştim ku ez carek din hatibûm xapandin. Erê, gazinan ji min nekin, xwendevanê delal, guhdarê hêja! Ez herdem ji bîr dikim ku ez têm xapandin. Ez bêhiş im, zû tiştan ji bîr dikim. Serê min wek bêjingê ye ava bûyer û biserhatinên mezin ên kal û bavan tê de namînin.

Leyse... tiştê çû nede dû! Ez ketibûm ketibûm. Lê belê tevî ku ez di nav xwîna xwe de gevizîm, min nizanîbû êş çi ye. Ez li ser axa rast dirêj bûm û min ji xwe re got ku Xwedê kir ku gulleya pêşî di movikek pişta min de çûbû xwarê. Eger ne ji wê yekê bûya, wê bibûya barebara min li ber dergeha wî bajarî û belkî jî min hin ji şêrî û rûniştivanên wî bêhnteng bikirana. Gulleya pêşî wek derziyek bencê hemû canê min tevizand û pûç kir. Wê gulleyê dawiyek ji hemû êş û şewatên kevn re jî danî. Ez nizanim çiqas wext di wê navberê re derbas bû, çend saet, an çend roj, belkî jî çend sal û sedsal buhurîn. Lê xwendevano, guhdaro, eger ez ji we re bêjim min di wê rewşa dijwar de çi xwest hûn ê ji min bawer nekin. Hûn ê bêguman bibêjin "Qûn tazî û tembûrê dixwazî " Ez ê ji we re bêjim min di wê malwêraniyê de çi xwest û eger hûn bixwazin bi min bikenin hûn bi kêfa xwe ne. Erê, min xwest ku ez ne bi ser dev lê belê bi ser piştê biketima. Eger ez bi ser piştê dirêj bibû-

ma, min ê wek di şevên welêt de, ew şevên berî qirkirina Helebçeyê, berî bombeyên kîmawî, min ê li stêrikan di asmanê sayî de û li heyvê bi kêfa dilê xwe binêriya. Ez siwarê êşê bûm û min ê bi serê mehîna xeyalê bigirta û ez ê dûr biçûma, an jî min ê xwe mîna başoke, mîna heloyê çiyayên bilind bidîta. Min ê ba bi baskên xwe li ser ava gol û çeman biqelaşta. Di havînan de, di germa şevên dirêj de, dema ez zaro bûm, xwişka min cihê min li ser banê xanî di bin asmanê mişt stêrikên hûr û mezin de radixist. Min xwe li ser nivînan dirêj dikir serê xwe datanî ser herdu destên xwe. Min carinan bi henekî stêrik dijimartin, erê ez dibêjim "bi henekî" ji ber ku li welatê min, Xwedê jî nikare stêrikan bijimêre, an jî dikare lê naxwaze wextê xwe bi tiştekî wilo pûç û vala winda bike...

Belê, dema ez li ser rûyê wê axê ketim, min pir dixwest bêhna xwe bi heyvê fireh bikira. Min dixwest bang wê bikira, bigota hey heyva xweşik, û tu jî hey feleka xayîn, hey serdemên kuşdaran, de werin li halê min mêze bikin, de werin li bextê min yê reş temaşa bikin. Lê rûyê min ketibû nav axê, min ber xwe nedidît û gotinek jî çi ye ji devê min derneket.

Ez wilo mam ta ku payine giran di nava gihayê dirêj de nêzik bûn. Li ber dergeha bajarê azadiyê, penahendiyê, mirovek li ser serê min rawestiya û min di dilê xwe de got ku hebû nebû ew bû yê lûla tufenga xwe ber bi sînga min ve kiribû û wî min li ser axê wek termekî rast kiribû. Wî mirovî piştî ku dît deng ji min nehat destê xwe avêt milê min û min bi ser piştê de qulipand. Xwedê kir ku çavên min vekirî mabûn û wilo jî min li rûyê wî û li asimanan jî nihêrî. Xwendevanê min, guhdarê serpêhatiya min, herdem dema mirov li ser mêrkuj û kuşdar û xwînrêjan diaxife, ew wan rûtirş û nexweşik dibîne.

Ew wan dixe kirasê lawirên dirende, wan dike teba, dêw û şeytanên bin ax û ser ax. Lê kuşdar hemû ne bi vî hawî ne, werin ji min bipirsin ez ê ji we re bêjim ew çawa ne. Piraniya caran gotinên wan hungiv ji wan dibare. Ew rû biken in, xwe mehreban û comerd nîşan didin. Tiştê ez dixwazim di derheqa vê yekê de bibêjim ew e ku ew mirovê li ser serê min rawestiya ne wek guran bû û bêhna xwînxwaran ji wî nedihat. Ew bi ser de jî pir lihevhatî, bejinzirav, bedew bû, û siya xemgîniyekê li ser rûyê wî eşkere bû. Wî wek ku dizanîbû min ji heyv û stêrikan hez dikir û wî hişt ez texnekê ji xwe re li dora xwe binerim. Dema ez dibêjim li dora xwe, ez dixwazim bibêjim li asmanan çûnku gihayê dirêj nedihşt min tiştekî din bidîta û rondikên çavên min bi hêsanî nediliviyan. Daxwaziya min jî ew bû û min li asmanê wê navçeyê bi kêfa dilê xwe temaşa kir. Paşê, wî mirovî çokên xwe dan erdê, destê xwe di ser rûyê min re bir û min di wan destan de hinek hezkirin dît. Li paş wan neynikên grover, çavên wî ên şîn pir xweşik, dilbir bûn û eger ez jim bûma ez ê bêguman dil têketama wan. Lê ez mêr bûm, mêrekî di nav xwîna xwe de gevizî, li ser axa bajarekî dûr dirêjkirî bûm. Wî mirovî kêrek devtûj ji kemera xwe derxist û ew di ser neynûka xwe re bir û keniya. Wî destê xwe di ser çavên min re birin û ew dane hev û kêr danî ser zengeloka min. Wî serê min ji gewdê min jê kir û ez yekcar bi êşê nehisiyam. Du tiştan hiştin ku ez yek car neêşim: yek, ew gulla ku di movika pişta min de çûbû xwarê laşê min pûç kiribû; ya duduyan, destê wî mirovî sivik bû, bêguman destê hosteyan bû û kêra wî di qirika min de çû xwarê wek çawa kêrek tûj hermiyeke gihîştî bike du felqe.

Li wê derê, li wê navberê, laşê min yê bê serî ji bo gur û

rovî û keftaran ma. Wî mirovî tufenga xwe avêt milê xwe, serê min xist tûrikê xwe û berê xwe da malê.

Mal, ez çi bêjim, ne wek hemû malan bû. Pirtûk, belgeh û şûşên tenik ên xwe wek maran li hev dipêçandin hundir mişt kiribûn û min nas kir ku mal mala mirovekî pir zana, belkî nijadnasekî navdar bû. Min xwest bi wî re bipeyivîma çend pirs bikirana, erê çend pirsên girêdayî bi rewşa me ya kembax û bi wan balefirên ku mirin li Helebçeyê belav dikirin û gund û bajar qir dikirin. Min xwest li ser Koça Mezin jî û li ser wan nîşanên li ser rê bipeyivîma. Lê wî zanenasî eşkere li min mêze nedikir, paşê, bê gewdê min ê çawa gotinek çiye bigota?

Eşkere bû wî zaneyî guh li derd û kulên min nedikir û ew bi karê xwe daketibû. Wî dizanîbû ku pirsên min pir bûn lê wî berê xwe dabû kargeha xwe û hayê wî ji bayê felekê tunebû. Wî agir dadabû û bûbû pelqepelqa dermanan di şûşên xwaro maro de. Xwendevanê hêja, guhdarê delal, ji min re nebêjin çima min nekir gazî, çima ez neqîriyam. Ma mirov dikare bike qîrîn an nalîn eger serê wî ji gewdê wî bê jêkirin? Ez ji ber bombeyên kîmawî filitibûm û wilo jî di nava dermanên kîmawî de, por, mijank, ebrû, cêrmê rû û goşt bi min ve, bi serê min ve neman. Min nema ber xwe dît û di qulên çavên min re di firnikên bêvila min re, di guhên min re mejiyê min derket û kuloxê serê min tije av bû.

Piştî demekê, wî kesî agir vemirand û ava ku dikir pelqepelq hin bi hin sar bû. Wî lepikek xist destê xwe û rahişt min. Wî qafê serê min, kiloxê spî, danî ser maseyê. Paşê wî tiştekî bi rastî nakeve seriyan bi min kir. Wî lempek biçûk xist hundirê min û wî fîşa wê xist qula eletrîkê. Dema wî lempe pêxist, ez bûm wek Xocê Xizir û ronahî ji min bariya. Ew ji herdu

qulên çavên min, herdu guhên min, herdu qulên pozê min û bi taybetî ji devê min yê vekirî derket û di nava pirtûk û belgehan de belav bû. Berî vê yekê, min tucarî bîr nedibir ku wilqas qul di serê min de hebûn. Wî zanenasî bi kêfxweşiyek diyar destê xwe di ser textikê eniya min re bir û tiliya xwe di ser derzan re gerand. Anuha dema dilê wî bixwaze, ew lempê pê dixe û ronahî ji min dibare û dema naxwaze, ji xwe naxwaze û ez têm ji bîr kirin.

Xwendevano, guhdaro, hûn ê bêjin serpêhatiya min nakeve seriyan. Lê çima ez ê derewan li we bikim? Û çima ez ê bextê xwe reş bikim? Ez rastiyê ji we re dibêjim û hûn bawer dikin bawer nakin hûn bi kêfa xwe ne. Di destpêkê de, min got ku ez ê xwe bi we bidim naskirin û min ji bîr kir. Lê wek ku hûn xweş dizanin, ez bêhiş im. Serê min bê mejî ye bêjingek şikestî ye, ew vala ye û tu tişt xwe tê de nagire. Xwe hinekî ragirin ez ê ji we re bibêjim ez kî me, eger zanê pir navdar min pêxe û eger hişê min bê serê min. Belê, dema min dest bi bazdanê, ez dixwazim bêjim, bi revê kir, min yek car nizanîbû ku ez ê wilo dûrî niştimanê xwe biçûma û bitengijiyama. Xwêdan ji hemû canê min dihat xwarê û ya eniya min çavên min dişewitand. Dilê min di sînga min de bi hêrs lêdida û dikir belav bîbûya. Koça Mezin dabû ser reya dûrbûnê û nêzîkî sê melyonan xwe li tixûban dixistin, li deriyên jiyanê, li pencerên cîhanê bi destine westiyayî dixistin. Ez ji ber kê direviyam? Tirsa min ji çi bû? Alîkariya min bike, bîne bîra min! Bêje, xwendevanê hêja, guhdarê birêz! Bêje!

## PIRTÛKÊN ME YÊN KU DERKETINE

**A. S. Pûşkîn* / KEÇA KAPÎTAN / *Roman*

* *A. P. Çêxov* / MIRINA KARMEND / *Novel*

* *Hesenê Metê* (nivîsende) / ARDÛ / *Ji çîrokên gelêrî*

* *Redwanê Alî* / TILÛRÊ BÊGANE / *Novel*

* *Hesenê Metê* / SMIRNOFF / *Novel*

* *Mûsa Anter* / HATIRALARIM / *Bîranîn*

* *Mehmed Uzun* / ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ / *Roman*

* *M.F. Dostoyevskî* / MERIVÊN REBEN / *Roman*

* *Mehmed Uzun* / MIRINA EGÎDEKÎ / *Destan*

* *Hesenê Metê* / LABÎRENTA CINAN / *Novel*

*Adresa nû:*

**WEŞANÊN WELAT**

*Box: 41 23*

*141 04 Huddinge/ Sweden*

**WEŞANÊN WELAT**

*Mehînê bi hêsanî hefsar ji destê wî distand û mîna stêrika ku birije, wê xwe bi ser milê asmanên fireh de xwar dikir û dûr diçû. Ferzend û mehînê goristanên bêhejmar li dû xwe dihiştin, serdemên malwêraniyan ji bîr dikirin, bi hev re diçûn warê jînê, roj û şevên evînê. Ferzend kavil û demên xwînxwaran û bêhna mirinê li paş xwe dihişt. Di wan şevên dirêj de, wî qesir di serê xwe de xweştir dikir, rengareng dikir, wek bûkekê dixemiland, bi destê wê digirt, dibir bal xwe û ew li kêleka xwe, li ser ciyan dirêj dikir. Ew dibû Ferhadê evîndar, ji Şîrîna xwe re qesrek berz ji daxwaziyan saz dikir, ew dibû Mem û bi agirê nava xwe şevên hovîtiyê dikirin rojên hêviyê û govendên rindiyê. Paşê, wî xwe berdida hundirê wê û xwe di dalan û eywanên pir de bi kêfxweşiya mest û aşiqan winda dikir.*